

Dîwana

Şêx Memdû'h Birîfkanî

## Pêşgotin

Piştî bizaveka berdewam zêdetir ji pênc salan- û bi alîkariya malbata şêx Memdu' h Birîfkanî, min karî destxetên helbestên cenabê şêx Memdu' h Birîfkanî vejîmî ve û bi awayekî tekûz û tamam pêşkêşî xwendevanên kurd bikim. Piştî 24 salan; koça dawî a şêx Memdu' h Birîfkanî ev cara pêşî ye ku berhemên wî bi destxetê wî bixwe ronahiyê dibînin. Piraniya wan jî bi canê welatparêzî û kurdistantiyê avis û dagirtî ne. Weha jî xuya dibe ku cenabê şêx mirovekî welatparêz û netewexwaz bûye û ew sitem û zora li ser miletê kurd bûne hander ku ev helbest bi vî canê netewayetî yê mezin werin dariştin. Xwe bêguman da kartêkirina van helbestan pitir bit, ger di dema xwe da hatiban weşandin, lê li Îraqê jî mîna parçeyên dî yên welatê me rayedaran nehiştine ku berhemên canê welatparêziyê hembêz dikin, bigihin qonaxa çap û weşanê.

Ji bilî wê ku helbestên şêx Memdu' hê Birîfkanî xwedî zimanekî rehwan û gramereka diyar û bihêz e, ev helbest mîna dirêjepêdaneka wê qutabxana nîştîmanî ya kurdistanî ya netewayetî dihête ber çav.

Tevî vê jî şêx Memdu' h di helbestên xwe da ilmê 'erûzê ferahîdî ku piraniya wan behran digel parastina taybetmendiya helbesta kurdî bi kar anîne. şengestê helbestên şêx Memdu' hê Birîfkanî tevî meseleyên netewayetî pir in, ji gerdûnên tesawifê, ew nêrîna ku bi hişekî zana li hawîrdora xwe dinêre. Êdî jiyana hejarî ji wê nêrîna netewayetî û tesawifî jî şêx ber bi xwe ve vedikêşa, lewra jî vê texa hejar biyaveka mezin di nava helbestan de girtiye. Ev canê henê di hemû rewşekê da şêx pê re bû. Di sala 1961 şêx zîndanî bû, hem dîsa di wê rewşê da jî helbestên xwe ji zîndanîyan re dixwendin. Ji bona wê ev helbest bibin fêra welatparêziyê û hestkirin bi doza rewya ya gelê kurd. Ji ber ku miletê kurd ew derfeta dîrokî ya danîn û diyarkirina tixub û sînoren welatê xwe nebûya û ji ber hindê ku zanayên kurdan hest bi vê metirsiyê kirîye, hewl dane ku bi riyên dî van tixub û sînoran biparêzin. şêx Memdu' h Birîfkanî jî wekî zanayekî kurdan ev rê meşandiye; êdî wî jî helbestên bi vî awayê ku tê da tixub û bajarên Kurdistanê diyar dicit, nivîsandine. Helbestên

helbestvanên mezin yên kurdan ku şêx Memdu' h yek ji wan e, di wî serdemî da erkê tomarkirina tevayî aliyên jiyânê bixwe vedigirtin. Loma jî hin helbest bi awakî cograffî distînin û hinek din jî aliyên felsefî û hinek mîna dîrok û ferheng dihêne vehandin.

Sererayî wê ku şêx Memdu' h Birîfkanî murşîdê terîqa Qadirî bû, lê canê xwe yê netewayetî wekî kurdek ji neteweyeka bindest ji bîr nedikir û ev erkê netewî têkilî erkê xwe yê ayînî û tesewifî kiribû û hewl dida vê çendê di nav mirîden xwe da belav bike.

şêx Memdu' h Birîfkanî şeydayê peyva kurdî bû, loma di geriyên xwe da hewl dida deqên kurdî yên helbestvan û zanayên kurdan kom bike û li ber bû wan deq û jêderan bigihîne çapê ku wî weha dihizirand: "Pêdivî ye em li edebiyatên xwe muqate bin, her dem di hizra me da bin û ji hindabûnê biparêzin da her dem di berdest û li ber çavên me bin, çunkî ger em jê veqetin, em ji koka kultur û edebiyata xwe vediqetin, em dê xwe jî hinda bikin."(\*)

Di beşê yekê ya Laleşînê de helbestên şêx Memdu' h Birîfkanî 'Eşqa şîrînê, Gunahê Min, Dibera Qamet elîf, Tirsax Xudayî, Pîreqorê, Nûna Tevî, Kurdistan, Gelî Kurda, derdê Giran, Da Biçîne Laleşînê, Hilo Rabin, Ji 'Îraqê Me Divêt, 'Temefa, Xutiya Min, Tu Ka, Heval, şevên Tarî, Dilber Çi Bi Min Nadet, Ehlê Zemanî, Se'her, Baxê Cennetê, Xwezî nebûn. Ev helbestên wî cara pêşî di vê dîwanê de çap dibin.

Helbestên: Zilfên Di Mest 2 beyt, Esmerê 7 beyt, Hewar 3 beyt, Behdînan 6 beyt, Nazên 4 beyt, Kî ve Çû 4 beyt, Dilberê 28 beyt, Karwan 20 beyt, Solîn 18 beyt, Sînor 3 beyt di beşê yekê ya Laleşînê de kêr hatibûn nivîsandin, di vê pirtûkê de tememiya van helbestan hatine nivîsandin.

Helbestên Perîşan, Carna, Dinya, Kefî, Sîma, Xwezî di orîjînalê dîwana şêx Memdu' h de tunebûn, me ji serkaniyên cihê ev helbest bi dest xistine. Li bin helbestan bixwe serkaniya helbestan hatiye nivîsandin.

Zahid şêx Memdu' h Birîfkanî  
Gulana 2000 Kurdistan

(\*) So'hbata şêx Memdu' h Birîfkanî ye di bersîvdana Sebrî Botanî.

## Pêşgotina Beşê Yekê ya dîwana şêx Memdû'h Birîfkanî "Laleşînê"

Xwendevanê hêja. Min di vê pirtûkê de, bes hindê ji helbestên şairê bi nav û deng Birîfkanî belav kirine. Ev helbest ji rojnameya »Hawkarî«, »Bizav«, »Birayetî« û kovara »Hawar« û »Ronahî« û pirtûka »Hozanvanê kurd« ya Sadiq Behaeddîn Amêdî û destnivîsa Îhsan Birîfkanî û ji kasêta dengê şêx Memdû'hî bi xwe ya ku berî wefata xwe bi rojekê li Bexdayê, li mala kurê xwe Ebdulsalamî tomar kiribû û herwisa ji destnivîsa Reşîd Findî ku helbesta »Yazdey Adarê« ji zardevê şêxî bi xwe nivîsbû hatine wergirtin.

Xwe helbestên şêx Memdû'hî bi destxeta wî bi xwe hene, lê mixabin, hêş derfeta bi destxistin û çapkirina wan bi dest min ve nehatiye. Dibe ku di van helbestên berî nuke weşayî de şaşî hatibine kirin, lê ji ber nebûna destnivîsa wî di destên min de, ez neşiyam wan hemû şaşiyên rast bikim, lê min û li gor pêçêbûna xwe û alîkariya dayika xwe hewildaye ku şaşiyên rast bikim û şî'irên wî yên di dest min de bigehînim ber destên we yên hêja.

Gelek şair hene ku di qada helbestvanîyê de xwedî pêçêbûnên bilind in û afrandinên wan yên şîirî yên buhadar û pîrrî ciwanî û şiyana şîirî hene lê mixabin ku berhemên wan yên çapkirî nînin û ji ber hindê jî haya xwendevanê kurd, bi awayekê baş, jê nîne. Mebesta min ji belavkirina vê pirtûkê ew e ku aliyê şêx Memdû'hî yê helbestvan û hestdar, cîhana wî ya tijî evîn û softî û welatparêzî, şêxê xweş kurdîaxêv deynim ber çavan.

Xwe bê guman, kartêkirina van helbestan bêtir dibû eger ew di dema xwe de bihatana weşandin. Lê her wekî em hemû dizanin li Îraqê jî, mîna li perçeyên din yên welatê me, hikumetên desthilatdar rê nedidan çapkirin û weşandina berhemên edebî, yên ku bi canê welatparêzî û kurdîstantiyê di avis bûn û ji wan helbestan. Di ser hindê re jî çend helbestên şairê nemir di çend rojname û kovaran de û di radyoya kurdî ya Îraqê de hatibûn belavkirin.

Herwisa di rojnameya »Welat« ya 22-28ê sibata 1992ê, di hejmara 12ê ya kovara »Nûdem« ya sala 1994ê û di kovara »Karwan« û »Beyan« û »Roşinbîrî« de li ser Birîfkanî hatiye nivîsandin û helbest yan perçe helbestên wî tê de hatine weşandin.

Ji bilî jînenîgara şêx Memdû'hî ya ku piştî vê pêşgotinê dihêt, ez jiyannameya şêx Nûreddîn Birîfkanî ya ku şêx Memdû'hî di wextê xwe de ji Ebdulreqîb Yusifî re hinartibû û wî jî di pirtûka xwe »Dîwana Kirmancî« de weşandibû, digel destxeta şêx Zeynelabidînî li ser şêx şemseddînê Qutib û şêx Nûreddînê Birîfkanî û çawa demezrandina rêça softiyê li Birîfkanî ku wî ji zardevê şêx Memdû'hî wergitibû, her di vê pirtûkê de belav dikim. Mebest ji vê jî pirtir û çêtir naskirina şêxê şair û malbat û rêça wî ye.

Hêvîdar im ku destnivîsên helbestên Exlatiyê hemîşe zindî, yên bi destxeta wî bi xwe, bikaribin di rojeka ne dîr de ronahiyê bibînin û xwendevanê kurd û hezdarên edeb û bi taybetî şîira kurdî çavên xwe bi dîtin û xwendina wan kil bidin.

Tebax-1996

Zahid şêx Memdû'h Birîfkanî

## Bineriha şêx Memdu'h Birîfkanî (1329 h. –1911 z.) – 1976z.

şêx Memdu'h Birîfkanî kurê şêx Muhsinî<sup>(1)</sup> yê ku sala 1344 ê hicrî –1925 ê zayîmî- koç kirî kurê şêx Ebdulcebbârî sala 1313 ê hicrî koçkirî, kurê Ebdulqehharî, kurê Ebdullahî sala 1267 hicrî koçkirî, kurê Ebdulcebbârî sala 1231 hicrî koçkirî û li gundê Êtutê di nav mezargeha bi navê wî hatiye avakirin, hatiye veşartin, kurê şêx Nûreddînî sala 1195 hicrî koçkirî, kurê Ebu-bekirî sala, 1158 hicrî koçkirî, kurê Zeynel 'Abidînî<sup>(2)</sup> (1035- 1119 hicrî) kurê şêx şemseddînê Qutbê Xelawatî yê Birîfkanî yê ku sala 997 ê hicrî (1588 zayîmî) ji dayîk bûye û sala 1085 ê hicrî (1674 ê zayîmî) li Birîfkanê koç kiriye<sup>(3)</sup>, kurê Ebdulkerîmî, kurê Mûsayî, kurê Silêmanî, kurê Ebdulxenî, kurê Îshaqî, kurê baba Mensûrî, kurê "Kemal el Mulle we dîn" şêx Huseynê Exlatî yê navdar û yê ku sala 808 ê hicrî ku dîke 1405 ê zayîmî li Misrê koç

1- Li gor gotina Mela Mihemed Se'îdê Birîfkî yê Dihokî, di pirtûka xwe ya bi navê "Fuzala Behdînan" (Bijarteyên Behdînan) de li ser şêx Muhsinê Birîfkanî weha dibêje:

şêx Muhsin kurê şêx Ebdulcebbârî, birayê şêx Nûrî, mirovekê ji dunyayê veqetiyayî û bi axretê û bi 'îbadeta Xudê ve mijûl bû û lewra jî ji xelkî dûr keftibû. Jiyê şêx Memdu'hî 3 sal bû gava babê wî şêx Muhsin ji gundê Badê bar kir û hat li Birîfka bi cih bû. Pirtûkên ayînî pir dixwendin. şêx Muhsin heta mirina xwe li Birîfkayê ma. Kurê wî şêx Memdu'hî heya mirina babê xwe çavê xwe lê dikir. şêx li mezargeha Nûrî -El Qubbe el Nûriye- hatiye veşartin.

2- şêx Zeynel Abidîn kurê çarê yê şêx şemseddînê Exlatî ye. Ew Qazî bû û hukimên Ew bapîrê seyîdên birîfkanî û binemala Nûrî û şêst Navdîn û binemala Xezalî. Wî sê kur hebûn: Huseyn bapîrê binemala şêstnavdînî, Ebûbekir bapîrê binemala Birîfkanî û binemala şêx Nûrî ye, Xezalî bapîrê binemala Xezalî ye.

3- şêx şemseddînê Exlatî: Ji bineriha xwe ji bajarê Exlatê ye û di serdema wî da di navbera dewletên Osmanî û Sefewî de şer bû û ev şer bû egera kaviilkirina bajarê Exlatê û ew jî yek bû ku digel babê xwe Seyîd 'Ebdulkerîm û birayê xwe Mihemed Emînî çûbû Hekariya bo cem Sultan Îmadeddînî ku sala 1049 ê (1639 ê zayîmî) li Hekariyê hakim bû. Ji ber ku ev dever tena bû û lê çer tunebû. Ew li ba 'eşîra Doskî Jorî li bakurê Oremarê li gundê Birîva di navbera Gever û Colemêrgê de bi cih bûn. Ê digel koçerbûneka eşîra Ertûşîya gihîşte de- vera eşîra Mizûriyan di sala 1620 ê zayîmî li serdema hakimê Amêdiyê Sîdî Xan û Sîdî Xanî 7 gund diyarî şêxî kirin, ji bo belavkirina rêça sofîtiyê û Tekya xwe li Birîfkanê danî.

kirî<sup>(4)</sup>, kurê Ebil Hesên 'Elî<sup>(5)</sup> yê Muwehedê Xorasanî, kurê Hacî Nizameddînî, kurê Ehmedê Exlatî<sup>(6)</sup>, kurê Zeynel 'Abidînî<sup>(7)</sup> Eliyê Zordanî yê Muwehedê Xorasanî, yê Bozincî yan Bozincirdî<sup>(8)</sup> yê Hemedanî ye ku sala 685 ê hicrî koç kiriye, kurê Mihemed Salihê Hemedanî, kurê Yusivê Hemedanî, kurê Selîm "Ebu Muslim el Îraqî el Hemedanî", kurê Yusivê Hemedanî "Ebî Y'eqûb", kurê Eyubî, kurê Mihemed Yusiv "Sedreddîn", kurê Celaleddîn Huseyn, kurê Zeynel 'Abidîn "Ebul Mueyyed Elî şu'eyb" yê bi Zuhre û digotin Buhre navdar e, kurê "Ebu Mihemed el Re'zewî", kurê Ehmedî "El Teqî, el Re'zewî", kurê Ebdullahî "El Muntexeb, el Re'zewî", kurê Elî yê "El Muntexeb el Muxtar we Neqîb Eşraf Bexdad", kurê Îmam Ceferî, "El Zekiyl Museddeq", kurê Îmam Elî yê Hadî "El Eskerî", kurê Îmam Mihemed Cewadî, kurê Îmam Elî yê Riza, kurê Îmam Mûsayê Kazim "El Îmam Mûsa I Kazim", kurê Îmam Ceferî "El Sadiq", kurê Îmam Mihemed Baqirî, kurê Îmam Eliyê Succad "El Succad" Zeynel 'Abidîn, kurê Îmam Huseyînê Xudê jê razî, "El şehîd", kurê Fatîmetul Zehra el Betul keça Mihemmed silavên Xudê li ser bin.

4- şêx Huseynê Exlatî: Di ilmê " 'Zahîr û Batin" de zanayekî bihêz bû û serkêşîya alimêt zemanê xwe bû di zanîna "Ilm el Cefer". Wextê ku zanî leşkerên Cengîz Xanî bi talanên mezin radibin li Îranê û li turkistan û Turanê û berew cihwarê lê dima tîn, "Xelat" ew digel 12 000 binemalan ji mirîd û dost û mirovên xwe ji welatê xwe bar dîkin berew Misrê, sala 790 ê hicrî û li wê derê jî koça dawî dîke sala 808 ê hicrî. Xudê jê razî be. Ê heta vê serdemê jî li qahîre taxek heye bi navê "Heyul Exlatîyîn". Ê tekyaya mezaara şêx Huseynê Exlatî lê heye, mirîd û mirovên wî bi navê şêx Huseynê Exlatî ava kirine. Navê wî hêjayî di pirtûka şerefxan a bi navê şerefxanê Muşahirî Kurd de derbas bûye.

5- Ebul Hesên 'Elî: Li ser gotina 'Ebdilkerîmê muderris ya di pirtûka xwe ya bi navê "Binemaly Zanyaran" rûp. 432 navê Ebul Hesên 'Elî bi wî awayî nivîsîye: Seyid û îmam û şêxê murşid şeyxulîslam 'Elî yê ku sala 915 ê hicrî koçkirî.

'Ebdulkerîmê Muderris li ser şecereya binemala şêx Nûreddînê Birîfkanî weha dibêje: Ev şecere û nesebe li ber pirtûka bi navê "Îrşad el Salîkîn" ku yek ji bapîrên wan Seyîd Ebdul'hemîdê kurê şêx şemseddînê Qutbê Exlatî nivîsîye. Her weha şêx Memdu'hê Birîfkanî ev şecera navbûrî di destpêka dîwana şêx Nûreddînê Birîfkanî ya ku şêx Memdu'hî bixwe di navbera salên 1940-1966ê bi destxetê xwe nivîsî, nivîsandiye. Ê li dawîya dîwanê, înfomasyon li ser jidayîkbûn û koçkirina endamên vê binemalê bi giştî nivîsîne.

6- Seyîd Ehmedê Exlatî: yê navdar e bi "Bapîr û mezinê seyîdên Birîfkanê" û yekemîn kes bû yê ku ji Hemedanê bar kiriye û hatiye Exlatî li dîw gotina babê xwe sala 682 yê hicrî, ji bo belavkirina terîqeta Şehirwerdî. Di serdema Sultan Tikodar kurê Hulako Xan, kurê Tolxan, kurê Cengîz Xanî.

7- Zeynel 'Abidîn Eliyê Zordanî: Yê ku bi "El Seyîd ul Emîr, El Kebîr, el şêx Zeynul 'Abidîn Eliyul Zordanî el Muwehed el Xorasanî" navdar e. Ê di serdema xwe de mîrekî mezin bû.

8- Bozincî: Gundek e ji gundên Hemedanê li Îranê û dibên Bozincirdî.

## Kurtejiyana şêx Memdu'h Birîfkanî

şêx Memdu'h sala 1329 ê hicrî li hember 1911 ê zayînî li gundê Badê yê ser bi parêzgeha Dihokê ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya olî li Birîfka li ber destê mamostayê tekya gundî Mela Ebdullahê Etrûşî dest pê kiriye û sê salan xwendiyê. Paşê çûye gundê Spîndarê li nav Berwarî Jêriyan û nêzîkî salekê li cem mamostayê gundî Mele Ehmedê kurê Mela Ebdulxaliqî "El 'Eqrî" Ak-rêyî xwendiyê. Ji wê derê jî çûye Etrûşê û li tekya şêxê navdar şêx Ebdurehmanê Etrûşî binecih bûye û li ser destê mamosta Hecî Mela Ehmedî xwendiyê. Piştî heyamekê ji Etrûşê çûye gundê Kemeka û nêzîkî du salan li wê derê li cem mamosta Hecî Mela Îsayê Salihê Kemekî xwendiyê. Paşê ew bi tenê çûye Zaxo û li ber desrtê mamosta Mela Ehmedê kurê Mela Ebdulxaliqî "El 'Eqrî" Ak-rêyî xwendiyê û xwendinnameya 12 ilman wergirtiye û paşê vegeriya ve Birîfka. Wî her wisa li danîşgeha "Al ul Beyt" li Bexda û li danîşgeha "El Hîkme" li Necefê nêzîkî du salan gelek dersên olî wergirtine.

Sala 1933 ê keça şêx Îbrahîmê Heqqîyê Neqşebendî mehr kiriye û sê sala ew û kebanîya xwe li gundê şêx Îbrahîmî mane. Paşê ji wê derê çûne û li bajarê Dihokê bi cih bûne.

Sala 1938 ê keça Yusif Paşayî, xuşka Hazim Begî li Zaxo mehr kiriye.

Sala 1954 ê keça Mela Mihemedê kurê Ebdulxaliqî "El 'Eqrî" Ak-rêyî, seyda û pêşnimêjê Mizgefta Mezin li Dihokê mehr kiriye. şêx Memdu'h du cara çûye Hecê.

Sala 1970 yê beşdarî kongreya nivîsevanên kurd bûye ku 23.06 ê li Bexdayê hatibû li dar xistin. şêxî 28 deng ji hejmara 77 dangan standine û bûye endamê komîteya rêvebir ya yekîtiyê. Piştî ku tayê Yekîtiya Nivîsevanên Kurd li Dihokê damezrayî, navbûrî bû yekemîn serokê wê.

Her weha şêx Memdu'h bûbû endamê Korî Zanyarî Kurd.

Navbirî di helbestên xwe da xwe bi "Exlatî"<sup>(1)</sup> bi nav dike. Her weha helbesta "Welatê Min" yan "Xemla Kurdistanê" di kovara Ronahî, hejmara 13 ya nîsana 1943ê de hatibû weşandin. Helbesta wî "Roj Bête Der" di hejmara 50 ê ya kovara Hawar ya sala 1942 ê hatibû weşandin. Helbestên wî di gelek

1- Exlatî naznavê şêx Memdu'h Birîfkanî ye. Xelat yan Exlat navê bajarekê ye li Kurdistanê bakur. şêx Memdu'h bixwe ji binemala şêx 'Ehmedê Exlatî ye.

kovar û rojnameyên di da hatine belav kirin: Birayetî hejmar 3 ya sala 1970 û di hejmara 6 ê ya kovara Nûserî Kurd ya sala 1972 ê û di kovara "Kirêkaran" ya roja pêncsemê 10.07.1986 ê.

Her wisa di rojname Bizav da jî gelek caran helbestên wî hatine weşandin. Her weha di radyoya kurdî ya Bexdayê de gelek programên taybetî li ser cenabê şêxî û dîroka wî û berhemên wî hatine çêkirin.

Hêja Birîfkanî her ji lawîniya xwe ji helbestan hez dikir. Wî helbestên şairên kurd yê mezînan, mîna Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Melayê Bateyî, Bekir Begê Erizî, şêx Nûreddînê Birîfkanî û şêx şemseddînê Exlatî ûhd. xwendine û bi kartêkirina wan dest bi helbest vehandinê kiriye. Û ewî xwe didît feqîyekî belengaz ji feqîyên dîwana Cizîrî.<sup>(2)</sup>

Di 11 ê nîsana 1976 ê şêx Memdu'h li Bexdayê çû ber dilovaniya Xwedê û li goristana Dihokê hate veşartin.

Navbirî 11 kur û 5 keç li pey xwe hiştin. Navên kurên wî ev in: **Nûr Mihemed, Ehmed, Mueyed, Ebdulselam, Mihemed, Ebdulqadir<sup>(3)</sup>, Muhsin, Ihsan, Ednan, Zahid<sup>(4)</sup>, 'Izzedîn**

- 2- Sebrî Botanî carekê li Bexdayê bû mêvanê şêx Memdu'h Birîfkanî. Sebrî Botanî dibêje: "Min gote şêx Memdu'hî: Silav li ser şêxê edebiyata me. şêx Memdu'hî silava min veda û got: Estaxfrullah! ..... Ez feqîyekî belengaz im ji feqîyên Dîwana Cizîrî."
- 3- Dr. Ebdulqadir Birîfkanî yek ji kurên şêx Memdu'hê Birîfkanî ye, niha li Londonê dijî. Nivîskar û lêkolîner e. Doktora xwe li ser Mustafa Barzanî kiriye. Bi zimanê 'erebî û îngilîzî gelek berhemên wî çap bûne; Mustafa el Barzanî: Ze'îmul Hereke el Qewmiye el Kurdiye el Mu'a'sîre. Çapa yekê "Çapxaneyê El Ehram, Qahîre, 1996 – El Hereke el Qewmie el Kurdiye el Mu'a'sîre Min Mustafa el Barzanî Îla Mes'ud el Barzanî, çapa yekê Çapxaneyê El Ehram, Qahîre, 1998 – Kitab el Tarîx el Musewwer lîl Hereke el Qewmiye el Kurdiye el Mu'a'sîre min Mustafa el Barzanî ila Mes'ud el Barzanî. London, 1999 (bi zim anên 'erebî û îngilîzî. – Pictorial History of Modern Kurdish National Movement, from Mustafa Barzani to Mesud Barzanî. TWA Limited-London. 1999. – Xewatir Fil Menfa Eşwaq fî uyûn Kurdistan – Mecmu'at Xewatir. London, 1999. – Songs of Exile, Cry for My Beloved Kurdistan, London 1999.- Mustafa Barzani, The Leader of The Modern Kurdish National. – Movemet – English Edition – Kegan Pall International – London, 1999 – (Ev pirtûk wek CD jî hatiye belav kirin.) – 'Ezam Qadet el Qernul 'Eşrîn, çapa 'erebî ya yekê Çapxaneyê El Ehram, Qahîre, 2000. – The Greatest Leaders of The 20 th Century. 1 st. Arabic Edition, Cairo, 2000. – El Hereke el Qewmiye el Kurdiye el Mu'a'sîre bil Siwar, fi wesaî't Beseriye Eqras Mudemmece. (Ev pirtûk wek CD rom hatiye belav kirin.)
- 4- Zahid Birîfkanî yek ji kurên şêx Memdu'h Birîfkanî ye, li Uniwêrsîteya Mûsilê beşê kimyayê xwendiyê, amadekarê beşê yekê ya pirtûka şêx Memdu'h Birîfkanî ya bi navê laleşin e. Du Cd yê enstrumental yê muzîka kurdî derxistine: Enstrumental- Kurdî 1997, Stembol û Sulav 2000, Stembol.

## NÛR MIHEMED li ser jiyana babê xwe şêx Memdu'h Birîfkanî bi kurtî weha dibêje:

şêx Memdu'h 1911 (hicrî 1329) li gundê Badê bi ser nahiya Doskiya ve hatiye dinê. Dema mala wan ji badê bar kir bo birîfka temenê şêx 3 sal bû. Di 7 saliya xwe de dest bi xwendina Qur'anê kir. Her wiha li Birîfkê û li Dihokê li ba Mela 'Ebdullayê etrûşî dersên dînî girtin. Li şûşê li ba Mela 'Ehmedê Soranî û li Spîndarê û li Etrûşê li ba Seyîd 'Ehmedê Dergelî û li Mûsilê li ba Fetta'h Efendî û li Bêsipnê li cem şêx Nesrûddînî xwendina xwe ya berde-wam kir. Paşê vegeriya Zaxo û li ba Mela Yûnis xwend. Paşê li Birîfkayê li ber destê Mela Mihemed 'Ebdulxaliqê 'Eqrî û li Germava li cem şêx Ziy-aeddîn û dîsa li Zaxo li ba Seyîd Mela 'Ehmedê 'Eqrî xwend. Sala 1931 ê mîladî xwendina xwe bi dawî anî. şêx Memdu'h Birîfkanî êvara roja şemiyê 10.4.1976 ê li Bexdayê ji ber rawestana dil çû ber dilovaniya Xudê.

Laşê wî yê pîroz ji Bexdayê anîn Dihokê, binecihê mala wî û li Mezargeha Dihokê ya mezin li ba turbeya Sebxetullahê Miftî veşartin.

## Wergirtina Îcaza terîqata Qadirî<sup>(\*)</sup>

Li gor Îmam Mihemedê Rizwanî 1269-1357 ê hicrî di pirtûka xwe ya bi navê Adab û Exlaq de ku Mehfûz Mihemed Umer Begê 'Ebbasî sala 1402 yê hicrî li çapxana El cumhur li Mûsilê çap kiriye weha li ser şêx Memdu'h di-peyive: Piştî ku îcaza 'ilmî li ber destê şêx Mela 'Ehmadê Muderis ('Eqrî) wergirt, her wê salê îcaza Terîqa Qadirî ji destê şêx Mihemd Rizwanî wergirt. şêx 'Ehmedê 'Hebbar dibêje şêx Memdu'hî li gor ku wî îcaze ji şêx Mihemed Rizwanî wergirtî, ji çend hamîşên Delaîlul El xeyrat û.h.w.d., îcaze da min.

(\*)Em fotokopiya orjînalê wergirtina îcaza terîqa Qadirî ya şêx Memdu'h Birîfkanî li vê derê çap dikin. Li gor vê îcazê şêx Memdu'hî roja 18ê meha Zil 'uqde ku dibe roja pêncşemê sala 1353ê hicrî îcaze ji şêx Mihemed bin Zenûn el Rizwanî wergirtiye.

## BERHEM Û XEBATÊN ŞÊX MEMDU'H BIRÎFKANÎ

- 1- Laleşîn: Beşê yekê ya dîwana wî 1997, Stockholm, Çapxaneya APEC
- 2- Ferhenga Birîfkanî:<sup>(1)</sup> Cara pêşiyê wek birek ji beşê yekê ya dîwana wî hatiye çap kirin. Orjînalê wê di sala 1950 ê de hatiye nivîsandin. Ferheng bi kurdî-'erebî ye, şêx Memdu'hî peyvên kurdî hem bi elfabeye 'erebî, hem bi elfabeya latînî ya kurdî nivîsandine.
- 3- Berhevkirin û nivîsandina dîwana şêx Nûreddînê Birîfkanî: 1940-1966
- 4- Berhevkirin û nivîsandina dîwana şêx şemseddînê Qutbê Exlatî yê Birîfkanî: 1940-1966
- 5- El Heqîqe we el beyan fî tercumet Sadat Birîfkan. Ev pirtûk bi zimanê 'erebî hatiye nivîsandin. Ravekirina şecereya binemala Birîfkanîyan e. 1961.
- 6- Pêncî û yek helbestvanên kurd: Ev xebata şêx Memdu'h ji berhemên 51 helbestvanên kurd pêk tê.
- 7- Ji bilî berhemên helbestan, şêx Memdu'h Birîfkanî gelek çîrok û metelokên kurdî û gotarên li ser dîroka kurdan bi zimanê kurdî û 'erebî nivîsandine. Ev berhem li ba Zahid Birîfkanî parastîne.
- 8- Lîsteya şecereya binemala Birîfkanîyan: Cara pêşî wek birek ê beşê yekê ya dîwana

şêx Memdu'h Birîfkanî de hatiye çap kirin.

(1) Ev înfomasyona li jêr rûpelek bû di nav ferhenga şêx Memdu'h Birîfkanî de ku bi destxetê wî bixwe hatibû nivîsandin. Lê di beşa yekê ya Laleşînê de nehatibû çap kirin, lewra me pêwîst dît ku li vê derê çap bikin:

## Mîrên Amêdiyê yên ku li Amêdiyê 'hukim kirine:

ji sala, heta sala, demê 'hukim

- 1- Mîr Bahaeldîn, -, -, 45 sal.
- 2- Mîr Zeyneldîn kurê Mîr Bahaeldîn, -, -, -.
- 3- Mîr Seyfeldîn kurê Mîr Zeyneldîn, -, -, -.
- 4- Mîr 'Hesen kurê Mîr Seyfeldîn, 875h./1470m., 935h, 60 sal û mir.
- 5- Sultan 'Husên kurê Mîr 'Hesen, 935h., 984h./1576m., mir.
- 6- Mîr Qubad Beg kurê Sultan 'Husên, 984h./1576m., 987h.
- 7- Bayram (Behram) Beg kurê Sultan 'Husên, 987h, 993ê, sala 994 ê bi destê Sîdî Xan hat kuştin
- 8- Sîdî Xan kurê Mîr Qubad Beg, 993h./1585m., 1039h., 45 sal<sup>(1)</sup>
- 9- Mîr Yûsif Xan 1039h. Ji aliye melik E'hmed Paşayî ve hat girtin. Xistin zîndana Diyarbekirê. Paşê sala 1048h./1628m. hatiye berdan.
- 10- Mîr Qubad Beg. Ez texmîn dikim ku kurê Mîr Yûsif Xanê 'hakimê Amêdiyê bû. Zêdetir ji 23 salan 'hukim kiriye. 'Hukmê wî heta 1071h./1660m. berdewam kir.
- 11- -, -, -, -.
- 12- -, -, -, -.
- 13- Qubad Paşa., 1112h/1701m, -, -.
- 14- Mîr 'Usman Paşa. Di sala 1120ê de 'hakim bû.
- 15- Mîr Baram (Behram) ê Mezin kurê Zubêr Paşayê kurê Qubad Paşayê kurê Mîr Se'îd Xan kurê Sultan 'Husên. , 1138h/1723m, 1181h/1767m, 44 sal, mir
- 16- Mîr 'Îsmâil Paşa kurê Baram begê mezin., 1181h/1767m, 1213h/1796<sup>(2)</sup>, mir
- 17- Mirad Xan kurê 'Îsamîl Paşayî., 1213h/1796m, 1218h/1803m<sup>(3)</sup>, -
- 18- Qubad Paşa. Kurê 'Îsmâil Paşa., 1218h/1803m, 1219h, 'Eşîra Mizûrî ew xist zîndanê

(1,2,3) Hinek reqemên şêx Memdu'h ji hev nagrin. Lê me wek orîjînalê destxetê wî bixwe nivîsandin.

- 19- 'Adil Paşa, 1220h/1805m, 1223h/1808m, mir
- 20- Zubêr Paşa. Birayê 'Adil Paşayî., 1223h/1808m, 1232h.
- 21- Sa'îd Paşa. Ji 'hakimiya Zaxo bilind bû, bû 'hakimê Amêdiyê., 1232h., 1248h., Resûl Beg birayê Mêrgo
- 22- .....Paşa.<sup>(4)</sup>, 1249h., 1259 (Dibêjin heta 1272)

### Lîsteya helbestvanên Kurd yên kuşêx Memdu'h Birîfkanî berhemên wan civandibûn. Ev lîste ji ber destxetê şêx Memdu'h Birîfkanî bixwe hatiye nivîsandin. Wî çawa nivîsandiye, me jî bi wî awayî nivîsand:

- 1- E'hmed El Xanî
- 2- E'hmed el Cizîrî
- 3- Feqî Teyran
- 4- Melayî Batî
- 5- Bekir Beg Erizî
- 6- 'Elî el 'Umadî
- 7- şêx Nûr el dîn el Birîfkanî
- 8- şêx şems el dîn el Qutib
- 9- Memdu'h el Birîfkanî el muleqqeb (bîl Exlatî)
- 10- Remezax Axa el Cizîrî
- 11- La'xir el Cizîrî
- 12- şêx 'Ebdulselam el Cizîrî
- 13- şêx 'Ebdulre'hman el Extepeyî
- 14- Sîyapoş
- 15- Sa'î
- 16- Cegerxwîn
- 17- şiblî el Sindî
- 18- 'Îmad el dîn el Hekarî ('Hakil el hekarî)
- 19- Sebbûrî 'Hakim el Hekarî
- 20- şêx Tahir el şûşî

(4) Li vir nav yan înforsasyonên din qetiyane, me nekarî em bixwîni

- 21- şêx E'hmed el Gelî Rumanî
- 22- Xalid Axa el Bêsirî
- 23- Mihemed Axa el Bêsirî
- 24- Xalid Axa el Zêbarî
- 25- Mela Xelîl el Sêrtî
- 26- Mela 'Ebdulkerîm el Banî
- 27- Mihemed Emîn el Hîlalî (Goyan)
- 28- Macin
- 29- Hicrî
- 30- 'Elî 'Herîrî
- 31- Mîzir Rast
- 32- Mistefa Beg
- 33- Taha
- 34- 'Hemekor
- 35- Xakî
- 36- 'Hiznî
- 37- Mehrî
- 38- 'Hisnî
- 39- Feqî E'hmed el Rûsî (El muxlis)
- 40- 'Ebdulqadir el Kovilî
- 41- 'Ebdulqadir Yekgoş (Miftî Seray)
- 42- Mela Mehmûd Hoserî
- 43- şêx Qedrî Cizîrî
- 44- şêx Nûr Mihemed
- 45- 'Xerîb
- 46- Sadiq
- 47- Mirad Xan Bayzîdî
- 48- Xan 'Ebdal Cizîrî
- 49- Miskîn
- 50- Seyfî Hekarî
- 51- Nûris

## Li ser şêx Memdu'h Birîfkanî dîtinên çend rewşenbîrên kurd:

**Mela Mihemed Se'îd Yasînê Birîfkanî(\*)**

Ew e yê mêrxas, jîr, jêhatî yê diyar Memdu'h bi nav û wesif, xudan fazîlet, hişekî jîr û zimanek maqûl. Tiştên taybet yên ku li ba mirovekî kêr dibînî, li ba wî hene. Ew e yê digel heqiyê, yê bi wefa û mifadar. Ev jî ji karên musulmana ye bo birayê xwe. Ê ne xerîb e ji ber ku Xudê ev kiriye rizqê wî. Ê vî hejayî di destpêka jiyana xwe de û di biçûkaniya xwe dersên olî û yên erebî li gundê xwe Birîfka wergirtine. Piştê digel hinek dostên xwe ji wir bar kiriye, û ji bo wergirtin û xwendina zanistê geriyaye. Çûye bo bajarê Hewlêrê, Koyê û Kerkûkê û demekê li wan dera maye, paşê vegeriyaye gundê xwe. Paşê ji bona ku li enstîtu û mizgefta dersên taybetî werbigre li Zaxo binecih bû. Ê li ber destê seydayê hêja Mele 'Ehmed Efendî el 'Eqrî xwend ku ew wê demê kaniya zanist û çiraya rewşenbiriye bû. Ê heta ku şehada 12 ilmî wergirt li ba wî ma. Paşê vegeriya binecihê xwe yê pêşî û li Tekya Nûrî li Birîfka dest bi xwendina mamostatiya olî kir ku ji her derê xwendekar lê dicivyan. Paşê ji destxet û nivîsên kevin dest bi civandina pirtûkên nefîs kir heta niha jî ev pirtûkxane di destê wî de maye.

Paşê rewşê dest neda ku li Birîfkayê bimîne, di dawîya salên 30 an de bo bajarê Dihokê bar kir û li wir bi cih bû. Wî îcaza belavkirina rêça olî hebû û dest bi geriyana li deverên Tirkiya û îrşad û belavkirina rêça qadîrî li wê derê kir. Ê di wê serdemê de ev kar li Tirkiya qedexê bû, lê ji ber jîrbûna xwe şîya di destpêkê bi dizî ve û bi alîkariya xelkê wan de vera bi vî karî rabit. Ê karî bingeha vê rêçê li wê derê dane û mirîd û dost û mirovên harîkar ji xwe re peyda bike. Ewî ew xelk îxsîrî şexsiyeta xwe kirin. Bi zimanê xwe yê rehwan û xoş, pir ji wî û ji bîr û bawerên wî hez kirin. Ê ew bo wan cihê şanaziyê bû. Jixwe xelkê wan deveran hê ji serdema şêx Nûreddîn Birîfkanî û berî wî jî ji malbata birîfkaniyan hez dikirin.

Paşê ji ber rewşek acîl ya deverê ji Dihokê bar kir bo Mûsilê û paşê vegeriya Dihokê û paşê di serê salên 1950 yan de wek Waizê gerok ji aliyê Ewqafê ve hat tayîn kirin.

(\*)Mela Mihemed Se'îd Yasîn. Pirtûka bi navê Fuzela Behdînan 1997



şêx Memduhê Birîfkanî lêkolînên giştî li ser edebiyata kurdî bi zarava behdîmî dikir û di edeba erebî de jî pir jîr bû. Helbestên bi zimanê kurdî û her wisa pexşan û çîrok bi zimanê kurdî nivîsîne. Her wisa di destên wî de helbest û çîrokên gelek rewşenbîr û helbestvanan hene. Ji destxetên kurdî yê kevin wek dîwana şêx Nûreddînê Birîfkanî di nav de nesîhet û remz û zewqiyat bo xelkê tesewîfê dikin û her weha dîwana şêxê Cizîrî û muelefaten şêx E'hmedê Xanî şêxê ku gelek berhemên mezin wek ferhenga kurdî ku heta niha destxet e civandine. şêx Memduh kurê şêx Muhsînî birayê şêx Nûriyê birîfkanî ye.

### Sadiq Bahaeddîn Amêdî

Sadiq Bahaeddîn Amêdî di pirtûka xwe ya bi navê "Hozanvanê Kurd" da li ser Birîfkanî weha dibêje: "Bêguman nemir şêx Memdu'h hozanvanekê desthel û jiberxo derkeftiyekê diyar e di vehandin, lêkînan û kêş û seng û darêştinê li ser cûrê klasîkî yê kurdî çûye. Nemaze bi hozanvanê mezin xudanê xwendengeha yekê di vehandin û kêş û sengandunê, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran. Cudayîya ku tete çav, navbirî bizav kiriye li ser awayê hozanvanê sedî bîstê li ser diçin, çûye ku çend ji destî bêt hozana xo bi zimanê kurdî vehînin û darêjin ku di vê çendê da bi min were şêx Memdu'h dest hatî bît, ji ber ku gelek li dûv gotinê kurdî yê dîr ji zimanê biyanî di hozanê xwe da bi kar înayne û xir vekirîne. nemaze navbirî bi navê rêberê olî (dînî) li Kurdistana Îraqê, Turkî û Îranê geriyaye. Navbirî di van geşt û geriyana da gelek destnivîs yê qetlaz di torê kurdî da xir vekirîne û heta niho jî gelek jê mane ku ronahiya rojê nedîtine."

Her wisa di her wê nivîsê da Amêdî dibêje: " şêx Memdu'h her wekî çend hozanê wî yê belav bûyîn diyar dibît ku rewşenbîr û desthatî bûye di vehandina hozana da. Navbirî bi çend hozanê klasîkî nemaze yê Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran her wekî hatiye gorin, heyran bûye, li ser rêça wan çûye di babet û layê hozan pê vehandîn, nemaze evîn û pêgotinê, ji bilî welatparêziyê."

Sadiq Bahaeddîn Amêdî vê ra diçe û dibêje "Seydayê zana Ebdulhemîd Etrûşî(\*) derbarî şêx Memdu'hî gotiye 'navbirî mirovekê zîrek û şehreza bû,

(\*) Seyda Ebdulhemîd Etrûşî qaziyê Bexdayê bû. Paşê bûye "Qazî Quzat el Îraq" (serokê hakim).

di zanistê olî (dînî) desthatî bûye, li devera Behdînan, li nav Goyan, li Exlatê û deverê kurdî li Tirkiya digeriya li ser mirîdê xo'."

### Sebrî Botanî

Seyda Sebrî Botanî sala 1997 ê, berî biçe ber dilovaniya Xwedê nameyek ji min re (Zahid Birîfkanî) şand û tê da li ser tîkiliyên xwe û şêx Memdu'h Birîfkanî weha nivîsandiye:

### "SILAV Û REHMET Û RASTÎ.

Rehmetiyê gorgulav şêx Memdu'hê Birîfkanî di edebiyata me ya klasîk de navekê girîng e. Lê mixabin heta niha wek pêdivî ye nehatiye nasandin: Ew her dem li pey destnivîs û çavkaniyan digeriya û destê xwe li nedimicand, çi kesê viyaba dişiya wan jêderan bibînt.

Ez li vir wek nimûne dibêjim: Rehmetî sadiq Amêdî tibabek ji babetên pirtûka xwe "Hozanvanê Kurd" bi alîkariya van jêderên şêx Memdu'hî temem kiriye. Ji salên şêstan ve ez agahdarî vê bizava wî bûm, çi li başûr çi li bakur... Carekê min ji tinaz ve ne ji dil, gotê:

- şêxê min tu xwe pir zehmet didî, xwe hind newestîne, ma bo çi ne? Madem nahêne çapkirin û belavkirin.

- Ma ez çi bikim, wî got, pêdivî ye em li edebiyata xwe miqate bin, her dem di hizra me da bit, em wê ji hindabûnê biparêzîn, da her dem jêdest û berçavên me bit, çunkî heger em jê veqetin, em ji koka kultur û edebiyata xwe vediqetin, em dê xwe jî hinda bikin.

Li Bexda ez çûbûme seredana wî û min bi vî awayê jêrîn silav kir:

- Silav li ser şêxê edebiyata me! Wî jî silava min veda û got:

- Estaxfrullah! Heddê min çi ye, te bi vê gotinê ez şermizar kirim, çunkî kesek neşiyaye û dê kesek nebit jî bişê vê nîşanê ji "Nîşanî" bistînit, şêxîti û şahîti ya ş'ir û şa'iran li bejn û bala wî hatiye pîroz kirin, ez feqiyekê belengaz im ji feqiyên Dîwana Cizîrî.

Êdî ew maye bibêjim, ez zor kêfxweş im bi çapkirin û belavkirina van helbestên şêx Memdu'hî ên xoş û coş, yan evan gul û kulîlkên wî ên geş û bîn-xweş.\*

(\*) Sebrî Botanî qala pirtûka şêx Memdu'h Birîfkanî ya bi navê LALEŞÎN dike. Gorbehişt berî mirina xwe ev pirtûk dîtibû; pir kêfxweş bûbû. Lê digot şêx Memdu'h hêja ye ku dîwana wî ya kamil û hemû berhemên wî bigihin çapê.

## Hafiz Qazî

Seyda Hafiz Qazî sala 1997 ê di nameya xwe da ya ji Zahid Birîfkanî re sandibû weha li ser şêx Memdu'h Birîfkanî dipeyive:

"Têkiliya min ligel Cenabê şêxî, serê sala 1960 ê zayînî li bajêrê Bexda dest pê kiriye, eku ez ghiştîme xizmeta wî li cem doktor Sedîq Etrûşî li Wezaretê Perwerdê, û paşê em pêk ve çûyîne cem Seyda Sadiq Bahaeddîn li Rêberiya Giştî ya Xwandinên Kurdî.

Min li bîr e şêx Memdu'hî çend hevokekên kurdî bo me rast kirin, wek:

dengûbas got: Salox çaktir e, jinkabanî got: Hevgiyan rêkeftûtir e, giriftarî got: Rîp, berê spêdê got: Elind

Gelek hevokên dî bo me rast kirin, lê min li bîr nemayne.

Peywendiyên me berdewam bûn û bihêz ketin û sala 197 ê li yekemîn konferansê Yekitiya Nûserên Kurd li Bexda, em gehiştîne yek bi amadebûna seydayê mezin û helbestvan Hejar Mukriyanî û Madam Joyce Blau zimanzana frensî, mamosta zimanê kurdî li zankoya Sorbon li Parîsê. Piştî danûstandina kurt sohbeta şêxî gelek bi dilê seyda Hajarî hat, seydayê Hejar bi dilxoşî li min vegeriya û got:

"Erê bira, te bo heta nihe cenabê şêxî ji me dûr kiriye, gelê me pêwîstî bi zanayên xudan seng yên mîna şêxî hene...."

Xebata şêx Memdu'hî ya bêrawestan û kulneder, geşt û geriyanên wî li tevdeverên Kurdistana mezin, bûye egera serekî di şarezahiya wî da di şêwe û zarên hemecûrên Kurdistanê, û gencînek pir buha û nirxdar ji peyv û hevokên resen bi dest ketîne, û gelek bi hostayî li paşerojê bi kar înayne di raçandin û vehandina hozanên xo da.

şêx Memdu'hî bi taybetî li devera Behdînan, wek çakefêrîsekê pêşeng û alahilgîrekê navdar û şarezayîyekê melevan di meydana rewşenbîriyê û ilmê olî û rêça Qadîrî de dihête nasîn. Roleka berçav leyîstiyê di qada hozanvaniyê de, gelek keval û şakarên nayab di wesf û pesindariya Kurdistanê da darêştîne, bi hevokên nazîk û şîrîn bi rêzên helbestan xemilandine, û kela dilê xwe û vîna welatî bi şewekê bi lîmnet û hunerî û desthelî derbiriye, û mifayekê çak ji gencîna hevok û peyvên resen dîtîye, bi şewazeka spehî û hostayetî, kirine amîrên ristina hozanên rind û ciwan û xeyalberz.

Hafiz Qazî vê ra diçe û dibêje:

Rêbaza hozanvanên kurd yên klasîkî mîna Melayê Cizîrî û Seyda Ehmedê xanî û Feqîyê Teyran di vehandina berhemana da, kartêkirineka eşkere li ser rêbaza şêx Memdu'hî kiriye, û li dûv dewsa wan çûye.

Kurê wî Zahid bi erkê çapkîrîna vê dîwanê rabûye, û ji windabûnê parêstîye. Karê wî cihê sipasiyê ye û şanaziye ye.

Hêvîdar im piraniya berhemên wî (şêx Memdu'hî) afirandî û vehandî, ew jî bikevine ber çavên xwendevanan û kitêbxaneyên kurdî pê bête xemilandin...(\*)

## Reşîd Findî

Seydayê Reşîd Findî di sala 1997 ê berî çapa LALEŞÎNÊ sê helbestên şêx Memdu'hî Birîfkanî ku ji zardevê şêxî bixwe, berî mirina wî Reşîd Findî nivîsibûn û heta hingê parastibûn, dan min. Her sê helbest jî di Laleşînê de hatine çap kirin. Piştî çapa Laleşîne min nameyek ji Reşîd Findî girt, ew tê da qala şêx Memdu'hî weha dike:

### " Çend peyvek bo Memdu'hî Birîfkî

Her li gencatî li Dihokê me guh lê dibû ku şa'îrekê navdar yê heyî, bi navê şêx Memdu'hî Birîfkî...demê li sala 1970 yê Êketiya Nivîserêt Kurd hatiye damezirandin, hêja şêx Memdu'hî Birîfkî êkem kes bû ji Dihokê hatiye daxwaz kirin, û demê kongra êkê li zuzeyrana sala 1970 yê li Bexda hatiye danan, şêx Memdu'hî Birîfkî, di helbijartineka dîmokratî da wekî endamek bo desteka îdarî ya merkezî hate hilbijartin, her wisa li sala paştir anekû 1971 ê demê Liqê Dihokê yê Êketiya Nivîserêt Kurd hatiye damezirandin, şêxê Birîfkî wek serok bo wî liqê hate hilbijartin, û me pêk ve kar dikir, û wî bi dilsojî û zîrekî karê xo encam dida, û piştî hingê peywendiyê me roj bo rojê mukim dibûn, ew wekî serok bo liqê û e jî wek sekreter, gelek caran hozanê xwe yê ciwan bo me dixwandî, û sê hozanê xwe jî bo min dixwandî û min nivîsîn wekî bîrhatin da li cem min bimînin, ew jî eve ne: "Yazdeyî Adarê, şax û Daxên Welatê Me, Laleşîn" ku heta nûke li cem min mayîne û bi hemmen novîsînê min hêlayîne, her wesa piştî hevaliniyeka domdirêj me digel hev bûrandî, û baweriyeka baş di navbera me çêbûyî, carekê li mala wan gote

(\*) Hafiz Qazî jî wek Sebrî Botanî beşa yekê ya dîwana şêx Memdu'hî Birîfkanî dît û pê gelek kêfxweş bû.

min:

- Min divêt ez û tu projeyekê digek êk bikeyn.

- Proje çi ye?

Got min berhemê gelek hozanvanêt kevin heye, heta niho belav nebûyne, ez dê xwînim û tu jî bi rênivîsa kurdî ya nwî binivîse û mixabin ev berheme her ê veşartî bît!

Û me her duwan biryara wî karî da, lê mixabin serûberê nesaxiya wî û her wisa serûberê siyasî hingê we nekir em vî karî bikeyn.... Heta wexerkirina wî li sala 1976 ê.

Reşîd Findî vê ra diçe û dibêje:

Hozanê şêx Memdu'h Birîfkî di ter û nazik û ciwan in, û rehwaniyeka hunerê hozanê û şarezaiya zimanê lê diyar dibît. Û ew hozanvan kulûmeteyekê bilind e di hozana klasîkî ya kurdî da li vê dumahiye û xodîkeka ron e bo hozanê çendîn hozanvanê kurd, mîna Cizîrî û Teyran û Bateyî û Nûreddîn Birîfkî, û guleka bêhnxoş bû, bêhna wan jê dihat. Cihê dilxoşiyê ye bo me hemiya, ku li vê dumahiye kurê wî yê hêja Zahid şiyayî hindekan ji hozanê wî di bergê dîwanekê da li Swêdê çap biket û belav biket, hîvîdar in ew roj bihêt ku hemî dîwana wî bête çap kirin, ji giringiya berhemê şa'irê Birîfkî.

#### **Ebdurehman Mizûrî**

Evdirehman Mizûrî di rojnameya Botan, hej. 8, sibata 1992 ê di gotara xwe ya bi navê "Pêncî û yek hozanvanê kurd" de li ser berhemên Birîfkanî weha dibêje: "...Helbestvanê gorbeheşt şêx Memdu'hê Birîfkanî di salên heftiyên de bi hêviya lêkolîn û berhevkirin û çapkirinê navên 51 helbestvanên kurd di lîsteyekê da nivîsîbûn. Lê mixabin berî ku ew bigihije umîda xwe daskika felekê nêrgiza jîna wî qurmiçandiye. Yek ji torevanê kurd ku sud û mifa ji vê lîsteyê ditiye û dest pê va dirêj kiriye, Sadiq Bahaeddînê Amêdî ye. Bi tevayî ev 51 navên helbestvan û nivîskarên ku di lîsteyê da ne, bi kirmanciya jorîn vehandine û berhemên wan li cem Birîfkanî hebûne..."

Piştî çapa beşa yekê ya Lalesînê, ji seydayê Evdirehman Mizûrî nameyek ghişte destê Zahid Birîfkanî. Hêja Mizûrî li şêx Memdu'h Birîfkanî weha gotiye:

Demê hêja Kak Zahidê Birîfkî ji min xwastî tiştêkî li ser beheştî Memdu'hê Birîfkî binivîsim, bi semedê min li başûrê Kurdistanê gotar li ser ho-

zanvanê navbirî, bi kurdî û erebî belav kirîne, ez hêbetî mam û heyran! ji layekî ve ne pirtûkxana min li vê e-Elmanya- li ber destê min e, ji layekê dî ve ne kesekê wesa li vêre heye riyekê bibete berhemê Birîfkî! Di ser hindê ra wek sivoreyî li gor ber û minên xo min biryar da ewê di hizra min da binivêsim bila êk ji sedê bît, ji sifre çêtir e.

Di salên şêstan de demê ez xwendkarê Qutabxana navincî, carna çavê min bi şêx Memduhê birîfkî diket. bejinbilind, dêmgêş û sor û spî keftîspî, cilîkspî, ji serî heta binê piya spî...Tu dibêjî niho du firîştah ji esmanî înye erdî! Wê gavê min Birîfkî nediniyasî.

Niyasîna min û wî dizivîrte salên 70 yan, demê ez û ew pêk ve carekê di êvariyeka hozan xwendinê de li Dihokê pişkdar bûn. Ew jî bi helkeftina bîrhatineka damezirandina Êketiya Nivîserên Kurd bû.

Wî demî mala me li Silêmaniyê bû, carna dihatime Dihokê û diçûme seredana wî, li ser hozana kurdî ya kevin û nû dipeyivîn. di seredanekê da min jê pirsî, erê şêx Nûreddînî Birîfkî çi li ser seydayê xo mele Yehyayê Mizûrî nenivêsiye? Gote min hozaneka erebî ya bilind li ser nivêsiye. rabû çû destnivêsek anî û xwand, serê wê eve bû:

#### **Yareb zîdfî 'heyatî l' 'heyfî Mewlana Be'hrûl 'ulum we qurbûddîmî "Yehyana"**

Paşê hemî hozan pêşkêşî min kir. Min jî êxiste nav berperên destnivêsa dîwana şêx Nûreddîn da.

Memdu'hê Birîfkî di wextekî da lîsteyeke navên 51 pêncî û êk şa'irên kurd, ewên bi kirmanciya jorî hozan vehandîn, nivîsîbû. Digo hozan û berhemên wan li cem min in, ez- anku Birîfkî- dê pirtûkekê li ser wan nivêsim. Mixabin şaloka qedere, bejna wî ya bilind berî bigehite armancê ji nav me bir.

Hêja Mes'ud Mihemed Se'îd Birîfkî navên wê lîstê hemî nivîsîbûn, libek jê dabû min jî. Niho destnivêsa wê di pirtûkxana min da li Dihokê maye. Di gotarekê da her 51 pêncî û êk şa'ir di hejmareka rojname Botan da min belav kirîne. Hinek ji wan hozanvane heta evro jî nehatîne nîyasîn û rêzek li ser nehatiye nivêsin, wek: şibliyê Sindî û 'Eliyê Amêdî û Xakiyê Akreyî û.h.w.d.

Beheştî Birîfkî li piraniya deverên Kurdistanê geriyabû, lewan şerezaiyeka hêl di ezmanê kurdî da hebû. Ewî digo: Bêvarî anku nesaxiyên

giran, tayên giran "El 'Hummiyat". Pelazik kulîlkeka rengsor a zozana ye. Bav bijilî babê, anku reng, dibêjin bavzer anku rengzer. Palas koçk ûqesr e, peyveka kurdî ye, ne ji îngilîzî hatiye wergirtin û.h.w.d. Xoş e bizanîn 'Ehmedê Xanî berî sêsed salan palas di MemûZînê da bi kar aniye. (M. B. Rudinko-B: 131) Eve jî rastiya boçûnên Birîfkî xuya diket.

Birîfkî digo êkemîn hozana wî vehandî, di jiyê 17 hivde salî da bû, serê wê eve ye:

**Dilberê serdara cana xal û xet miskê teter  
Ziyareta her du reqîban her wekû eswed 'hecer**

Hozanên wî mîna piraniya hozanvanên kurd nehatîne komkirin û çapkirin.. Ewên kê mîna hatîne belav kirin, nimûna hozanên kurdî yê bilind in, bi ezmanekê sivik û rehwan hatîne dariştin, mînakên rind û ciwan tê da hatîne girtin. Mezîqa wan hind a bicoş û şîrîn e mirov ji ber wek perinda difire.

Cihê daxê ye Êketiya Nivîserên Kurd- Tayê Dihokê ku ji sala 1970 ê were hatiye danan, heta evro -1997- semînarekê sêwî jî bo hêjayan Memdu'hê Birîfkî û Mihemed Se'îd mele Yasîn Birîfkî û bo xêzana evê dumahiyê xatun Sarya Mistefa Doskî terxan nekiriye. Ne bi helketina ji dêbûna wan, ne jî bi mirina wan! Nizanim kengî jî dê bajêrvaniya (belediya) Dihokê kolan û rêpan û meydanên bajarî bi peykerên wan hêjayan xemlînît!

15.10.1997

şêx Memdu'hê Birîfkanî di destpêka dîwana xwe ya destnivîs de berî helbestên xwe çend helbestên "El şêx 'Ehmed el Cizîrî" -Melayê Cizîrî-nivîsandine. Di destpêka helbesta Cizîrî ya ku Melayê Cizîrî û Mîr 'Îmadeddîn davêjin ber hev, şêx Memdu'h Birîfkanî weha nivîsandiye:

"Ev helbesteka sêrêzî a hevpişk e. Di navbera Xudênas şêx 'Ehmedê Cizîrî-qeddese sîrrahû- û di navbera mîrê mezin Îmadeddîn 'hakimê Hekarîyê ku heta sala 1049 ê hicrî -1639 ê mîladî- li Hekarîyê 'hakim bû."

Zahid Birîfkanî  
Kurdistan- Hewler 2002

**ŞÊX MUŞEREF**

şêx Muşerref kurê şêx Es'edê Xenûlê yê Berwarî yê Es'ertî li 23 ê muherrem sala 1377ê hicrî li ser pesindariya şêx Memdu'h şêx Muhsinê Birîfkanî nivîskarê wê dîwanê, weha dibêje:

Dema çav me ron kir wî mubarek notûheşt<sup>(1)</sup>  
Pêkve ev dunya tamamî, bir'me bo her wek beheşt

Beheşt<sup>(2)</sup> min xoş qelb min geş lêvê min beş wî kirand  
Her wekî nîsan bibî şeş, kom bibin esbab gişt

Sal bûn min digo 'ilm û huner yek carî neman  
Dîtina wî ew kul û êşan ji min yek carî rişt

Durre e ewladê Zehrai durre e ehilê 'îbad  
şax sadatê Birîfkan beyraqa zozan û deşt

Ey Muşerref bes bibêj yeksane lew kurt û dirêj  
Yê ku zana bî li nik wî wek yek in lew tişt û tişt

23 ê muharrem/1377

li gundê Berzûr, Sindî- Zaxo

-----  
(1) Notûheşt li gor hejmarê ebcedî dibe "Memduh"

(2) Li vê derê bi tenê pîta 't' tê xwendin.

dîwana  
Şêx Memdû'h Birîfkanî

Helbest

## Êşa Welatî<sup>(\*)</sup>

Bi Xudê êşa welatî, dax ji min ho daneve  
J' dil disojim wekî mûmê, kul û derd cemyaneve

Ger bibînim her wekî erda, tu jî xo b' xo bikevî  
Dil di xoş bit bêguman, ji bêvêrî dê rabmeve

Me hema peyman û sond e, dê bikeyn ku tu bijî  
Xem nekêşe roz dirêj e, carek dê l' me êteve

Nêzîk e roja me bêt, alayê rengîn b' helêt  
Xeml û rewşa wilatan afîtab lê bideteve

Serniqara sibehê, ala bilind keyne seran  
Deng û awazê şîrîn, rojê du ca l' me bêteve

Serê salê dê bikeyn şehyan û keyf û sema  
Serbilindî gef û gur caba biyaniya b' deyneve

Her divêt roja me bêt em jî wekî hemî dira (dera)  
B' leşkerên lawên çeleng sînore xo bigrîne ve

We'ide bît roja me bêt desta bideyn darê çeka  
Ah û tolan em bixwazîn kevniya nî keyneve

Bîst û pênc milyon hene kurd jî eger bêne ser êk  
B' serfirazî dê bijîn yan co ji xunê beyne ve

Evro wext e xoş derav e spêde ye bîva me hat  
Rabne ser xo gelî kurda rê û berahya we ev e

Pêk ve rawestin bira, ber l' şergeha nav l' xo bidin  
Dijmina j' erdî rakin, jîn bê xwîn naêteve

Ev jiyana e pêk ve jan e, mirin j' jînê çêtir e  
Dijmina goştê me xwar û hestiyêt me mêtneve

Çendî lawên hatiye kuştin ser di pê xisma te da  
Ez bo hemya yî daxedar im yek bi yek dinasmeve

Xanedan in sermiyan wa l' Serheda wêran kirin  
Nazikên şox û şepal, l' serê çiya berdaneve

Ew zikên hatye dirandin bêbinas û rê kirî  
Yan biçîk lê hatye sotin j' bîra min naçîteve

Zik li jinka şeq kirin biçîk b' qazoxa ve d'kirin  
Hêj nemirîn binber kirin kê l' kafira kirye ev e

Wek firenga l' me kirin sed sed li zîndana mirin  
Çîçîk ji jinka vedkirin b' saxî l' gora daneve

Sed hezar bê bab kirin ew jî j' welatî der kirin  
Nîvek l' kolana mirin, pêxas û bîrsî maneve

Bes e Exlatî bibêje, Notûheşt j' derda yê gêj e  
Dad û fîxanek ji mêj e, gelî kurda rabineve

-----  
(\* ) Ji bilî helbestên Yazdeyî Adarê, Welatê Me (Xemla Kurdistanê), Lalesîn, navên hemû helbestên din ji aliyê Zahid Birîfkanî ve hatine danîn.

Ferhengok:

Hew dan: Dan ser hev, civandin

Cemiyana: Civiyana

Bêvêrî: Nexweşiya Tfoyê, êşa giran, girane ta, kewtoyî

Aftab: roj, xor, tîrêja rojê

Serniqar: Elind, şefeq, berî danê sibehê

Bîv: Derfet, fîset, hel, keys

Derav: Derfet, keys

Gevûgur: Bêminnet, jixwerazî, piştrast

Xîsm: Rêç, rê, le pênavî tu da, le rêy tu da

Notûheşt: Li gor hejmara ebcedî dibe Memdu'h

\*\*\*

## Yazdeyî Adarê

Spêdeya yazdeyî adarê ron kirin l' me çiya û deşt  
şahiya serê buharê Kurdistan kirye beheşt

Kurdistan dîsa bû rewşen mêrg û çîmen xemilîn  
Surperî hatne semaê xoş kirin seyran û geşt

Cejne bûn du l' vê buharê, Nevroz û Yazdeyî Adarê  
Rabe da em b'çîne karê, serê sala me gehişt

Rabe da ez tu bi hev ra b'çîne pîroziya  
Kul û kovana bihêlîn nê (ser) ji nû kurd bûne tişt

Aştîyê cejne kirin du dergehê xoşiyê vekir  
Leşkerên hatne berayê şahiya me ji nwî gehişt

Aştîyê şer j' nav me rakir, bangê azadî veda  
Aza kir çendî xirabî, rast e ya bûrî me hişt

'Ereb û kurd bûne yek dil bûne hemrah û bira  
B'rastî hêla ya berahyê nwî kirin wan mal û tişt

'Ereb û kurd pêk ve hatin ew bûne dost û heval  
Cih bo xwînmêja nehêla rakirin ew dane pişt

Kul û kovan qe neman daxek di dil da ma tinê  
Sed mixabin bo şehîda wa xwîna xo bo me rişt

Ez bi wan lawan dinalim şeb û roj dil bi xem e (girîn)  
Navê hemya min nivîsîn kul û kovan bo me hişt

Sê deqîqa mînine bêdeng rabî'ta wan hûn bikin  
Fatîha b'xwînin ji bo wan Exlatî bû notûheşt(\*)

-----  
\* şêx Memduhî bixwe nivîsandiye "Memduhî zat"

## 'Eşqa şirînê

Ji 'işqa te şirînê min hewar e  
Me ser 'hetta qedem can pêk ve nar e

Ji ser 'hetta qedem bûm pêtekê sor  
şeb û rojê mi ne sebr û hedar e

Mi ne sebr û ne 'ezm û ne sukûn e  
Li zarê min daîm me'hbûb û yar e

Ji me'hbûb û şirîna te bidêrim  
Bes î min tu ji çend dost û neyar e

Ji dosta û hevalan te didêrim  
Bi xo mîr im ne mihtac im çî çare

'Ezîzê şengê seyranê, tu rû'h î  
Dil û can û cesed min bo te dar e

Me dil da te û d' ser danî di rê da  
Di bibirim yan jî weslet min beyar e

Ji qesda wesla sultanê wilatan  
Me daim l' ber 'hebîbê ah û zar e

Ma çend sala xem û t'elî dixwarin  
Ji çavên reşbelek leyl û nihar e

Digeriyam ez li kehfan û li xaran  
Wekî kewên bi nalîn û hewar e

Ji derd û firqeta me'hbûb û cana  
Me dinya pêk ve zulmat û bixar e

Bixarê avête çehvên me yekser  
Ku bîna min di qesrê de 'hesar e

Ji hicra serwerî alem l' me bûrî  
Hizar û sêsed û pêncî w du çar e<sup>(\*)</sup>

Te dil sotî ji Memdu'hê Birîfkî  
Ji sala hijde ye evro bihar e

-----  
(\*) şêx Memduhî bixwe li jêr nivîsandiye 1358. Dibe 1938 ê zayînî.

Ferhengok:

pêt: pelê agir, poloyî agir

'ezim: tiwanayî, îrade

sikûn: aram, aram bûn

zar: ziman, dem, beyan

bidêrim: jê digrim, helebijêrim

Kehf, 'xar: şke

\*\*\*

## Gunahêt Min

Gunahêt min wekî xîzê çeman e  
Me rûreş bû li 'huzûra Yezdan e

Li şerma reş çawa dê biçme pêş wî  
Çi bêjim, dê çi kim sed car eman e

Bira tedbîrekê l' halim bikin hwîn  
Li ser min barekê bêhed giran e

Her ro rojek ji 'emrê min diçîtin  
Ditirsim bimirim bêtoşe mane

Peşîman im ji wî 'emrê ku bûrî  
Nizanim dê çi kim çend roj me mane

Xudê bo xatira qenc û se'îda  
Li paş mirnê nekî min poşîmane

B' rûyek spî bihêm ez te bibînim  
Bi dilxoşî bigirîm şadimane

Hemî dosta digel min tu 'efû key  
Digel wa ez bikem şahî w şehane

Xudê tobê tu dane ser me îro  
Gunahêt min li bin 'efwê tu dane

Peşîman im ji destê min çi naê  
Çawa çêkim hewar e ev çi jan e

'Emir bûrî nema wextê 'xirûrê  
Tu rabe lez bike rêkê bizane



Te jî bûrî sih û çar sal temamî  
Kir hicret l' sê sed û şêst û siyan e

Tu lez ke j' dil bike tobê Xelatî  
Hevalêt xo bihijmêre çî mane

Yeqîna min ew e dê min 'efû key  
Dema mirnê bidey Memdu'h îmane

-----  
ferhengok

xîzê çeman: qûma li ber rûbaran, zîx û çêwî çem û rûbar

şadimane: kamuranî, dilxweşî, bextiyarî, şadî

xirûr: jixwerazîbûn, azayetî, biwêrî

sêsed û şes û siyan e: 1363 hicrî. dibe 1943 zayînî

Xelatî: naznavê şêx Memduh

\*\*\*

## Zulfên Di Mest

Çingaleyê zulfên di mest havête xirfê (xirxê)\* inqilab  
Reştoziya perwane gezt (kizt) milkê dinê l' min kir xirab

Reştozeyê malikzirav ker kir li min cerg û hinav  
J' vê alemê girtim bi rav êxiste cergê min kilab

Êxiste ser derda birîn wek mahê new reng zer kirîn  
Dilvanî şewqa agirîn perwane me dil bû kebab

Perwanevanî agir e her dem li dorê pirpir e  
Mirin li nik wê xoştir e jê nativê lê b' ket 'itab

Xoştiviya gerden perî durdaniya ez muşterî  
Îro bo halê min girî wextê geha destî kitab

Weqtê vexwandî ew gulî ya sor kirî b' xwîna dilî  
Go ka feqîrê behdilî destûre dabît bê 'hicab

'Hîcab perde rakirin zulfên siyah (di reş) bin da der in  
Ebrû ji mahê tertir in xurşîd anî rengafitab

Xurşîd e yanî can e ev elmas e yan durdan e dev  
Min ko nîkarî wan e ev belkî hîzar reng e şebab

Belkî hîzar texlît e naz hemî zerfîşan e libas  
Girtim şihûdê çûme caz lewra perî tîn bê niqab

Min dî perî pir deng û nav solîneya rengîn û bav  
L' enya kever zulf bûn belav barîn ji wa misk û kilab

Barîn ji wa şîrînleba şehda şerab û hem neba  
Marê siyah d'gel 'eqreba geztin li min hestî û kab

Marê siyah ebter kirîn b' derdê evînê zer kirîn  
Heyranî çavên reş kirîn kê dî perî reng mahitab

Min dî perî re'ina dila ta ta gulî ketne mila  
 Min gote wa dêmsorgula tirsim birêjînin 'ezab  
 Min gote wê şîrînlebê birqa vedit j' enya te bê  
 Armanc li mêlaka me bê bextê me reş ket wek xurab  
 Bextê te me dil hûr nekey me j' vê xeyalê dûr nekey  
 Memdu'hî pê rencûr nekey şahînşeha 'alîcenab

(\*) şêx Memduhî hin peyv bi du awayan nivîsandibûn, me yek xist nav kevanan.

ferhengok:  
 çingale: çengal, egrîce  
 reştoze: reşesmer  
 perwane: pelatînk, pepole, pelpelatînk  
 perwane gezt: wek pepole nima  
 kilap: qulab  
 bi rav: raw kirdin  
 mahê new: mangî nwê, meha nû  
 perwanevanî agir e: şeydayî agir û sotanewe  
 destûr: emir, izin, destîr  
 bê 'hicab: vekirî, bêperde, aşkira  
 Xurşîd: tav, hetav, roj  
 texlît: cûr, reng, awa  
 zerfîşan: rengzer, rengzêr, zêrweşan  
 niqab: perde, rûben, pêçe  
 solîn: bişkoj  
 leb: lêv  
 şehd: şeker, hingivîn  
 neba:nebat, şîrînî  
 siyah: reş  
 eqreb: dupişk  
 ebter: bê zuriyet, bê manewe  
 re'in: bejn dirêj, bala berz  
 birq: bîriqîn, teyisîn  
 xurab: qelereş, qijak  
 rencûr: nexweş, derdedar, hêlak

\*\*\*

## DILBERA QAMET ELÎF

Dilbera qamet elîf durdaneya gerden zi 'ac  
 Me li ser kel'hên spî îro tinê mayîn du maç  
 şehdeya kel'hên spî dermanê derdan e ji dil  
 Min go dê carek bixwazim ka li min naket 'ilac  
 Her dema min gote wê duba şîrîna min divêt  
 Gote min (wê digo) l' ser her du çava dê bidem bêş û xerac  
 Nazika min bi letafet xêl û perde wê hiland (vedan)  
 Wê temaşa kir birîna melhemê tê girtî sac  
 Ser ji nû xunçeleba baxê binefşa l' me vekir  
 Dil kire rengkiz ji 'işqê sorgula mil dane tac  
 Ev dilê hoy reş û tarî wê kire (l' me kire) find û beyan  
 Der nikarî b' rewşena xo hilgirin lê şeş sirac  
 Dilbera min we'ede da min dê (ku) mecazê heq biket  
 Ay (Oy) dilo rabe tu şa be serwerê jîn kir rewac  
 Sed hizar bar şa kirim îro ji Belqîsa perî  
 Çend xeber dan wê digel min daîne bê ser dîbac  
 Me go Dilber ev çi hal bû (çi bû) qed xoşiyek me j' te nedî  
 Jiyek e bûrî bi xema (wiha) ma hêş ne bes in ev kilac  
 Dil di kovana te cana can bûye hestî û rah  
 Lew dinalim ez ji 'işqê mame bê serkar û bac  
 Tu dizanî di dinê bo teriebal û bende im  
 Yarpêrêş im me di piştê bestine zunnar û xac  
 Min digel şahê cihan soz û qerar we'ede kir  
 Ta hebim her bende bim, fermangeha te b'kem kirac

Ferwera tu l' ser me danî dê bikem tac (ferwe) û xelat  
Da li bin emrê tu rwînim her wekî sêhwan (siyewan) û tac

Koleyî bê qeyd û şert zanim ku Memdu'h e jidil  
'Umrek e beyhûde bir Exlatî lew poşman e qac

-----  
ferhengok::

durdane: didan dur, diran dur

'ac: hestiyê didanê filan

kelh: rû, dêm, sîma

duba: şîre, şerbet

xunce: bişkoj

xunceleb: lêvbişkoj

rengkiz: lawaz, zeîf

find: mûmik, çira

beyan: ron, ronahî

rewac: bi rew

bar: car, keret

daîn: deyndar, qerzdar

rah: rih, ra, reh

bende: 'ebd, xulam

zunnar: gerdeniya ku file dixin gerdan xwe

bestin: girêdan

kirac: fermanber

ferwer: ferman, emir

kole: bende, 'ebd

bêhûde: bêşûd, bezaye, bêfeyde

\*\*\*

## ESMERÊ<sup>(\*)</sup>

Esmerê serdarê canan, xal û xet miskê te ter  
Ziyareta her du reqîban, her wekî Eswed 'Hecer

Ziyareta zulfan û xalan wacib e yan muste'heb  
Ez dibêw ewla û e'hsen nezer e enya kever

Nezer ji bo min 'helal e fetwa tu'hfe û menhecî  
Belkî merwa sunneten min el Nebî (bîl Nebî) keyrel beşer

Wer temaşa nûn û dala, kefte bin cotê hîlala  
'Eqrebê l' ser mahê bala din kirev zîr û zeber

Ez dema çûma seraê nê şekir reqs semaê  
Go feqîr werne lîqaê xecîl im tîr çûn ciger

Tîrek dema j' bala verist cerg û hinav l' min girt û gest  
Bê ageh im dil maye mest firyad û fixan in ji ber

Firyad li min bûne hizar marek mi dî jê hate xwar  
Xwîna dilê min girt û xwar 'heta ku Selma hate der

Ma hebûn Selwa û Selma şubhetê ya min di bal  
Xet ji misk û lebşeker cebhet qemer 'eqreb li ser

Xal û xet katib ji nû 'îrab li ser damdam veda  
Agirê 'îşqê ('îşqa) me hilbû dil ji Memdu'h bû du kher(\*\*)

-----  
(\* ) Li gor ku şêx Memdu'h bixwe gotiye, ev helbesta wî ya pêşî ye û di 17 saliya xwe de nivîsandiye.

(\*\* ) Ev awayê nivîsandinê ji bo zelalkirina wateya peyvê hatiye nivîsandin. Neku "kh" wek herfek serbixwe hatiye bikaranîn.

ferhengok:

xal: nîşan

xet: birû, ebrû

misk: bêhna xweş, ji navika xezala dianîn der

miskê teter: bêhna xweş a navçeya Teter

nûn û dal: rex û dorên çavan

din: dinya

zîr û zeber: jêr û jor

sera: qesr, koşk

\*\*\*

## TIRSA XUDAYÎ

Xo j' vê xewê hişyar bike pembwî j' guhêt xo bîna der  
Daxwazî xelqê zû bidey hêştâ negotî yek du ser

Dolab û çerxa vê dinê sed sed wekî min hatne ser  
Ew jî bin axahî mirin, bêdeng û dûman bêxeber

Ma çêdibît her ho biçît ev lewleb û çerxa dinê (ron)  
Roja li min bêtin ecel (mirin) j' difna me dê înite der

Heçya me gotî û me kirî ew dê li nav çavêt me det  
Rûreşiya min wê demê ez dê çi kem çi b' deme ber

Çi b' deme ber rûyê siyah (di reş) l' barîgeha wî 'hakimî  
Ew mewqîfê hindê giran tirsê dilê min kir du kher

Tirsa me j' wî 'hakimî ew bêjte min ey bed'emel  
Hinde xirabî te kirin kanê te qencî bîne der

Qencî ma kanê danme ber sed ah û kovan û keser  
şermende im fêhêt û zer xûlî l' serê min toz û ger

Xûlî l' serê min sed hizar 'emrê me çû bê karûbar  
Willah ji wî bûm şermizar sermayê min tev bûne şer

Sermayê min bûne gunah faydê li min bû rûsiyah  
Ez dê çi bêjim padişah b' ezmanê lal rengê di zer

B' ezmanê lal b' çavên di şor barê giran b' kotek û zor  
Çawa li nik wî bim 'huzûr şermende im willah ji ber

şermînde im bêhed gelek gunah li ser min bûn xelek  
Heta l' me wergêra felek tirsim cihê min bît seqer

Eger cihê min ew bîtin rengê li me dê zer bîtin  
Xûlî l' serê me wer bitin daxên me tev dibin keser

Daxên me dê bin ah û nal hîvya min Rehman Zul Celal  
Çend kalûpîr qencên delal belkî li min ew bêne der

Belkî ku hîvya min bikin barîgeha şahê mezin  
Aza biket min wî demî bêjît li te ev bûn sifir

Bêjît me tu aza kirî bo xatira Pêxemberî  
Tu jî fîdaê wî serî here tu bûye mu'teber

Here bigehe wa kesa ta'et kirî sub'h û mesa  
Mîn tu nivîsî her husa Exlatî bûye kulbiser

-----

Ferhengok::

siyah: reş

barîgeh: baregah

bed'emel: xirabkar, gunehkar, nezan, tawanbar

şermende: şermizar, şermîn, xecalet

toz û ger. toz û xol, tep û toz

sermaye: perê neqîd, reismal, kapîtal

seqer: cihek e li dojhê

m'uteber: kesê ku rêz bo bê girtin, rêzdar, birwa

\*\*\*

## LALEŞÎN<sup>(\*)</sup>

Ez çûme Laleşînê nav Elkî û Bilbêsa  
Mîn dî li wê ciwanek wek fenerê 'teyîsa

şenge şîrîn û nazik xunçeleba pelazik  
Derhal me can bû gazik j' derdê evînê dîsa

Mîn gote wê tu rind î şengeşîrîn û qend î  
L' ber Katoyî bilind î wek Torê Nebî Mûsa

Go ez şîrîn şepal im bi qed û xet û xal im  
Kurdistana delal im keftîme destê pîsa

Keftîme dest nezana dwîr bûm ji xwindevana  
Weyla l' me bêxudana lewra ku mame husa

Lewra ku ez dibêjim hoy bargiran û gêj im  
Rond'kê d' xwînê dirêjim bo Hemkî û Bilbêsa

Bo Hemkiya dinalim hindî b' xem û xeyal im  
Kesek ne pirsî l' 'halim bûm hevgirê kabîsa

Bûm hevgirê neyara dwîr bûm ji dost û yara  
Dilxoş nabim çi cara ez dame bênamîsa

Ez kaniya mêra bûm destgirtiya şêra bûm  
Xoştiviya kurda bûm beyhûde dame pîsa

Hindî me go hewar e yê ez birîm neyar e  
Jîna me sar û bar e kesek li min ne pirsî

Kesê ji we negotî şehzade me firotî  
Ya keftye destê kotî lazim nemînît husa

Lazim li wê bipirsîn bo çî ma em bi tirs în  
Pêxas û tazî û bîrs în can bo mirnê me rêsa

Me ev cane nevêtin da dilbera me bêtin  
Serbest dîsa b'gerêtin l' nav Batî û Pîrosa

Nav Batuyê di Jêrî tu b'nêre derê zêrî  
Bo çî ma tu ne mêr î te ez dame b' du kîsa

Te dame yê biyanî serşor kirin xuyanî  
B' destê te ma gavanî gêlme te kir telîsa

Gêlmexur î û jar î pêxas ketye nizarî  
Bo çî ma tu dewar î piştî d'kêşî b' werîsa

Piştî d'kêşî bi penc î hinde bi te'eb û renc î  
Diyar e ne mêrek qenc î yara te girt (bir) ramîsa

Yara te girtî kanê neyar (xelq) pê dîkin seyranê  
Tu maye l' vê kolanê berê te ma li kîsa

Bila tu evro mêr bay xudan xencer û kêr bay  
Nav dijmina wek şêr bay te bi kurdî b'nivîsa

Te b' kurdî ez bixwandam da l' ber te ez rawestbam  
Me j' dil gotba te estam dijmin revîn çûn lîsa

Dijmin revîn j' wulatî j' tîrsa şêrê nwî hatî  
Bo serbestî l' Xelatî newbet çû j' destê pîsa.

-----  
(\* Hêja Nebî Bal ku bixwe xelkê Beytşebabê (Elkehê) ye û hîn di zaroktiya xwe de şêx dîtîye, ji babê xwe 'Emerê 'Hacî û ji xalê Ünîsê Simaîl yê ku şêx li mala wî dima, weha bihîstîye: Dema şêx Memdu'h Birîfkanî di salên 1950 yan heya 1970 yan dihate bajarê Beytşebabê wê demê hijmareke mezin ya eskerên tîrkan li bajarê Beytşebabê hebûn. Ji ber hindê û ji ber qedexebûna ku şêx û mela wacib û erkên ayînî bi cih bînin û li ser mirîdên xwe bigerin, şêx nedihat bajarî bixwe. Lê diçû nav zozanên vî bajarî yên ku li hember çiyayê Katoyî ne. Li wan zozanan kaniyek pir xweş ji kaniyan li wê derê hebû. Êdî li ser

pišta hespî digel mezinên Elkiyan nêzîkî wê kaniyê dibûn. Wê demê mezinên Elkiyan gotine şêxî: şêxê min ma tu dikarî helbestekê a niha ji me re bêjî? Her di wî demî de keçek gozkek avê li ser milî dihat kaniyê. şêxî ciwaniya vê dîmenê û bindestiya Kurdistanê bi hev re girêda û ev helbasta Laleşîn rist. Jixwe şêx Memdu'h Birîfkanî gelek cara şiyar û alimtiya xwe ya olî bi riya helbestên xwe yên welatparêzî ji bo hişyarkirina hesta netewayetî ya gelê kurd bi kar dihanî. Ew nimûneyekê herî hêja yê şêxên kurd bû ku şextiya xwe heta roja mirina xwe jî di riya kurd û Kurdistanê de ji bo bilindkirina hestê kurdayetiyê û nehêlana bindestiyê bi kar anî. Ev helbest di 05.07.1957 ê li zozanên Elkiya vehandiye.

-----  
Fehengok

Laleşîn: zozanên elkiyan

Bilbês: gundekî mezin ê Elkehê

Fener: çira, şale

Teyisîn: biriqîn, edrawşaw

Rind: ciwan, xweşik, spehî

Pelazik: navê kulîlkekê ye, li zozanan şîn dibe

Kato: li devera Elkehê çiyayekî bilind.

Torê Nebî Musa: Çiyayê Torê Sina ku dikeve Misrê

Batî û Pîrosa: Du eşîrên kurdan li Kurdistana bakur

Hevgir: hogir, dost, hawrê

Kofî: pîs, çepel

Gêlme: xwarina şivan û gavana

Estam: giran, dijwar

\*\*\*

## Pîreqorê

Pîreqorê ez 'helandim l' me firandin 'eql û hoş  
'Emr û jî beyhûde bûrîn her wekî avên di boş

Ev e bîst sal e dibêem evro sibe dê gehmê  
Her bi vê tas û hemamê wê l' me bûrîn şev û roş

Her dema pirsam ji wê go ez tamamî ya te me  
Mîn nezanî rengserab e çend biçim dê bîte boş

Yan wekî jinka durû ye her kesek tê digehît  
Her bo wê mal e û nizanît bo hemiyar berdaye koş

Pîreqora sed hizar salên berê îro me dî  
Wê b' libasê kesk û sor dil j' ebleha înyê coş

Gote min tu b'nêre min ev xeml û şahî min hene (bo te ne)  
Mîn go dê zwî paş keve ey kevneqora rengbeşûş

Em ji mêje te dinasîn tu ew î pûşta berê  
Te bi wa hîle w hewala sed wekî min kirne poş

Te divêt da me l' hizûra wî şehî rûreş bikey  
Daku ez her dem bibêjim wey li min halê nexoş

Mîn ji ixbara dizanî kes bi te xoş nabitin  
Kanê ew şah û emîrên te kirîne ax û poş

Te bi wan sozên direw sed kes li ser rêkê birin  
Ma tu hîvî j' min dikey ez jî wek wa bibme poşman

Mîn di destî da heye zincîreka pak û temîz  
Ew dikêşî min ji te ey leşmirara rûfiroş

Hîmmeta pîrê terîqê ger li ser Memdu'h bitin  
Dê bi Exlatî gehînît mededa şahê li soş.

Ferhengok::

Pîreqor: jê pîreqorê mebest dinya ye.

Bêhûde: bêşûd

Serab: tirawîlke, cihê şînkayî û avî ê ku li biyabanê li ber çavê mirov xuya dike.

Ebleh: gemşo, gemje, kawî, bêaqil.

Coş: şadî û xweşî

\*\*\*

## NÛNA TEVÎ

Nûna tevî qed xemilî re'na dilî dildar e xet  
Wê l' ser kulûmet sorgulî şehdane û d' gulzar e xet

şehdane û d'emberfeş e solîneya sîmageş e  
Yan jî gulaba bînxeş e l' nav sumbila surdar e xet

Surdar e ev re' na dila ta ta gulî ketne mila  
Ez çûm silava sorgula surperiya surdar e xet

Surperiya min serwer e durdaneya gerdenzer e  
Çavbeleka ebrûter e nazîqêda nazdar e xet

Nazîqêda gerden bimûr wê ji badiya rex lê di sor  
Mey da me û bêdest û dor mest im bi wê diljar e xet

Mest im bi wê şehda zelal lêvên di sor l' min (wê) kirne xal  
Rengê spî şîklê delal serxoş kirim xemar e xet

Serxoş kirim durdaneyê bi şehda şîrîn dûbeyê  
Mîna tewafa Ke'be' geryam li dor heft care xet

Geryam li dora Zemzemê dema ('hîna) gehame kulûmê  
Sucde me bir l' ber wê demê berê reş î guldar e xet

Berî reş î rengenwer î b' dest û devî çûme serî  
Hadir ewê dil j' me birî evro li min xwîndar e xet

Xwîndar e yanî dilber e têrxuriya rengesmer e  
Lewra me ru'h danî sere da kes nebêt bêyar e xet

Da kes nebêt bêyar e naz ew serşirîna serfiraz  
Min her tinê ew bû miraz canî bide yekcare xet

Min dane wê ev ru'h û dil wek 'endelîbê dilbikul  
Hêştta ji min ew maye sil gotî ji te dilsar e xet

Dilsar e her ho ba diket da min b' evîne jar biket  
Daku dilê min sar biket tecrîbîya xwîndkar e xet

Tecrîbîya yar birîjît min jî bi destê xo b' kujît  
Nabît ji wê dil bihîjît taku hebim her yar e xet

Taku hebim min ew şirîn êş û bela şahî û girîn  
J' xo ra me kirbû xemrevîn, willah me ew hemwar e xet

Hemwar e min ew serşepal nazikqeda ebrûhîlal (delal)  
Memdu'hî ron kir pê xeyal Exlatî lew diljar e xet.

-----  
Ferhengok:  
Kulûmet: hinarok, lam, gûna, gep  
Serwer: serdar  
Bade: vîn, şerab, mey  
Têrxur: têrronahî, rengesmer  
Hadir: yekser, demildest, di gavê da

\*\*\*

## KURDISTAN

Me Kurdistan gelek d'vêtin çî ca terka wê em nakeyn  
Eger bîva me lê bêtin em ê tolên kevin rakeyn

Eger nemrîn em ê bînîn kul û derdên xo derînîn  
Digel dijmin b' kul û kîn î çî ya (ewa) bûrî ji bîr nakeyn

Ji bîr nakeyn ewa bûrî wekî dijmin dikir zorî  
Eger canî bikeyn gorî ji nû paş bendeê nakeyn

Ji nû paş ev rih û cane me dest jê şwîşt û berdane  
Li ser dijmin me ferman e heya tolên kevin rakeyn

Heya tolên hizar salî nehêlîn bo kesê xalî  
Xo qurtal keyn ji vî halî neyara j' vî cihî rakeyn

Neyarên xo em ê înin wekî twîla rezîl xwînîn  
B' şeqa ji qel'a derînîn bi zincîra girên dakeyn

Bi zincîran û sencûra em ê kêşîne ser gora  
Paqij keyn van rex û dora serê xo l' nav dinê rakeyn

Serê xo dê bikeyn bala vejînîn Rustem û Zala  
Vekeyn tolên di 'Ebdala j' nû kuştîyên berê rakeyn

J' nû kuştîyên berê (Zîla) xazîn bo Hîzanî (Barzanî) necm û taz î  
Lewa hinde b' kul û gaz î çî ca ahan ji bîr nakeyn

Çî ca ahên xo nahêlîn roja cengê find û fêl î  
Em ê dîsa dinê şêlîn heta kurda ji dil şa keyn



Heta kurda bikeyn serwer li ser 'alem bikeyn kîşwer  
Li dîwanê bikeyn dilber ji rojê beyreqa rakeyn

Ji rojê beyreqa mêra hejînî l' ser serê şêra  
Bikeyn keyf û sema vê ra Hîzan û Dêrsimî şa keyn

Hîzan û Dêrsimî bînîn bi zêravê bireşînîn  
Dîsa Paloyî bixemlînîn li wî kesk û zera rakeyn

Li wî kesk û zer û sora bikeyn rewşen li sînora  
Veşînîn dilmirî û kora bi serbestî xo aza keyn

Bi serbestî, bi azadî, bi dilxoşî, bi dilşadî(\*)  
Werin kirmancê Exlatî da Kurdistanê ava keyn

-----  
(\* ) şêx Memduh ev her du rêz bi du awayan nîvisandine. Awayên din weha ye:

"Bi serbestî, bi azadî gelî kirmancên Exlatî (dilpatî)  
Bi dilxoşî, bi dilşadî werin da wanî ava keyn".

Ferhengok::

Bîv: derfet, firset, keys

Bende: ebd, kole

Qurtal: xilas kirî, azad

twîl, tol: kûçik, seg, tole

Find û fêl: hîle, firt û fêl, xapînok

Kîşwer: wulat, niştiman

Beyraq: ala, perçem

\*\*\*

## HEWAR

Hey hewar hewar hewar dinya hemî l' me bû neyar  
Rabne ser xo gelî kurda dijmina goştê me xwar

şîn û bangîn û hewar e qîr û gazî têt j' wilat  
Dad û fîxanên me kurda wê l' me bûne sed hizar<sup>(1)</sup>

Hinde jarî û bendewarî b' ser me ra bûrîn bira  
Ma ne bes e gelî kurda ev jiyana sar û bar

Bo çî ma em ne mirov in xo ne em dar û ber in  
Heq me nîne di jiyane ey bêmirwet ey neyar<sup>(2)</sup>

Hinde sal e em dibêjîn 'ereb û tirk û 'ecem<sup>(3)</sup>  
Ew digel ême neyar in bo neyara pişt û kar

Bîst û pênc milyon didêr in em hemî kurd in xurî  
Ma ne 'ar e em bimînîn l' bin tep û destên neyar

Pehlewan û genc bila bèn şêremêr dê werne pêş  
Dijminên t' hat in dîlanê tîleşor kanê hewar

Misriya dîsa b'hejînin va kula derman bikin  
Canê dijmina bisojin bikelihên wek jehrê mar

Hwîn hemî pêk ve b' tebayî dest bidin darê çekan  
Dijmina j' erdê xo rakin jîn bêxwîn nabîte yar

Qeyrekê bidne girê Nehrî û Palo dê vejîn<sup>(4)</sup>  
Dêrsim û Barzanî vêk ra j' gelî Zîla bêne xwar<sup>(5)</sup>

Serbixo azadî rûnin l' vî cihî serbest bijîn<sup>(6)</sup>  
L' ser rû û difna neyara dane wanî xundekar

Alayê rengîn hilînin vî cihî pê şah bikin  
Kesk û sora lê b' hejînin rojî Newroz e bihar

Roj l' bîraqê helînin ron bikin dax û çîyan<sup>(7)</sup>  
Daku Exlatî bijîtin serbixo, dilşad û yar<sup>(8)</sup>

-----  
şêx Memdu'h Birîfkanî bixwe ev rêz bi du awayan nivîsandine. Awayê din eve ye:

- 1- Dijmina girtî cihê me hey hewar hewar hewar
- 2- Kanê heqê me d' jîyanê ey bêmirwet, ey neyar
- 3- Kurdino hwîn qenc bizanin ereb û tirk û ecem
- 4- Qeyrekê b' dene girê Hîzanî dîsa da vebijîn
- 5- Dêrsim û Paloyî vêk ra j' gelî Zîlan bêne xwar
- 6- Serbixo azadî rûnin l' vî cihî serbest bibin
- 7- Roj l' gulistanê belav bît (bîtin) tav bidet rewşa cihan (serê çîyan)
- 8- Da ji nû Exlatî rabbit pir kes û dilşad û yar

Ferhengok:

Qeyrekê: bîstekê, demekê, piçekê

Girê: girêk, destan bidin hev

Vejîn: ji nû ve jîyan, dîsa zindî bûn

Dax: çiya, ko, kêw

\*\*\*

## GELÎ KURDA

Rabne ser xo gelî kurdan hwîn b' tebayî can û pîr  
Dijmina j' erdê xo raken da bijîn em wek wezîr

Me nevêtin ev jiyana bêcih û ala û mîr  
Roja cenga me û tirka me çi ca naçît ji bîr<sup>(1)</sup>

Piştî jarî û bendewarî lê me dîtin sed hizar<sup>(2)</sup>  
Ma ne bes e gelî kurda l' bin tep û destên neyar

Yan çawa em dê ji bîr keyn ya ku me j' destî dixwar<sup>(3)</sup>  
Me hemî pêk ve nivîsîn b' xwîna kuştîyên di zar<sup>(4)</sup>

Her ji Bakû ta ku şîrazê hemî kurd in xurî  
Pehlewan in serbilind in dest bijar in bo şerî

Û ji bo te dê fîda ken yek bi yek can û serî  
B' serfirazî dê helînin alayê roj li zerî<sup>(5)</sup>

Me divêtin wekî mêra serbixo, aza bijîn  
J' nûke pê ve bo kesê qet çi temenna nakêşîn

Yan wekî ava buharê dê l' cihê xwîne rijîn  
Her wekî şêr û pilinga em li cengê nahejîn<sup>(6)</sup>

Wê li ser me bûne yekdil 'ereb û tirk û 'ecem  
Hilfa Bexdayê girêda Exlatî ruh da ji xem

Kurdistan kes nema carek ku pirsê jê bikem  
Rabne ser xo gelî kurda çar rexa lê bikne dem<sup>(7)</sup>

-----  
şêx Memdu' hî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandiye:

1- Ya ku (çendî) bûrî û hatî ser me hemî tev têtê bîr

2- şêx Memdu' hî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandiye:

Bes e jarî û bendewarî lê me difîn sed hizar

3- şêx Memdu' hî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandiye:

Ma çawa em dê ji bîr keyn ya ku me j' destî dixar

4- şêx Memdu' hî li ber van her du rêzan ev rêz jî li rexê kaxezê nivîsandiye:

Her ji roja lu li me sotin jin û zar û diyar

5- şêx Memdu' hî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandiye:

Kurdistanê (Narfînê pê ) bixemlînin da zava bête derê

6- Dê bixwazîn kevnetola yan ku mêra dê kujîn

7- Nevrozê dîsa vejînin (Misriya dîsa b' hejînin) da bizanin kurd in em

Ferhengok:

Tebayî: tevayî, bi hev re, pêk ve

Bakû: Paytxtê Azerbêcanê

şîraz: Bajarekî Kurdîstana Îranê

\*\*\*

## DERDÊ GIRAN

Cana çî b'kem derdê giran e me nema dil

Sotim j' fîraqa te hizar daxê l' ser dil

Evroke şîrînê kul û da'x dane birînê

Dûr e bigehînê lew kuncyê da dil

Dil da te me cana ser bo te me rana

Ger ku te nebînim reşba digrît dil

Xweziya dem û gava yar hatî silava

Dost keftiye dava di gel min bûye hevdi

Ravek me digel da sîmayê şefeq da

Wê j' rojê sebeq da hadir l' me reva dil

şehda di şîrîna dermanê birîna

Mehtu me derîna êş û kelema dil

Roja li zuhaê destê me gihaê

Xala li sîmaê der kir elema dil

Ferhengok::

Kunc: goşe, quncik, koşe

Hevdil: dildost, hawdil, dost

\*\*\*

## DA BIÇÎNE LALEŞÎNÊ

Rabe da ez tu bi hev ra biçîne Laleşînê  
Kul û kovana bihêlîn nwî vekeyn j' dil evînê

Mêrg û çîmen xemilîn sosin û sumbil ketinê<sup>(1)</sup>  
Terzina girtî xunav û com û kanî ketinê

Sorgulên simaê rengîn girtine rengê b'xwînê<sup>(2)</sup>  
Nêrgizên ser di giran lê d'kene bawêşînê<sup>(3)</sup>

'Endelîb dîsa dixwînin bilbilê l' ser hêlînê  
Kevîn kefte Katoyî û kewderî hatne şûnê

Çîmenên nazik û ter 'hûr û perî daniştinê<sup>(4)</sup>  
şahiya l' yazdeyî adarê şox û şeng wê t' bezinê<sup>(5)</sup>

Nazika xemle girêdan raserî Dêrahinê<sup>(6)</sup>  
Kofî xar kir tu binê bejn û bala şîrînê

Ask û mam û pez û kovî qul bi qul wê d' girtinê<sup>(7)</sup>  
Xuşî ya ketye welatî rabe da em biçînê

Exlatî xwast ji Xudê rojeka husa d'înê  
Newrozê sala me nwî kir b'xêr û şahî b'gehînê

-----  
şêx Memdu'hî ev rez bi vî awayî jî nivîsandiye:

- 1- Mêrg û çîmen xemilîn, solîne hatne derînê
- 2- Sorgul û alal û beybîn rêz bi rêz wê d' ketinê
- Sorgul û alal û beybîn şox ûşeng rabezînê
- 3- Nêrgizên nazik û ter lê d'kene bawêşînê
- 4- Çîmenên nazik û ter surperî wê d' rûniştinê
- 5- Spêdeya l' yazdeyî adarê şox û şeng wê t' bezinê
- 6- Nazika poşî girêdan kesk û sor d' enya duta kir
- 7- şev ro mam pez û kovî qul bi qul wê d' girtinê

Ferhengok:

Kevîn: perçeberfên di destpêka biharê de li reşahiyê mane, hîn neheliyane

Kewderî: kewgir, nêçîrvanên kewa

Ask: xezal

Mam: karika xezala, karmamiz

\*\*\*

## HILO RABIN

Hilo rabin gelî kurda bi can û mal bi 'ehd û soz<sup>(1)</sup>  
Binêrin faris û tirka l' me napirsin'ereb û rûs<sup>(2)</sup>

Ji tirka ya me bû erd û hemî rêze hemî Tersûs  
Hekarî û Tuncelî û Mereş Kemîşxane heta Toros

Hinek Qeyserî û Sêwas û hinek Toqat hinek Mêrsîn  
Exne û Dêrsim û 'Entab, Qerehisar û Artwîn

Bîngol û şîrnex û Cizîrê û Exlat û Mafarqîn  
Sêwreg û Wêranşehir û Batman û Dara û Misêbîn

Melatya, El'ezîz, Xerpût, Giresun û Adîyeman  
Qerekose û Trebzon û Bazîd û Qers û Erdûxan

Urfa û Sêrt û Erzerom, Bidlîs û Mûş û Erzincan  
Îslahiye û Îskenderûn, Diyarbekir, Mêrdîn û Wan

Eve hemî kurd bûn xurî zarî di kirmancî dixwand  
Man bêxudan û bêxweyî lewra ku tirka j' me revand

Exlatî hindî ba dikir tirka cihê me j' xu kirand  
Kesê çî pisyar lê nekir derd û xema dil peritand

-----  
şêx Memdu'hî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandiye:

- 1-Hewar e l' min gelî kurda hilo (werin) rabin bi can û soz
- 2- Binêrin faris û tirka l' me bûn dijmin 'ereb û rûs

\*\*\*

## JI 'ÎRAQÊ ME DIVÊT

J' 'Îraqê me divêt Xaneqîn, Qizilrubat û Mendelî  
Hevlêr, Koh û Çemçemal, Silêmanî û Hemam'elî

şingar û Akr û Ênsifin, Sersing û Altunkoprî  
Til'efer û Rewandiz in û Daqoq û Toz û Kufrî

Kerkûk, Amêdî û Dihok, Mûsil û Zaxo Pênciwîn  
'Eynzal û Bedre û Ranye, şeqlava û Selah'eddîn

Mexmûr, şirgat û şehriban, Bedre û Helebçe û Ze'feran  
Eve hemî kurd in belê man bêtebayî û bêxudan<sup>(1)</sup>

Belkî du milyon tê hene Exlatî ho texmîn dikir<sup>(2)</sup>  
Bo dijmina xoş cenane kesê guhdarya me nekîr<sup>(3)</sup>

-----  
şêx Memduh Birîfkanî ev rêzên helbestê bi awayên din jî nivîsandine:  
1- Eve hemî kurd in belê heyfa me têt man bêxudan  
2- hemî (pêkve, ew jî , vêkra) du milyon tê hene Exlatî ho texmîn dikir  
2- Bi dijmina xoş cenane hindî me got fayde nekîr

**şêx Memdu'hî di dîwana xwe ya destnivîs de gava helbestek bi dawî tê,  
helbesta din ya li pey tê bi gotina "Welehû ey'zen" – hê jî hene- xuya kiriye.  
Lê piştî vê helbestê ev gotin nenivîsandiye û yekser ev çar rêzên din li binî  
nivîsandine:**

Kurdistan çend xoş e wek ru'h û can e  
Hemî mêrg û çîmen in baxê cenane  
Pêk ve deşt û çiyayî cihê şêran e  
Pêk ve bax û çîmenin cihê mêran e

\*\*\*

**şanek:** Dîwana şêx Memdu'h Birîfkanî ya destnivîs bi helbestên Melayê Cizîrî  
dest pê dike. Piştî van helbestan di rûpelekî bi serê xwe de şêx Memdu'hî navên hin  
bajarên Kurdistanê digel ravekên wan nivîsandine. Em wî rûpelê wekî ku wî  
nivîsandiye çap dikin:

Ermîniye: Uratrî. Uruartî  
Exne: Edene. Ezene. Kilîkya  
Akre: 'Eqre  
Amêdî: 'Umadiye  
Beytelşebab: Elkî. Elqî  
Ezîrbêcan: Midya el Su'xre  
Erbîl: Hewlêr  
Behdînan: Edyabîn  
Urfa: 'Urfa. Ruha. Edsa  
Sablax: Sawcîlaq  
'Helebçe: Sar'xon. Karşarokîn  
'Hilwan: Halman. Serpil-Reis elcebel  
Tor 'Abidîn: Kîmoxî  
Diyarbakir: Diyarbeqir. Amed  
şehrezûr el Qedîm: Bisîntepe. Tilbisin  
Wan: Tospasî. Tospas  
Zêbarî: Sûbarî. Sûbarû. Hanîgalbat  
Hemedan: Hekmitan. Aqbatan  
Mizûrî: Misûrî. Mûsrî  
Hewreman: Narman  
Miyafarqîn: Martîropolis. Li gor gotina ev navê dawî, navê Mûşa niha ye.  
Nehrî: Naîrî. Nîrî. şemdînan. Aram. Naharam. Naharî

## BEHDÎNAN

Ez kurd im kurdê çiyani im<sup>(1)</sup>  
Serbilindê Behdînan im  
Xudê zanîti ji bo kurda  
Bi ah û derd û kovan im<sup>(2)</sup>

Heta kengî gelî kurda  
Dimînî bêser û sewda<sup>(3)</sup>  
Çira bêsuc dikujî kurda  
Dibêjî ez wilatvan im<sup>(4)</sup>

Eger kurd î tu rastgo yî  
Çira dijminê xo b' xo yî  
Tu dê hêlî ewa çuyî  
Dibêjî ez pêşîman im<sup>(5)</sup>

Ne ez tirk im, ne nazî me  
Ne îngilîz û emrîkî me  
Ne ez be'esî û şiyû'î me  
Belê kurdek bisilman im

Belê kurd im bi ru'h û can  
Bi ehd û bawerî û îman  
Dinalim ez bo Kurdistan  
Xerîkî derdê kurdan im

Çi dilvan im ji va derda<sup>(6)</sup>  
Çira bêsuc dikujî kurda  
Neyarên me li va erda  
Dibêt ez şahê kurdan im

Li Kurdistanê rengcûrî<sup>(7)</sup>  
Bi xo bi xo tinê tu xoşmêr î  
Me dît dijmin j' te ra bûrî  
Te negot mêrê meydan im.

Bo nekey li cihên jorî  
B'xo bi xoy tu xoşmêr î  
Çira xo te nekir gorî  
Wekî tirk hatye Hîzanim

Heta mirnê dikim gazî  
Dinalim ez ji nû tazî  
Nizanim ka tu çi d'xwazî  
Lewa hinde î perîşan im

Her ro tîm ez dinalînim  
Birîndar im cigêrxwîn im  
Wekî mêra te nabînim  
Dibêjî ez wilatvan im

Dilovan im me tu nasî  
Çira kurdo belengaz î  
Piyawekê keserdar î  
Tu napirsî li kovanim

Eger rast î tu camêr î  
Wilatvan î, xudanxêr î  
Xo bo kurda bikey gorî,  
Dibêjî ez wilatvan im

Lewa hinde dinalînim  
Birîndar im, cigerxwîn im  
Çi sinahya ez nabînim  
Pê ron bikim dil û canim

Pê ronî bikim canê xwe  
Rûreş bikim neyarê xwe  
Memdu'h belav ket derdê xwe  
Exlatîyê pir beyan im

-----  
şêx memduh ez rêz bi awayên din jî nivîsandine:

- 1- Ez kurd im, kurd û xan im
- 2- Heta mirnê çî dilvan im
- 3- Tu kurd î bêser û sewda
- 4- Dibêjî ez ji kurdan im
- 5- Dibêjî dostê hemyan im
- 6- Çî dilvan im gelî kurda
- 7- L' Kurdistana cihê zêrî

\*\*\*

## 'TEMEFA

'Temefa leb ji şefa bo çî me rencîne dikey  
Me emeldar e ji te 'eqsê çira d'gel me dikey

'Temefa mêze bike kanê gunaha me çî ye  
Me bi vî rengî disojî û me pir gende dikey

'Temefa min go perî bêt û birîna me veket  
Dê bo 'halê me girî yan dê 'îlaca me bikey

'Temefa dil me bi te îro kirev bend û heval  
Ez bi ru'hê l' te dinêrim tu çira ho l' me dikey

'Temefa min dibîhî bo çî li te mêze dikem<sup>(1)</sup>  
Da li 'halê me bipirsî kul û derda tu vekey

'Temefa min ji kula girtî gula rengîn û bav  
Me jidil her tu 'hebandî bo çî naza l' me dikey

'Temefa em ji xema eşqa te pir dilkeser î  
Me tu girtî dilê qenc e tu me bêçare nekey

'Temefa bextê te me min b' vî derdî nekujî  
Tu çî cara me nehêlî me ji xewa şîrîn venekey

'Temefa b' 'işq û evîn min tu 'hebandî di dinê  
Wekû hîrik l' te dinêrim tu yî lîba l' me dikey<sup>(2)</sup>

'Temefa ah 'Tmefa ah 'Temefa ah 'Temefa  
Te 'îlaca me nekir bo çî birîna l' me dikey

'Temefa xo bi zeriye şengeşîrîn dost û heval  
Ru'h bi yekcarî te dîsa dê mirim ger me nekîy

'Temefa b'sond û qesem wek te me navên çî perfî  
Me miraz e 'Temefa canê tu çava l' me vekey

'Temefa bê te biha dê bikirim b' ru'h û cesed  
Ev e soza me digel te ko b' gotina me bikey

'Temefa bi ehd û wefa ez çî ca terka te nekem  
Tu Xudê key 'temefa bêje min ka dê tu çî key

'Temefa kuloma spî te l' me kire dan û dikak  
Me nezanî hemî dav in dê me pê peçrîme dikey

'Temefa şukrê bike îro birîndarê te me  
Te çî bazî j' xo ra girt û bi wî ravê dikey

'Temefa hêj ez nizanim kanê fikra te çî ye  
Dê wekî ya ku me gotî ya bi 'eqsa me dikey

'Temefa bo çî te Memdu'h bi gula kuştî heval  
Ma yêkê dî heye îro ji wî çêtir tu bikey

-----  
şêx memduh ez rêz bi awayên din jî nivîsandine:

1- Temefa min dibihî hinde li te mêze dikem

2- Weku heyrok l' te dinêrim tu yî lîba l' me dikey.

Ferhengok:

Leb: lêv, dev

rencîne: nexweşî, rencandin

dibihî: dibihîst

hebandî: hezkirî

lîb: gîzî, ger, henek

hîrik: sersam

xub: baş, çak

biha: nirx, qîmet

\*\*\*

## NAZENÎN

We'ede bit paşî te cana ez çî şehyana nekem  
Ez digel kesê dî jibil te 'ehd û peymanî nekem

Piştî wa geşt û sefaya min kirî d'gel dilberê  
We'ede bit êdî nerûnim l' terzina keyfê nekem

Ma çawa dê bigirim dostî jibil te nazenîn  
Ru'h bi yekcarî me da te dil ji te qet navekem

Piştî min xwarî ji lêvên qurmizî şekr û nebat  
Ez çî cara d'gel çî cana geşt û seyrana nekem

Min li Baxî Îremê min dî li sêva ket gezo  
L' min 'heram bît (bin) paşî wa sêva gezowê 'tam nekem

Min li nav baxê gula bo ser şîrîna we'ede kir  
Paşî wan solîneya alayê rengîn bîn nekem

Kewser û ava 'heyatê me ji lêvên te vexwar  
Lew ciwan im ez di 'îşqê dest ji dostî navekem

Min li ser kuloma spî alal û sunbil bîn kirin  
Lew şevên tarî wekî rojê bi 'îşqê çêdikim

Badiya rexqurmizî da min şîrîna ser şubak  
Min ji wê mey hilmirîst lew kişwera yexme dikim

Ger weku bilbil li ser dêmê te bame sorgulê  
Her wekî rengê biharê dem bi dem da geş bikem

Ma gelo mumkin e ez carek binefşa çav bixal  
Her wekî cara bibînim dîdeya pê ron bikim



Memdu'hî can maye d'gel sewda d' serî havête dil<sup>(1)</sup>

Sotinê dabû hinava şeb û roj şînê dikem<sup>(2)</sup>

-----  
şêx Memdu'hî ev her du rêz bi awayekî din jî nivîsandine:

1-Memdu'hî dil maye d'gel sewda d' serî min da nema

Memduhî dil ma di gel te kelmeqê havête dil

2- Xo her min çav mane zil j' 'îşqa te da her ho dikem

Xo her min çav mane zil, şîna birîna xo dikem

Ferhengok:

geşt: seyran

sefa: xoşî, şadî

terzin: avzê

qurmiz: sor

kulom: hinarok, lam, guna

badî: piyale, tîrar, baye

helmirîst: mişt, mijî, alîst

yexme: talan

dîde: çav, çaw

\*\*\*

## XUTIYA MIN

Dilbirîndara şîrînê bêjne canê xutiya min

Keftîme derdê evînê remz û nazên xutiya min

Remz û nazên wê şepalê nazîkê gerdenşemalê

Çend me gotê der nihalê rabe sotim xutiya min

Rabe sorim kul û derda xoşî paşî te me berda

Ma çîqa j' 'îşqê xeber da rû neda ve (min) xutiya min

Rû neda min serşîrînê dernîkar î xemrevînê

Çend me gotê nazenînê rabe ser xo xutiya min

Rabe cana dêm ji cûrî spêde hat û şev l' me bûrî

Tu çîra dê min guhûrî bi xewa xo xutiya min

Wê xewa şîrîn zû îna çend me kir çav nehîlîna

Mam bi wa derd û birîna tengezar im xutiya min

Tengezar im bêdewa me b' derdê 'îşqê muhtela me

Mîn l' ser kuloma te dame ru'h û can e xutiya min

Ru'h û canê pir dinalim (bê'hal im) şev û roj talib wîsal im

'Aşîqê wê dêm bixal im xo ne bes e xutiya min

Xutî ya keftîye xwarê her wekî şevên biharê

Çendî min got rabe yarê şev direng e xutiya min

şev giha weqtê beyanê mam di ber benda te canê

Hindî min got sermiyanê dilbijan im xutiya min

Dilbijan im, dilbixwîn im hindê ez canê d'hejînim

Ranêbû derda b'kewînim poşîman im xutiya min

Poşiman in dil'hezîn im min gotê lêvan gezînim  
Daku canê j' xew hilfnim ranebû can xutiya min

Ranebû çendî hijandim serûpê lêk zivirandim  
'Eql û hiş her du firandim xew giran e xutiya min

Xew giran e bêxeyal e dêmdur e gerdênşemal e  
Lew xudan 'eql û kemal e serşirîn e xutiya min

Serşirîn û xembelav e xet ji misk û leşgulav e  
Rû wekî xurşîd û tav e leşîfa ye xutiya min

Leşîfa ye, şahêcan e dernîgar e alîşan e  
Dêm wekî destek (qefta) gulân e xemrevîn e xutiya min

Xemrevîn e pir binaz e sorgula baxê mecaz e  
Ru'h ji Memdu'hî bixwaze da fîda ket xutiya min

Dê fîda kem ru'h û cana bo te çend mal û cîrana  
Ger tu rabî çilexana xoşirîn û xutiya min

-----

Ferhengok

xutiya min: xoşewîsta min

mubtela: giriftar, duçar

dam: dav, daw

dermîgar: ciwan, xweşik

baxê mecaz: ciwaniya waqî'î, baxî ciwanî

çilexane: cihê îbadeta çilrojî yê ku sofî dikevinê

\*\*\*

## CANÊ CANA

Pir ji dinya te xerîb im canê cana min tu ka  
Dilkel û jar û keîb im canê cana min tu ka

Dilkel im sê sal tamam e çav li rê yara xo mame  
'Aşîqek pir mubtela me canê cana min tu ka

'Aşîq im dûr im ji ramê 'eşweyîn şirîn kelimê  
Girtî me l' vê qeyd û damê canê cana min tu ka

Girtime mame di qeyda her wekî mecnûn û şeyda  
Dil bi navê te me 'hey da canê cana min tu ka

Dilkul û jar û ze'îf im mubtele qametelîf im<sup>(1)</sup>  
Ru'h fîday şama şerîf im canê cana min tu ka

Ru'h fîday werdên bixar im kuştîyê cotên xumar im  
J' me'hbeta 'işqê dizar im canê cana min tu ka

J' me'hbet û cewra 'hebîba qehr û azara reqîba  
Zêde kir êşa xerîba canê cana min tu ka

Zêde bû cewr û cefa me (bela me) bêguman be'hra xema me  
J' yar dostan ez cida me canê cana min tu ka

Bêguman dilvanî dost im sed meqaman veguhistim  
Heta ez j' me'hwê veristim canê cana min tu ka

Min heta me'hû fena bû dil bi 'işqê mubtela bû  
Cezb û lertzîn û ta bû canê cana min tu ka

Lê (her) dema j' me'hû û fenayê geştîme 'halê beqaê  
Can û dil her du ma daê canê cana min tu ka

Can ji ber kezmên du sadan b' ser û fey'za selewatan  
Bûme me'zherê sîfatan canê cana min tu ka

Bûme me'zher bo cemalî we'hmeta cûd û wîsalî  
Dil geha nûra celalî canê cana min tu ka<sup>(2)</sup>

Dil geha keşfa şihûdê zîkr û tew'hîda sihûdê  
B' canûdil çûme sicûdê canê cana min tu ka

Can bi navê te me 'hey kir xulqê razî me di ber kir<sup>(3)</sup>  
Sed şukir mer'za li ser kir canê cana min tu ka

Sed şukir fe'zla te dîsa nûr û narî Nebî Mûsa  
Dil me Tor e bê teyîsa canê cana min tu ka<sup>(4)</sup>

Dil kete sîrra lîqaê we'hmeta 'halê beqaê  
Cinneta zewq û sefaê canê cana min tu ka

Cinneta keşfa cemalê menzîla min di xeyalê  
Hadir Exlatî fîda lê canê cana min tu ka

-----  
şêx Memdu'hî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandine:

- 1- Lew ku diljar ûzeif im, muftela qamet elîf im
- 2- Dil kete nûr û xeyalî, canê cana min tu ka
- 3- Can û dil navê te 'hey kir, qulkê razî me ber kir
- 4- Dil çî Tor e pê teyîsa canê cana min tu ka

Ferhengok

'Işwe: nazî, nazdarî, delal, be naz

Me'hu: neman, mirin

Mezherê sîfata: serkanîyên tiştên baş, serçaweyî şitên baş

Cûd û wîsal: gihiştina hev

Hadir: yekser, di gavê de, demildest

\*\*\*

## CAN KÎ VE ÇÛ

Cana min ka sebra min ka bêjne min ka can kî ve çû  
Xoşî hemî l' me kirne tah bêjne min can kî ve çû

şeva berê me û dilberê dax û keser kirne derê  
Dil ji xema safî me ma bêjne min ka can kî ve çû

Dil kuzirî j' wî agirî cerg û hinav bûne girî  
Min go hewar ez bûme bêjne min ka can kî ve çû<sup>(1)</sup>

Cana delal yara şepal 'halê me kir wek şiklê dal  
Ez çûm ji dil çav mane zil bêjna min ka can kî ve çû

L' bexçê gula l' nav simbila min dî perî r'ena dil<sup>(2)</sup>  
Keyf û sema xoş bo me ma bêjne min ka can kî ve çû

Zilfên belav lê kir gulav serxoş kirim bêxemr û av  
Dil çû ji dest ez mame mest bêje min ka can kî ve çû

Sêvên di sor l' ser textî nûr min dî li dor rey'han û cûr  
Sîne vekir min xêve kir bêjne min ka can kî ve çû<sup>(3)</sup>

Can hat bi meş wek mahê geş enya spî çavên di reş<sup>(4)</sup>  
Wek agirî dil kuzirî bêjna min ka can kî ve çû<sup>(5)</sup>

Min go eman selwa ciwan j' derd û xema min 'hal nema  
Bo te mirim nahedirim bêjne min ka can kî ve çû

Lêv girnijand ser l' min hejand dîsa ji nû dil herişand  
Dil peritî b' xo şewitî bêjne min ka can kî ve çû

Can hat bi meş wek mahê geş temaşe kir çavên di reş  
Sê car kenî dil kir xenî bêjne min ka can kî ve çû

Dil bû kherê vî agirî yar ku demê hatî birî  
şû'ele veda şewqê l' me da bêjne min ka can kî ve çû

Yar hat ji rav bû şewq û tav, mame li wê bêdeng û nav  
Zilfên belav l' min kirne dav bêjne min ka can kî ve çû

'Ebdê feqîr wê kir esîr nedihate bîr şahê kebîr  
Min go hewar çû l' min hedar bêjne min ka can kî ve çû

Zilfên belav lê kir gulav sotin li min cerg û hinav  
Cergê xirab wê kir kebab bêjne min ka can kî ve çû

Cana me hat wê kir xebat dinya li min rojê helat  
Bên jê firî dil bişkurî bêjne min ka can kî ve çû

Cerg û bez im biryan ez im lewra bira l' mirnê b' lez im  
Ez bende bûm b' xo yê te bûm bêjne min ka can kî ve çû

Dergeh vekir seyîrî me kir willah bira dil yexme kir  
Çavên belek kir me helek bêjne min ka can kî ve çû

Ew dêmperî min dî l' derî dîsa ji nû dil kuzirî  
L' min fukirî bo min girî bêjne min ka can kî ve çû

Dêmfener e go min were bêje min te çi li ber e  
B' serê te kem dê bo te kem bêjne min ka can kî ve çû

Qur'an vekir 'ehdek dikir Memdu'hî dil pê bû şukir  
'Hemd û sena bo te hena bêjne min ka can kî ve çû

-----  
(\* ) şêx Memdu'hî di orjînalê wê helbestê de pir guhertin çêkirine. Me bi vî awayî rêz kir. Lê  
xwendevanên ku bixwazin, dikarin li orjînalê wê vegerin.

şêx Memdu'hî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandine:

1- Min go hewar ez bûme dar bêjne min ka can kî ve çû

2- L' Bexçê gula l' nav sunbîla min dît perî şaha dila  
3- der me vekir min xêve kir bêjne min ka can kî ve çû  
4- can hat bi meş wek mahê geş b' dêmê spî çavên d' reş  
5- Min dî perî dil kuzirî bêjne min ka can kî ve çû

-----  
Ferhengok

Tah: nexweşî, lerz û ta

Kuzirî: kizan, kizran

Dal: pîr kirin, wek herfa (d) a erebî çemandin

Zil: zîq

Mest: jixwe çûyî, serxweş

Xêve kirin: tam kirin, nûbere kirin

Mahê geş: heyva çarderojî

Girniyand: bişkurî, bişirî

şu'ile: çira

Esîr: dîl, exsîr

Bişkurî: girniyî

Biryan: neman, nemayî, sofî, şewitî

\*\*\*

## DILBERÊ

Dil birîndar e şîrînê jar û bêmaro dilo<sup>(1)</sup>

Keftime derdê evînê ay dilê min ay dilo<sup>(2)</sup>

Keftime ber derd û janê wek Memê sotî gumanê<sup>(3)</sup>

Ahji destê vê ciwanê ay dilê min ay dilo

Ah ji destê zilf û xala awirê wa çavxexala

Dame ber çekûç û nalan ay dilê min ay dilo

Dame ber derdê fîraqê helfirandim wek buraqê

Sed hewar j' vê îştîyaqê ay dilê min a y dilo

Hey hewar j' va kul û derda mi'hnet û 'îşqa di wer da

Ez kirim bêmal û şeyda ay dilê min ay dilo

Ez kirim wek şîklê dalê mam di kovana wîsalê

'Eşweyîn wê serşepalê ay dilê min ay dilo

'Eşweyîn wê 'alîşanê ez kirim bêmarê Xanê

Xoş dibim ma ez bi canî ay dilê min ay dilo

Ma kul û daxa birînê sotina derdê evînê

Sax dibit carek bi dînê ay dilê min ay dilo

Sax dibin ma ev mehane dax û derd û kul û jane<sup>(4)</sup>

Ru'h û dermanê min bi can e ay dilê min ay dilo

Ru'h me cana Mekkeî bû nazik û 'hor û perî bû

Çav me lew xewn û girî bû ay dilê min ay dilo

Çav me ma l' bejna şîrînê remz û nazên xemrevînê

Mam bi vê dax û birînê ay dilê min ay dilo

Mam di benda dax û derdan xoşî piştî te me berdan

Can û dil her du li ser dan ay dilê min ay dilo

Can dema hatî ji wê ve ateşî dil girt ji rê ve

Serxoş im mame b' dînê ve ay dilê min ay dilo

Serxoş im bî camî mest im ejdeha bî jehrê gestim

Bi girya zilfa ve bestim ay dilê min ay dilo

Ay dilo jaro xerîbo dûredost û bêne'sîbo

Xeste'hal û bê'tebîbo ay dilê min ay dilo

Xeste'hal im pir fena me çav li rê yara xo mame

Ez bo yarê canfîda me ay dilê min ay dilo

Can ji bo wê min fîda kir dil bi 'îşqê muhtela kir

Ru'h ji Exlatî cida kir ay dilê min ay dilo

-----  
1- Dibe ku şûna peyva bêmar, "bîmar" be: jar û bîmar û dilo

Bîmar: nexweş, nesax

şêx Memdu'hî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandine:

2- Keftime cewra evînê ay dilê min ay dilo

3- Di be ku ev rêz bi vî awayî be:

Keftime ber derd û janê wek mûmê sotî gumanê.

4- Sax dibin ma ev ewane dags û derd û kul û jane

Ferhengok

Bêmar: bêjiyan. Mar: jîyan, dijî.

Guman: şik

Awir: nêrîn

Helfirandin: firandin.

Buraq: hespê ku Mihemed Pêxember-s- pê çûye Mî'iracê

Areş: agir, ar

Fena: mirin, fîda

\*\*\*

## 'HUSN Û CEMAL

Me j 'bil 'husn û cemalê me j' me'hbûba qe navê  
Me xerez sin'etê xelaq e ji wê pê ve me navê

Tu be zilfên xo yî ta-ta neku min pê bigrî  
Me ji wa terhê biska me xerez nîne me navê

Me ji wê neqş û nîgarê be Xudê safî me ma dil  
Canê me 'ezîzê bi Xudê bêy te me navê

'Işqa te kirim bêser û bêmalî, hewaî  
Sed car te fîda bin dil û canê xo me navê

Dil maye di benda te wekî bilbilê şeyda  
Bihnek ji nesîmê te bikim zêde me navê

Xunçek ji te nadim bi dused nêrgizê şehla  
Canê me çira yexme dikey nê me xo navê

Enwar tecella ye li dêmê te 'eyan kir  
Îro me jibil wê perîyê 'horî me navê

Bazarê biken 'horî bi te xo bigihurin  
Yek-yek te bi wa nadem û ev bey'e me navê

Terhên wekî bejna te ji bala dihejînim  
Nê terheperês im tayê bêterhe me navê

Sorgul wekî dêmê te ye willahî we bîllah  
Bêhna wê ne ew bêhn e me gul bê te me navê

Her navê wekî navê te bît xoş e me ew nav  
Navê ne wekî navê te nebît canê me navê

Exlatî were xo ji bo yarê bike qurban  
Qurbanî te bim xoştir e ev saxî me navê

Ferhengok:

Sin'etê xellaq: karê Xwedê

Ta-ta: pêç pêç

Neqş û nîgar: ciwanî

Enwarê tecella: nûra Xwedê

\*\*\*

## HEVAL

Hevalek teqî tu nebînî l' dinê  
Gelek çêtir e bo te rûnî b' tinê

Mirovê xirab têkela wî neke  
Tu dê poşîman bî li darê dinê

Nebe hevgirê ew kesê bed'emel  
Emanet tu bikre evê gotinê

We ger ne dibî rûreşê malxirab  
Tu her dem j' 'hesret dibêjî li minê

Eger tu bibînî ji qencên Xudê  
Bi derfet binêre ewê dîtînê<sup>(1)</sup>

Digel wan bibe hevdil û hemnişîn  
Tu dilvanîyê wa be heta mirinê

Ew in xemrevîn bo te weqtê xeman  
Digel wa tu rwînî dê bibiye xenê<sup>(2)</sup>

Tu bikirî xelatek ji destê ewan  
Bi xenîme binêre ewê dayînê

Ev e şîreta min bila bo te bît  
Wiha gotî Memdu'h dema girtinê

Li sala hizar û sêsed û şêst û sê  
Li zîndana Mûsil li çirya binê

Dikir nehse û çilûçar û hizar<sup>(3)</sup>  
Wefat kirbû Nûrî şerîfê dinê<sup>(\*)</sup>

-----  
şêx Memdu'hî di orîjînalê dîwana xwe de ev helbest du caran nivîsandîye. Lê di cara duyem de hin rez bi awayekî din jî nivîsandine:

1- Bi fûrset bibîne ewê dîtîne

2- Tu dê b' hevriya wa bibîte xenê

3- Dîbû nehse û çilûçar û hizar

(\*) Mamê min şêx Nûrîyê Birîfkanî li Mûsilê di payîza sala 1944ê mîladî çû ber dilovaniya Xwedê, rehma Xudê li ser be. Cenazê wî veguheştin bo Birîfkanê û li rex babê xwe Seyîd 'Ebdulcebbar 'Ebdulqehhar hate veşartin. Memdu'h

Ferhengok

Hevgir: dost, hawrê

Bed'emel: xirabkar

Derfet: bîv, firset, hel

Hemnişîn: hawnişîn, hevnişîn

Dilvanî: xoşewîstî

Xenîme: deskeftî, deskewt

\*\*\*

## ŞEVÊN TARÎ

şevên tarî di nav pêlan bi girdabê giriftar im  
Kesê l' dwî min, kesê bêxem çî zanît ez çî bed'hal im

Çî xoşî û 'eyş dibînim ez digel yar û şirînsahan  
Mîrin her dem diket gazî direng e rabe serbar im

Bi dilxoşî çawa rwînim digel yara ez ê pîrxem  
Dizanim paşî çend rojan digel gorî hevaldar im

Nizanim ew kesê 'aqil bi dinyayê çawa xoş bûn  
Li 'halê pêşîyan nêrî û nezanî ez 'ecebkar im

Were saqî me dil nîne tu bigêre kas û camê  
Evinya ewilî bûrî nuhe dil (pir) teng û xemdar im

Dilê kul çû ji destê min hewar e l' min bikin rayê  
Ditirsim sîrrîya mexfî bikim 'zahir 'uzirdar im

Nesîbê min di dinyayê nivîsîn bi t'el û mî'hnet  
Her ro sed car dibê Memdu'h ji vî 'halî şukirdar im

Ferhengok:

Girdab: Gêjawe, gerînek, zivrînek.

Giriftar: Cîrûde, dîl, girtî.

Bed'hal: 'Halxirab

Serbar: li ser çûnê, li ser barkirinê

\*\*\*

## XEM Û DINYA

Eger b' rwîtî bijî yan tu b' zengînî  
Divê her dem b' kul û derda b' bûrînî

Xem û dinya digel yêk bûne hevgur  
Kesê bêxem çawa dê l' vêre bînî

Me hingivîn dî d' gel jehrê hevîr kir  
Eger çak lê binêrî dê derînî

Ne ku tu b' wê şîrîniyê bibiye me' xrûr  
Bizane ew hemî jehr e şîrînî

Gelek xoşî û şahî jê me dîtin  
Dumahya wa hemî l' me kirne şînî<sup>(1)</sup>

Emanet min li te ew bît birader  
Çi ca vê ra nekey dost û evînî

Eger spêdê tu rabî zor î keyfxoş  
Mu'heqeq dê l' te ket nîvro girînî<sup>(2)</sup>

Hizar qesr û pelasan lê tu çêkey<sup>(3)</sup>  
Divê axir li nav gorê reş û tarî tu rwînî<sup>(4)</sup>

Hizar kes her wekî me pê di xoş bûn  
Li ser textan dikir keyf û şehînî<sup>(5)</sup>

Ji nişkê ve mirin ew pêk ve bûrîn  
Tu ixbarê di wan reng e bixwînî<sup>(6)</sup>

Ji bo te min nivîsîn ev nesîhet  
Mixabin şîretê min tu b' dirînî<sup>(7)</sup>

Bes e Exlatî kes guh naditin te  
Çira hinde tu durra veduhînî<sup>(8)</sup>

Le dinyayê 'ecayîb pir me dîtin  
Lewa Memdu'h tu pir derd û birîn î.

-----  
şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêzên helbestê bi awayên din jî nivîsîne:

- 1- Belê axir hemî l' me kirne şînî
- 2- Bizane dê l' te ket nîvro girînî
- 3- Hizar qesr û palasa lê tu çêkey
- 4- Divê axir li nav qebrê reş û tarî tu rwînî
- 5- Li ser textan dikir keyf û şehînî
- 6- Tu ixbarê di wan reng e bixwînî
- 7- Ditirsim şîretê min tu b' dirînî
- 8- Çira hinde tu durra veduhînî

Ferhengok:

Rwît: Rût, feqîr, hejar

Binêrî: Berê xwe bidê, temaşe ke

Pelas: Koşk û qesr

Ji nişke ve: Bi xefle

Durra vedihunî: Gotinên giranbiha dibêjî

\*\*\*

## KARWAN

Min dema nêra dinê min dî heçî hatî diçû  
Her wekî ava biharê hişk dibû bédeng û dû

Her yekî rojên di xo b' t'elî û xem tê da biwar  
Ew binaxahî mirin hindek li pê wan hatne dû

Bêje min ka ew emîr û kanê ew şah û geda  
Kî dizanî ka çi lê hatin bi kîş rêkê ve çû

Her kesek çend rojeka l' vî wargehî daniştibû  
Hadîrî barê xwe bar kir gotî karwanê me çû

Hinde te'eb û derd û mî'hnet wa bi warin le dinê  
Axirî jê çûne der qet yek ji wan pê xoş nebû



Her wekî xewn û xîyalê carînan me têne bîr  
Wekî çavên me vebûn me j' bîr kir û dil kore bû

Jî hemî her gavek e ya ku tu tê da vê demê  
Ya dihêt hêş tu nizanî ya duhî bû xewn û çû

Jiyê serpak î dirêj hemî te beyhûde biwar<sup>(1)</sup>  
Sed mixabin bêîbadet hemî bûrî û j' te çû

Ma gelo hêja ye vê bedxaneê em bikirîn  
Bi 'hûr û baxên behîştê şîr û hingivînê dirûw

Dê bila bê'arî me bes bin dest ji vê pûştê bişûn  
Belkî jê b'çîne derê pak û temîz û mahîrû

Ev hemî bo te me gotin qet te guhdarî nekir<sup>(2)</sup>  
Sed mixabin ku bikem ev şîret ku beyhûde çû<sup>(3)</sup>

Newbeta Se'dî û Xanî bûrî Memdu'h hate pêş  
Hind nemaye dê bîhîsî gotî Exlatî jî çû

-----  
şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêzên helbestê bi awayên din jî nivîsîne:

1- Jiyê serpak î dirêj hemî te bi derda biwar

2- Ev hemî bo we me gotin qet we guhdarî nekir

3- "Hey, ah, dey" mixabin ku bikem ev şîret beyhûde çû.

Ferhengok:

Biwar: Derbas kirin, bûrandin.

Geda: Feqîr, hejar

Hadîr: Yekser, di gavê de

Carînan: Carna, carûbaran

Jî: 'Emir, temen

Beyhûde: Bêşûd, bêfeyde

Bedxane: Mebest li vir dinya ye

\*\*\*

## EVÎNA MEMDU'H

Evro ji xeman bêçare û vane dil im ez  
Agir di hinava wekî gazê disojim ez

Agir di hinava te kirî şibhê tenûrê  
L' ser ta qedemê rengê bihê helpiqijim ez

Jan têne giyanim wekî bilbil bi fixan im  
Perwane ez im sotim û bêdeng dimrim ez

Xûnrêj e ji çavan wekî barana biharê  
şeb ta se'herê dwîr ji xewê her digezim ez

şebgorî digel te ji me ra 'eynî 'heyat e  
Ger bêye li ser min l' mirinê xoş dibezim ez

Çav nêrî li te derdê evînê l' me diyar kir  
Herçendî veşêrim ji serî her dihijim ez

Sê sal e ji derdê te xem û t'elî dibarin  
Ma hêj tu nizanî ji birîna dikelim ez

Memdu'hî ji derda dil û canê xo li ser da  
Ma hêj ne bes e dil şewitî sorepel im ez.

Ferhengok:

Helpeqij: Hilpeqîn, peqîn, teqîn

Fixan: Nalîn, nalenal.

Perwane: Pelatînk, pinpinîk

\*\*\*

## SOLÎN

Serê kuluma te wekî solîneya rengîn û bav  
Te kire dane li bulbul zilifên bûyîne dav

Wekî teyrê ne beled hatime ser dêmê te Nûn  
Me mirîst û digirîn qefdeê biskên begulav

Me nezanî bi Xudê, dane ye yan dêmê te nûr  
'Eynî kafûr e bi meşreb di devî kewser e av

Bêguman avê 'heyat e di lepan min jê vexwar  
Lew ciwan im di dinê pîr û zerî tev bû belav

Were ser be'hsî hîlalan li sema reng çî diden  
Kesk û sorên di biharan xemilî l' bin serî tav

Ser û sîma te ji nûrên wekî maha di felek  
Çar kinarê kuluma zilfa sîyah girtî xunav

Bejnûbala wekî 'er'er bi ser êk da dixişin  
Sosin û simbil û rî'han xemilîn l' bejna zirav

Eniya sor û spî her wekî surayîneyan  
Vedidet neqş û nîgarê me biheşt têtê di çav

Me miraz bû di dinê biçme tewafa 'hecerî  
Her ji ruknê yemenî sucde me bir pêşî silav

Sucdeya bereswedî nadem bi sed 'hecekbera  
Her dema bême tewafê "Leyletul Qedr" im ev gav<sup>(1)</sup>

Serwera min di dinê heq me tu yî ru'h û 'heyat  
Demekê ger te nebînim disojim ez ji hinav

Me li Baxê Îremê yexme kirin sêvê xelat  
Were Exlatî binê solîneya rengîn û bav

-----  
şêx Memdu'h Birîfkanî ev rez bi awayekî din jî nivîsiye:

1- Sa'eta bême silavê "Leyletül- Qedr im ev gav

Ferhengok:

Solîne: Navê gulekê ye

Bav: Vekirî, geş

Ne beled: Ne şareza, xerîb

Hîlal: Li vir mebest jê "birû" ye.

Çarkinar: Çar rex, çar alî

Ayîne: Neynik, 'eynik

\*\*\*

## WILATÊ ME<sup>(\*)</sup>

şax û daxên di wilatê me pir e j' şengebiya  
Çîçek û alal û beybîn qul bi qul ketne çiya

Nêrgizên ser di giran şermendeê xemla te ne  
L' çîmenên nazik û ter simbil diden aweriya

Sorgulên sîmaê rengîn l' terzina girtî xunav  
Daxedar im bo binefşên xurmeî l' ber keviya

Çar kinarê keviya sosin û simbil xemilîn  
Mêrg û baxên di beheştê didine ber çikiya

Heçî coma tu binê bexçeê rizwan e wilat  
Baxê Îrem te hebît dê bideye mizginiya

Mirîya bînî lê danî sê şevan dê jîne ve<sup>(1)</sup>  
Her dema binêrî bihar e kanî nûjdar e giya

Ax ji zêr e l' çiya binêre dur û almas in hemî  
Çendî cewher cumle yekser wê ji nik me çûn ciya

Rez û bax û çîmenan şalîl û balîl dixwînin  
Deng û awazê şîrîn kefte nihâl û geliya

Kan û gencên d' wilatê me pir in mil dane yek  
Sed hizar in tev bijar in makê kîmya ye giya

Serwerê çendî cihan heq bêguman erdê me ye  
B' qurçeka avê ji dola sax diken bêvariya

Heçî vî erdî bibînît paşî jê bene derê  
Şêt dibît hadir di gavê dîn û har kefte riya

Bes bibêje kê m birêje Exlatî nas î ji mêje  
Cih biheşt e çiya û deşt e av 'heyat e l' kaniya

-----  
(\* Ev helbest di sala 1943 ê de di kovara RONAHÎ de bi navê Xemla Kurdistanê hatiye çap  
kirin. Navê şêx Memdu'h jî bi naznavê Xelwetî hatiye nivîsandin.  
şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêz bi vî awayî jî nivîsîye:  
1- Mîrya bînî lê danî sê şevan dê jîne ve

Ferhengok:  
Qul bi qul: Rêz bi rêz  
şermende: şermîzar  
Sinbil: Kulîlkeke kesk e, rast radibe, yan berwar radiweste  
Terzin: Avzih, avzê  
Xurmeyî: Ji rengê xurme  
Çikiya: Ber t'ena  
Cûm: cih, der, dever  
Binê: Binêrî, bibînî  
Ciya: Cîhan  
Qurçek: Qurtek, mistek  
Bêvarî: Êşa giran, nexweşiya tîfloyê

\*\*\*

## DILBERÊ DÎSA

Dilberê dîsa ji nû derd û birînêt me kewand  
Bi serê zilfa sîyah wê xem û te'elî l' me cemand

Me dihî şengeşeha qet ji elîf yara berê  
Li serê rê me bi endaze jidil tev meyizand

Xal û xetên li sîmaê dil û bêperde me dîn  
Wekî mahê reşiya li dêmê be kurdî me vexwand

Du hîlalan li binê rojê li ser dêmî helat  
Rişiya bextê me daê zivirî şev l' me gehand

Me nezanî ka ve sêr e yan tecelaya Xudê  
Qîbleya min di dinê evro li min têk zivirand

'Hûriyên baxê biheştê çav li dîdara te ne  
Bejnûbalayê şîrîn evro du ca l' me xemiland

Me go Nûnê bi kilê surmeî l' çava bireşîn  
Rû veda ve l' me kenî xuncelebê dil herişand

Nêrgizên ser di giran şermendeê çavên te ne<sup>(1)</sup>  
Me ji wan tirs û fixan e ewan dil peritand

Pazde sal e wekî perwaneê bêdeng şewitîn  
Yarperês î n û ditirsîn me ji zilfan digezand

Xûn û zerdav 'edav co ne ji cergê me diçin  
Geh û wersel l' me birîn surperiya xwê lê reşand

şev û rojan wekî bilbil dikeme firyad û hewar  
Ez dinalim ji xemê solîneya perde dirand

Jiyê serpak î dirêj beyhûde me digel te biwar  
Rojekê rû te nada min xem di hestiyê me mehand

'Heq dizanî ji xema 'îşqa te bêmar û dil î  
Çi qiyamet li me rabû bi Xudê dil kuzirand

Me go dilber ji kula bêder e xem jan e di dil  
Were Exlatî binêr bo mirinê ser me zirand

-----  
şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêz bi vî awayî jî nivîsîye:  
1- Nêrgizên ser di giran serşoriya çavên te ne.

Ferhengok:

Kewand: Kulanewe

Cemand: civand, kom kir.

Elîf: Bejn û bala wê mîna herfa "elîf" a 'erebî dirêj e.

Meyizand: Lê nêrî, lê mêze kir.

Endaze: Muhendisyane, bi qiyas, bi hûrgilî

Sêre: Stêr

Tecella: Nûr, ronahî.

Digezand: Gez dikir, digest.

Firyad: Hawar, dad û meded

Mehand: Meyand. Ji lêkera "meyandin" ê.

Mar: Jiyân.

\*\*\*

## DILBER ÇI BI MIN NADET

Dîsa ji kula sotim dilber çî bi min nadet  
şemare dê min xûtî ku zilfa sîyeh badet

Wê zilfê kirim talan êxistime ser palan  
'Emrê me çû çil salan spêde li me hilnadet

Spêde l' me bû êvarî evrazî bû berwarî  
Nêzîk bû şeva tarî 'xeflet bo me ser nadet

Xeflet te nebû carek gunneh te kirin barek  
Navê te yê minbarek şerm e ku 'ekis badet

şerm e ku te wê rojê danine di nav dojê  
Poşman bibî her ho jê poşmanî nefî'i nadet

Poşman bibe her nûke ger çih riya pir şok e  
Tobe bike evroke belko te jê aza det

Belkî te wext bûrî hişk bû l' te gula corî  
Tu çûye li ser gorî her ho bi te dest nadet

Her ho bo te naêtin rêvînga gelek divêtin  
Nê wext e mirin bêtin dara te berî nadet

Dara te birêv hişk e mêvan î serêv nişk e  
Pora te tijî rişk e bûrî lewa şeh nadet

Bûrî li te şehbazî hildara kirin mazî  
Nav hemya tu mayî 'tazî bê'arî te bernadet

Bê'arekê bêşerm î nesaxekê wek term î  
Hêjta tu nuhûy germ î ha wext e mirin dadet

Ha wext e te can bêşît dinya te jî rakêşît  
Hişkarî te hilkêşît hişkar ji xo ta nadet

Hişkarî kete rêla xelk çûne bi xo hêla  
Tu maye li nav pêla girdab e te bernadet

Girdab e li min her dem dijwar e neşêm berdem  
Heta ku ru'hê l' ser dem bêkarî xo la nadet

Bêkarekê nazan î serma bû pêşîmanî  
Hêvî şehê 'Ednanî destan ji me bernadet<sup>(1)</sup>

Destê xo li me heldet guneha ji me berdet<sup>(2)</sup>  
Xufranî bi ser rûdet serxoşî li me ladet<sup>(3)</sup>

Serxoşiya dinyayê sewda pitir e j' tayê  
Memdu'hî diket rayê wî tobe ye ho nadet

Toba me kirinjana dilxaz e li ser zana  
Heyla l' me pêşîmana Exlatî ev e 'adet

-----  
şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêz bi vî awayî jî nivîsîne:

- 1- Hêvî şehê 'Ednanî destê xo li me badet
- 2- Destê xo li me hilkit guneha ji me derkit
- 3- Xufranî b' ser û rû kit, serxoşî li me ladet

Ferhengok:  
Evraz: Kaş, hevrazî  
Berwar: Riya ne kaş û ne nişîv  
Nef'i: Feyde, sûd  
şoke: Stîrî, dirik  
Ber: Berhem.  
Por: Pîrç  
Rîşk: Hêkên spihan  
şehbaz: şabaz  
Term: Cenaze  
Dadet: Venîştin, dadan  
Serma: Sermaye, saman, serwet

\*\*\*

## PÎROZIYA CEJNÊ<sup>(\*)</sup>

Roj bête der al sor û zer rewşen li ser banê te bît  
Her dem bijî b' keyf û xoşî cejna te jî pîroz bibit

Her dem şeva te ron bibit ji dil şahya te xoş bibit  
Çend roj hene her cêjne bît cejna te jî pîroz bibît

Hindî ku ev dinya hebî b' rûyê bilind b' dêmê spî<sup>(1)</sup>  
Her 'hakim û şahê me bî cejna te jî pîroz bibit

Heyva li ser te çarde bit daim bihar l' erdê te bit  
Te çî miraze her we bit cejna te jî pîroz bibit

L' bexçê gula l' nav simbila seyran bikî şahê dila  
B' keyf û sema dûr bî j' xema cêjna te jî pîroz bibit

Hindî ku padişah hebin hemî li bin payê te bin  
Daim di ferwera te bin cêjna te jî pîroz bibit

Dewra me hat hin d'kin xebat evro l' wilat rojê hilat  
Ala veda şewqê l' me da cêjna te jî pîroz bibit

Roj derkevit çak helkevit dujmin b' revît yan jî b' kevit  
Memdu'h divêt ev 'hale bît cejna te jî pîroz bibit

-----  
(\* Ev helbest di Hawar, hej. 50, di 15.10.1942 yê rûpelê 8 ê de hatiye çap kirin. Wê salê 10  
saliya Hawarê bû û diyar e ev helbest cejna Hawar û Mîr Celadet Bedirxan pîroz dîke.

şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêz bi vî awayî jî nivîsîye:

1- hindî ku ev dinya hebî, tu jî digel wê her hebî

Ferhengok:  
Miraz: Mirad  
Pa: Pê  
Ferwar: Ferman  
Dewra min hat: Roja min hat, dora min hat.

Ala: Al, beyraq.  
şewq: Ronahî, tîroşkên ronahiyê  
Helkeft: Vêketin, hilketin, pêketin

\*\*\*

## SÎNOR

Mûsil û Tevrêz û şîraz Hemedan, Toros û Sêwaz  
Be'hrê Qezwîn, Be'hrê Faris Be'hrê Reş, Be'hrê Beyaz

Ev tixwîb in bo me kurda belkî Samsun û Araz  
Xwîn ji canên xo dirêjîn da bijîn em serfiraz<sup>(1)</sup>

Dê bijîn yan dê kujîn dijmin we nakeyn vebijîn  
J' nûke pê ve bo kesê qet çi temenna nakêşîn

Em dixazîn, cengebaz in em bi xo şêr in bijar  
Melek xo tên bo neyara her wekî gurgên di har

Bûs û kozik me girêdan merziyan wê hate xwar<sup>(2)</sup>  
Roja cengê em di naz in da bijîn wek xundikar

Dê bijîn yan dê kujîn dijmin we nakeyn vebijîn  
J' nûke pê ve bo kesê qet çi temanna nakêşîn

Roja cengê hwîn dibînin em piling in yanî şêr  
Fêrisên koh û çiyar in pihlewan in şev bi kêr

L' vî cihî her em xudan in bo kesê nabîte bêr  
Çendî 'alem da bizanin paşî kurda nîne mêr

Dê bijîn yan dê kujîn dijmin we nakeyn vebijîn  
J' nûke pê ve bo kesê qet çi temenna nakêşîn

Bîst û pênc milyon didêrîn em hemî kurd in xurî  
Pihlewan in serbilind in destbijar in bo şerî

Her dema bîva me bêtin dê vekeyn tolên berê<sup>(3)</sup>  
B' sond û peymanên me xwarîn dê bijîn wek kişwerî

Dê bijîn yan dê kujîn dijminj we nakeyn vebijîn  
J' nûke pê ve bo kesê qet çi temenna nakêşîn

Alayê rengîn hilînin vî cihî pê şah bikeyn  
Kurdistanê b' xemlînîn çendî lawan xir bikeyn

Keskûsora bihejînin dijmina pê kor bikeyn  
Nevrozê dîsa vejînin Exlatî dilxoş bikeyn

Dê bijîn yan dê kujîn dijmin we nakeyn vebijîn  
J' nûke pê ve bo kesê qet çi temenna nakêşîn

-----  
şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêz bi vî awayî jî nivîsîne:

- 1- Em dê rêjîn xûn û malan da bijîn em serfiraz
- 2- Bûs û gozek me girêdan melekzan wê hate xar
- 3- We'ide bit bîva me bêtin em vekeyn tolên berê

Ferhengok:  
Serfiraz: Serbilind  
Temenna: Hêvî  
Melek: Melaîke  
Bûs: Kemîn, pûse  
Kozik: Çeper  
Xundkar: Xanedan, padişah  
Fêris: Pihlewan  
Koh: Çiya, şax  
Dêrîn: Hebûn, heyîn  
Bîv: Derfet, firset  
Tol: Heyf  
Kişwer: welat  
şad: Kamûran.  
Vejîn: Ji nû ve jiyar

\*\*\*

## EHLÊ ZEMANÎ(\*)

Min ji ber ehlê zemanî 'eql û hûş min çû ji dest  
Zor te'heyyur mam digel wa b' çî sera min d'gel nebest

Gotinên beyhûde nakem min ji wa î'hram best  
"Pirtuy nîkan negîrd her kî binyadiş bi dest,

..... ehlî ra çûn kurdekan pir kem bi dest"(1)

.....

-----

(\*) Ev helbest di orjînalê dîwana destxetê şêx Memdu'h  
1-Ev her du rêz bi farisî ne.

Ferhengok:

Pertew: Tîşk, tîrêj

Nîkan: Yên baş, yê çak

Negîrd: Negirt, wernegirt

Her kî: Her kî, her kesek

Binyadiş: Zatê bixwe

Bi dest: Xirabe. "Bed-est". Bed: xirab. Est: Heye

\*\*\*

## SE'HER

Îro se'her min dît gelek ew serşîrîna sermelek  
Xurşîd anî\* çavreş belek 'hûriya d' baxê cennetê

Hûrî li ber qîzê reş e lê şems û bedra pir geş e  
'Alem hemî bûn serxweş e j' ber 'etr û şewqa cebhetê

J' ber 'etr û şewqa wê şehê şermîn dibû reng ji mehê  
Êxistme ber ah û lehê tîra kivanê qudretê

Tîr wan ji qewsê eswed e şehzade ye şîrînqed e  
Sotî ne wek min deh sed e bi narê fîraq û hesretê

Hesret niye dilsotin e agir l' hinave keftin e  
Me xoşyek li 'halê min e ji nalî û girîn û 'hirqetê

J' nalî û derd wa li min min ra'het nîne yek demê  
Ah û girîn e ji xemê xûn co-co ji çavêt me tê

Xûn tê ji nav cer'hên di kul min sed hizar daxên li dil  
Lê kuştî me çavên bikil sorgul li ser xal û xetê

Sorgul li ser xalan e wê şekir li nav lêvan e wê  
Rey'han li ser sêvan e wê 'er'er şîbhê qametê

Qametri'hana tabelav sotin li min cerg û hinav  
Îro mi dî girtî xunav zilfên li dora cebhetê(1)

Zilfên li dor bedra mûnîr kilên sîyah lê kir 'ebîr  
Zendên spî lê b' desteşîr wa keftiye nêva muhçetê

Wa keftiye nêva sotiya xoşî name me b' 'hûriya  
Memdu'h dibê Selwa çiya min divêt ji çendî ummete

-----  
(\*) Bibe ku ev peyv "Xurşîdanî", yan "Xoy şeydanî be.  
şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêz bi vî awayî jî nivîsîye:  
1- Îro se'her girtin xunav, zulfên li dora cebhetê.

Ferhengok:  
Xurşîd: Roj, tav  
Bedir: Heyîva çarde rojî  
Cebhet: Dêm, rû.  
şeh: şah  
Ah û leh: Ah û êş  
Cer'h: Birîn, zexim  
Dax  
'Er'er: Dara 'Er'erê  
Xunav: şebnem.  
Mûnîr: Tîroşk dan.  
'Ebîr: Gulav.

\*\*\*

## BAXÊ CENNETÊ(\*)

'Hûriya d' baxê cennetê sotim bi narê firqetê  
Le'lê were dwîr î were nûr û şemala dewletê

Ru'ha me bêy te hadir e b' derdê fîraq û hesretê  
B' derdê fîraq û sotinê dad û meded wey la l' minê

Heta ku roja mirinê nakem ji bîr yek sa'etê  
Nakim ji bîr te yek demê sed car bisojim ji xemê

Sed car qesem b' xalê di hûr kes etlase sîma bi nûr  
Mey da min wê bêdestûdor dil kefte 'halê sekretê

Sed car qesem b' lêvên di sor bi wê badiya rex lê sor  
Cana me hat bê we'id û dor dil kefte be'hra lezzetê

Dil keftiye be'hra qulzenê kasek ji ava zemzemî  
Tilyek te nadim b' 'alemî sed car qesem b' xal û xetê<sup>(1)</sup>

Dil kefte baxê xemriyan reqş û sema û şahiyân  
'Eksa binefşa da çiyân sub'han ji şahê qudretê

Sub'han ji şahê Zulcelal ew serşîrîna serşepal  
Îna wicûdê vê xeyal girya di gaha 'hîkmetê

Girya di gaha da me ew qelbê mirî rakir ji xew  
Le'lê were bigrîn sema û hilgir şemala dewletê

Hilgir şemala sor û zer 'hûrî perî çend durguher  
Ger xo b'guhurin ser bi ser nadem bi hemyan yek xetê



Nadim b' hemiyar yek mûyî bir'uma l' difna carî  
Serdarê mecnûn tu yî bihn û hedara me b' te tê

Bihn û hedara me b' te hat der kir li me Nîl û Firat  
Dîsa divê bikem xebat dil kefte baxê cennetê

Dil kefte be'hra wan xema xoşî me piştî te nema  
Ka suhbet û keyf û sema sed car şukir j' vê hîmmedê

Yek jî l'ial bo me dihat xunçek ji l'elên sermiyan  
Le'la ji durre qelbican j' l'elan wek mî'hna dewletê

Le'ela ji durre sermiyan 'halên di hûr e qelbê can  
Exlatî jê girtî nîşan 'hemd û sena j' vê n'imetê

-----  
(\* Ev helbesta şêx Memdu'h Birîfkanî di orjînalê dîwana wî de tunebû, lê di dawiya dîwana şêx şemseddînê Qutibê Exlatî ku şêx Memdu'hî bi destxeta xwe nivîsandiye, ev helbesta xwe jî di rûpelekî serbixwe de nivîsandiye.

Lê wekî ku xwendevan jî dikarin ji orjînalê bibînin, rêzên vê helbestê tevlihev bûn, me bi awayê li jor rêz kirin.

şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêz bi vî awayî jî nivîsîye:

1- Tilyek te nadim bi 'alemê sed car qesem b' wê cebhetê

Ferhengok:

şemal: Ronahî,

Hadire: Lawaze

Qesem: Sond

Di hûr e: Hûr e

Sîma: Dêm, rû.

Sekret: Sekareta li ber mirinê

Xemriyan: Serxweşan, mestan

Bir'ûm: Xizêma bêvilan

Hedar: Hedan, sebir

Nîşan: Nîşan.

\*\*\*

## PERÎŞAN<sup>(\*)</sup>

Ditirsim ez ji wî 'halî ji xêran ez im yê xalî  
Gunahan ho l' me kir talî Xudê b' re'hma xo me b' şûtin

Xudê b' re'hmê biket d'gel min tu lutfa xo bide ser min<sup>(1)</sup>  
Ji 'hizûra neke der min feqîr im min 'efû t'vêtin

Feqîr im ez gelek jar im şev ûroja bi zêmar im  
Xusaret bû hemû karim neşêm hemya bidim gotin

Hewar l' min ez çî diljan im j' gunaha ez perîşan im<sup>(2)</sup>  
Hizar cara peşîman im lewa Exlatî pir gotin<sup>(3)</sup>

Hilo Memdu'h bike tobê were ser cada û derbê  
Digel nefsê bike 'herbê heta re'hma Xudê bêtin<sup>(4)</sup>

-----  
(\* Bîst û yek (21) salan piştî koça dawî ya şêx Memdu'h Birîfkanî dostekî wî hat mala kurê wî 'Ednan û got: Hîn re'hmetî şêx Memdu'h sax bû, ev kitêb bi êmanetî dabû min. Her çend e pir dereng e jî lê divê ez êmanetê wî vegefnim.

Li ser bergê wê kitêbê ev helbesta şêx Memdu'h bi destxetê şêx Memdu'h bixwe hatibû nivîsandin.

şêx Memdu'h Birîfkanî ev rêz bi awayekî din jî nivîsandine:

1- Xudê b' re'hmê bike d'gel min tu l'ufta xo birêj ser min

2- Hewar e ez çî diljan im j' gunaha ez perîşan im

3- Hizar cara peşîman im lewa hinde me pir gotin

4- Bişû desta jî vê kerbê heta re'hma Xudê bêtin

\*\*\*

## CARNA<sup>(\*)</sup>

Geh neşêm rabim ji 'erdî  
Her wekî qursê giran

Geh bi çola dikevim  
Carna be xorayî sil im

Geh wekî bayê Sîpanê  
Li seran difetilim

.....  
.....

\*\*\*

## DUNYA<sup>(\*)</sup>

Dunya cihê derd û xema  
Saxî çî xoşî tê nema

Mirnê tu lez ke xoş were  
Jê derketin bo me fer e

.....  
.....

\*\*\*

## KEFÎ<sup>(\*)</sup>

Canê b' serê zilfa girêdane kefî  
Kofî xar kir, tu binêr  
Wey le minê durguhara min

.....

\*\*\*

## SÎMA<sup>(\*)</sup>

Sîma delal  
şox û şepal  
Wek şiklê dal  
Min dît li mal  
Her wek xezal

\*\*\*

## XWEZÎ<sup>(\*)</sup>

Xwezî j' xêra Xudê ra  
Ew şêxê dil mi vê ra  
Birbame ez ji xo ra  
Bila jehir bida min

Ew şêxê wekî mîra  
Sultanê şêx û pîra  
.....  
Îmdad bi wî giha min

.....

.....

Xwezî min dîtba carek  
Ji pir dara berê dîsa

-----

(\*) Ev helbest di orîjînalê dîwana şêx Memdu'h Birîfkanî de tunebûn, min ji devê kebanîya mala re' hmetî bîhîstine. Zahid Birîfkanî

\*\*\*

# FERHENGA

## Birîfkani

### DERGEHÊ YEKÊ: (A)

A: Belê, erê  
 Aîne: mirêk, neynik, 'eyne, qûdîka ronahiyê  
 Abûr: ekonomî, iqtî'sad  
 Abone: endam, iştirak  
 Abenûs: dara abanûs  
 Apo: mam  
 Acar: regek ji ,înkafî; çalak, mêrxas  
 Ax: xwelî, xak  
 Axeban: axa ser ban  
 Ax ax: keserki, andin, axîn  
 Axwîr: ciyê hewardina dewaran  
 Axwîrk: mêşikek biçûk e wek pêşiyê ye  
 Axift: peyivî  
 Axiftin: peyivîn  
 Axula: navê du gunda ye di nav e, îreta şeyda da  
 Axînk: keservanî  
 Ade: girav  
 Adodik: hadûd, gulç, amîrek e ji bo derxistina hişînayîyê erdê ji binê 'erdê  
 Adar: meha Adarê  
 Adiyeman: bajarekî Kurdistanê ye  
 Arîya: jan, êş  
 Ar: ard  
 Arvan: aşvan  
 Arû: xiyar, cehik, încare  
 Arezû: daxwaz, viyan  
 Aram: bêdengî, sebr  
 Armanç: amanc, mebest, niyaz  
 Amanc: amanc, hedef  
 Arî,e: dijwar, zehmet  
 Armî,: hevrişim  
 Arînok: nokên şikestî  
 Arînk: regekî giryanê, kelegirîn (zarok arînk çû)  
 Arnîs: cihê rawestiyana gemiyan, bajarek e, li ber qeraxa Behra Wanê  
 Aras: çemek e li Qafqasya, dikev

dawiya bakurê Kurdistanê  
 Arxafk: mirtoxe, arê kevn) yê ligel rûn (xwarineke Kurdî qelandî  
 Aza: efûkirin, serbest  
 Aza ki: serbest berda  
 Azayî: şînî  
 Azahî: şînî  
 Azirya: hêrsbûn, tûrebûn  
 Asik: xezal  
 Asin: hesin  
 Asman: esman  
 Asmîn: yasemîn  
 Asanî: sanehî, hêsanî  
 Asîde: helwa  
 Asê: dijwar, sext  
 Asting: siting, mozezebe,, me,ezebe,  
 As'teng: pirsgrîkê, pêşî li tişteki birîn  
 Aspîndar: spîndar, navê darekê  
 Asêhê: dijwarî, sextî (Asêhî: navê gundekî ye li ser rêya Zaxo)  
 Aş: aşê genimhêranê  
 Aşvan: genimhêr, kesê dide meş d dandin aşê ku karê  
 A,ik: hûrikê qehwê  
 Aş bû: aram bû, perça wî/wê danî  
 Aş bike: dilxweş bike  
 Aş kir: dilxweş kir  
 Aşît: navê eşîreta aşîtiyan  
 Ajîn: dejîn  
 Aşîjin: arşûjin, benikê devê têrê (gînik)  
 Aşkîra: diyarkirî  
 Aşîvk: navê teyrekê rengîn e, hilçînîna giyayê bi zirar, aşêv  
 Axa: a'xa  
 A'xlewîk: tawe, miqîlk  
 Av: av  
 Avahî: xanî  
 Avedan: zengîn, dewlemend  
 Avzeh: avzê  
 Avzûne: cîhê ku av lê dibe gol; hes-

inê kayi, û saetan

Avrîşim: hevrişim, hermûş, herfir  
 Avemast: dew  
 Avlek: peqîjkên (peqpeqokên) de-stan (ji xebatê)  
 Avedank: dewlikê avê  
 Aferîn: peyva pesindanê ye  
 Afret: jin  
 Ava: roj avabûn (mala xwe ava, kir) ava kirin  
 AvAvik: ava goştê kelandî, avdonk, tir,ika kutilka metfînî  
 Avdan: avdankirin  
 Avis: bi ber  
 Afir: cihê alif û giyayê ji bo de-waran, êmdank  
 Ava ye: şên e  
 Avemale: mala ava mala ,ên  
 Averês: hevrişmê nerêsayî  
 Avrazî: berjorî, hevraz  
 Aqar: erd, milk  
 Agir: agir  
 Akre: bajarekî Kurdistanê ye  
 Age: daxuyanî, hafiz  
 Agah: daxuyanî  
 Agahdar: xeberdar  
 Ala: ala, navê eşîretekê ye li Wanê  
 Alînok: zevîya nokan, regekî ,înahî ye  
 Alînk: (pêalînk) pêş avêtin ber  
 Alozi: zehmetî  
 Aloziya: bi zehmet ket  
 Alos: zehmet  
 Alek: rûyek, rexek  
 Alik: rex  
 Alîk: alif  
 Amîr: alav  
 Amedî: bajarekî Kurdîstana ba,ûr e  
 Aman: firax  
 Amûza: kurap, kurmam  
 Ane: yan ne; aneha Xwidê  
 Anko: ango, yan ku, yanî  
 Anî: îna  
 Ah: ax  
 Ahîn: hi,k, hesinî, (Belb, camid)  
 Ahît: cûreyekî êşê ye  
 Awaz: melodî  
 Awar: mihacir  
 Awir: awirê çavan; mihacirî  
 Awirî: nêrîneke bi çavan (keçikê

awirîyek tûj li min veda)  
 Awayî: bi vî rengî  
 Ay: peyva axîne ye  
**BEŞÊ 2 (EÎF û B)**  
 Ebrû: brû  
 Êprax: aprax, pelên pêçayî, belgêd pêçayî  
**(EÎF û T)**  
 Êtîn: kûre (ciyê agirê ku asin tê da tete sorkirin, helandin)  
 Êtûn: germahiya herî bilind, pizotê sor  
 Etrû,: bajêrê eşîreta Mizûriyan li Behdînan  
**(EÎF û C)**  
 Êcarî: tu carî (êkcarî nabe)  
 Êcax: binemaleke pîroz û parastî, ocax, malbat  
 Ecinne: ecnî, cin  
**(EÎF û X)**  
 Êxist: xist  
 Êx: ox, gotina ku ji bo xweşiyê tete bikaranîn.  
 Êxre: aliyên têrikê yên ko tèn dirûtin ji bo kurtkirina têrê (gînikî), xirar, ferd  
 Exla't: Xelat (bajarekî mezin e di-keve ser qeraxa Gola Wanê, ci-hekî girîng bû ji bo Ermeniyana; di wexta Eyyûbî û Emewiyan da. Di-keve naverasta Kurdistanê).  
**(EÎF û R)**  
 Orte: navend, nîv  
 Êre: ev der, vêre, lêre  
 Êro: ev ro, em ro, îroj  
 Erzan: sivik, necis, 'heram; kêmbiha, kêmqîmet  
 Êrî,: hêrî,, hêr,  
 Evrişim: hevrişim  
 Erê: ji bo gazîkirinê tete bikaranîn (erê babo), her wisa ji bo ecêb-mayinê jî tete bikaranîn.  
 Erinî: acizbûn (acizbûna jinê) birîndarkirin  
 Ordî: ordîga  
 Ordû: bajareke e dikeve ser qeraxa jêrî ya Deryaya Re, (Kurd dibên dikeve bakurê rojavayê Kurdistanê)

Erik: ji bo gazindetfîyê tê bikaranîn  
 Erzînk: erzînk, erçen, çene  
 Erbîl: bajareke dikeve rojavayê  
 Mûsilê, Kurd bang diken bi navê  
 Hevlêr. Ji bajêrên kevn e li Kurdi-  
 stan.  
**(ELÎF û Z)**  
 Ezman: ziman, ezman  
 Ez: ez (sorani: min)  
 Ejdeha: ejdîha, ejderha (marê mezin)  
 Izmîk: êşan, êşeke cildî ye.  
**(ELÎF û S)**  
 Îşk: îşkîn (wextê girînê), îskilok, qul-  
 pik  
 Êspîndar: navê darekê ye  
 Îsa: navê bavikek ji eşîreta Goyan e  
 Esas: esil  
 Êspîh: spî, spîh  
 Işgele: minare, minar  
 Iskenderûn: bajareke dikeve ser qe-  
 raxê derya Spî  
 Esp: hesp  
 Istîrk: şîrêz  
 Asîtan: derîzan hew,  
 Êstêr: stêrk  
 Istîng: s'îng, mozezebe,, moz  
 Estîn: stîng, stûn  
 Işke: bêdeng be!, hiş[, : kar,şûl  
 Oş: raweste!, ,oş, wiş (ji bo keran  
 tête biakaranîn)  
 Êş: nexweşî, nesaxî  
 Êşa: êşiya azar kir, jan ketê  
 Îşk: girêya ji bo barşidandinê bi  
 şivdarekê têt şidandin, (î,kekî li barî  
 bide)  
 Îşak:"  
 Işkeft: ,ikeft, mixare, ,ikewt  
 Işqilkî: yariyek e li ser piyekî ra-  
 diwestin  
 Uwşî: îşî, guşî (êşiyê tirî)  
 Êvnî: êvnûte, (laşê) bi qewet  
 Êvnîk: êvnûte, dirist, saxlem  
**(ELÎF û F)**  
 Êvar: êvar, êware  
 Evan: ev, eman  
 Evane: ev, emane  
 Evrazî: berjorî, jêhelf

Êvtî: werimandin  
 Avxark: "  
 Afir: cihê ku dewar tède alif dixwe  
 Evîn: xoştivî, hesjêkirin  
**(ELÎF û L)**  
 Elmana: babikek ji eşîreta Mizîriya  
 Elind: berê sibê, berê sipêdê  
 Êlek: êlek, zexme  
 Ûlamî: ye li dûv yek, li dû he  
 Elsât: 'elalet  
 Elkî, : elqoş, bajarek biçûk e, dikeve  
 binê çiyayê Da, li bakurê Mûsilê,  
 filehên Kildanî lê dijîn ku ji Kur-  
 dên Mizîrî ne.  
 Elşik: qelebalix, hicûm  
 Al: la, rengê sor  
 Elhû: sinetkirin  
**DERGEH DIWÊ (B)**  
 Bes e: tamam e  
 Borek: kek  
 Benîşt: qaçik  
 Berizî: hêri, li ser ti,tekê, hêrî, kir,  
 xenzirî  
 Be'ten: berjorî  
 Birsî: birçî, netêr  
 Binecih: bingeh  
 Berdayî: serbest  
 Bidlîs: bajarekî mezin yê Kurdistanê  
 ye. Cihekî giring bû ji bo xwen  
 din, ilm û zanyariyê.  
 Berkeftî: maqûl, maqûl, berkeftî  
 Bang: bangdan, bang kirin  
 Beyar: erdê nekêlayî, erdê neajotî  
 Bê,ebab: Beytulşebab, bajarekî  
 biçûk e li Kurdistana Bakûr  
 Başqala: bajarekî biçûk e li Kur-  
 distana bak`r.  
 Bisk: zulf  
 Brîsî: birûsk  
 Bîra: bûra, birayê jinê  
 Bêrîvan: pezdo,  
 Berevan: nêvçîker; kesê ku ji bo Ba-  
 sik: basikê dest, darikê cigarê,  
 qelûn  
 Pe'hin: pan  
 Pan: rast  
 Biyanî: bêganî  
 Bîmanî: rûni,tevan  
 Berdayî: pêxistî, hilkirî

Behî: şîn  
 Beha: qîmet  
 Benûk: dara benokê, dara benî  
 Bim: bûm, teyrekî bêwe xer e.  
 Bangîn: hewar bangîn filan e, bang  
 Binişî: bêhnijîn  
 Bingeh: asas  
 Bindan: serbêjîng, danê ku li ser  
 bjîngê dimîne û didin heywanan  
 Bêgav: naçar  
 Binzînk: kulavê binê zîn ê li ser pişta  
 hespê  
 Bi,ûrey: damayî, bi acizî  
 Beredahî: beredayî, destjêberdayî;  
 tolaz, serserî  
 Balete: navê eşîreke Kurd e  
 Bivir: bivir, ji bo birîna daran tê bi-  
 karanîn.  
 Bê: (bê mal) nebûna tiştêkî  
 Babelîçik: tiliya li ber tiliya qilîçê, ti-  
 liya gustîlê.  
 Barî:"  
 Beşê: pez  
 Beq: beq  
 Bext: pena, penah  
 Bextyar: bextewar, mirovê bi tal`e.  
 Bevil: mirovê bêhempa  
 Bo çî: ji bo çî  
 Bo: çima  
 Bêteşe: tiştên bêre û bêhizir ku di  
 civatê da acizî peyda dike  
 Biyaban: sahra  
 Beldîk: çar rojên dawîn di meha  
 kanûna yekê ,erqî (Bi sermaye  
 xwe bi navûdeng e)  
 Bêldoxe: çar rojên pêşî ji kanûna di-  
 duya ya şerqî (bi sermaye xwe bi  
 navûdeng e)  
 Bêmik: dendik  
 Bermayî: jibermayî  
 Bizî: bargiranî  
 Beramber: pê,ber  
 Balte: şiklekî bivirê ye.  
 Bergeryan: muracaa Bisporî: mu-  
 rasil, şarezayî, fahmayî  
 Bêndan: bênhvedan, bêhndan  
 Berze: ve,artî  
 Bizav: hewildan

Boş: pir (çemekî boş), zêde  
 Bêtivî: pêwistî  
 Bîz: ,îşikên ku gore û hwd. pê  
 çêdikin.  
 Birmî: kêf, toza titûnê ku ji bo bêh-  
 jîandinê diki,înin bêvila xwe, bir-  
 motî  
 Binik: toza bin tûtînê.  
 Bîh: bîhok  
 Bîhok: dara bîhokê  
 Birxî: yê ku asinan û daran pê  
 di,îdînin.  
 Bis`tî: yaxe, berstûk, berstik, pistî  
 Bazirgan: tucar  
 Bizirî: pêxwas  
 Bîtik: pirsik  
 Berav: berekî (kevir) ku kêrikan pê  
 xweş, tûj dikin.  
 Birçî: netêr  
 Bend: destekî kaxezan, bendek ji  
 stranan  
 Bendik: bendeke, bendikê ku pê da-  
 ran girêdidin.  
 Birk: kanî  
 Bixir bixrawiye: bore bora wi/wê ye  
 Bamî: bamyê  
 Bade: pîyan, badî ; mey  
 Bapîr: kalik, bavê bapî  
 Belik: gotşê ku ji difnê pez der-  
 dikeve, gava ku nexwe, dikevin,  
 dibirin.  
 Binaxe: esas  
 Binwaşe: binaxe  
 Binzan: toza arvan  
 Berdeqanî: kevkanî  
 Birdeq: li ser yek pê radiwestin û ya-  
 riya pê dikin.  
 Birçêlk: hûrê heywanan  
 Bişkeft: ri,jîya, peşkî  
 Birmîz: mîzok, zarokê ku bi şev bi  
 xwe ve mîz dike.  
 Bedîl: temen,'emir (hey bedîl lê  
 kurt)  
 Başqe kir: cuda kir  
 Bîf: delîve  
 Belg: pelê dara  
 Berdev: li ser zimanê  
 Pitpit: pitepit kirin  
 Betanî: betanê cilan

Balîlk: balûk  
 Bila: qebûl kirin  
 Berçûyî: beravêtî, jiberçûyî  
 Bergîz: şal û ,apik  
 Benav: kulind  
 Berbiyav: hewşa malê (berûbiyav)  
 Bêje: bipeyive  
 Bijart: helbijart, neqand, paqij kir  
 Biraşt: goşt li ser agir bira,t  
 Bakûre: gopal  
 Beybînk: guleka sor e  
 Birî: birû  
 Jan: êş  
 Berdoş: satil  
 Biryar: dijwar, aktiv ; qerar  
 Beraze: karîte, kêran  
 Biraze: ji bilî  
 Brîfkan: gundek e, dikeve Kur-  
 distana başûr nêzî Dihokê ye  
 Bamernê: bajerekî biçûk e nêzî Di-  
 hokê.  
 Barzan: navê gund û eşîreta Barzan  
 e.  
 Baedrê: gundeke dikeve Kurdistan  
 ba,ûr.  
 Bilek: navbera du tiliyên dest.  
 Pîrozî: pîrozbahî, navê eşîretekê ye  
 Pîçek: hinek  
 Piçek: hindek  
 Baze: (qumaşekî bi pembû ye)  
 Bindok: yê ku dadikeve binê rûn  
 Bindik: amîrekê avêtina tiştan e  
 Bersoj: bersojik, bersoşk, qul-  
 pikhatin  
 Bînahî: ronahî (bînahiya çavan),  
 dîtin  
 Bêvêrî: tîfo (êşa tîfoyê)  
 Ben: bendik  
 Birrik: bersoj, qulpikhatin, berşo,kî  
 Bijare: bijartî  
 Bijikî: ji nav hilbûn  
 Baboc: kapok (kapoka solê)  
 Bacan: balîcan, tomat, b'ecan)  
 Bexşî: diyariyek biçûk  
 Binas: swîç, sûç, tawan  
 Bi'hurî: kete 'hizrê  
 Bizdand: tirsand, birrî  
 Bezî: 'xar da

Berkeş: bergeş, sîniya mezin  
 Birof: êşeke pîstê (çerm) mirovan di-  
 gire (êşeke Bêvil: difin, poz, kepû  
 Barov: barana dijwar digel bayê  
 Bişkoj: 'xonca gulê (pişkivîn)  
 Binekok: navend, bingeh  
 Bîtanok: gulek e. Kulîlkên biharê  
 yên sor û zer  
 Pîşî: toza arî ; pişk  
 Behitû: 'heyirî  
 Bîk: şînkatiyeke têkeli penîr dikin  
 Bwîk: bûk  
 Bilê: bêje  
 Bertîl: rişwet  
 Bi tîn: tev, tevahî  
 Bîranê: yariyeke ku zarok pê di-  
 leyizin.  
 Bîrahî: bîranîn, bîrhatin  
 Berahî: dema berê  
**DERGEHÊ SÊYÊ (P)**  
 Pat: patik, çiçekek e, musawî (weke  
 hev), nan, pa'htin  
 Paqij: pak, temîz  
 Pa,: pişt  
 Paşê: duvre, pişt re  
 Pêşî: pêş  
 Pêşî: mêşik  
 Pûşî: kesrewanê serê jinan, pûşiyê  
 serê jinan  
 Pwîş: giyayê hi,k  
 Piştî: pi,tre, dûvre  
 Peşî: şemîtî, te'hisî  
 Pelixî: felişî, peli,î  
 Poşman: pe,îman  
 Perîşan: şerpeze, destteng  
 Pac: nîşaneke mezinatiyê, (wîsam)  
 Pwîç: pûç, bêmane [gûza pûç)  
 Parçe: kerek, kerî  
 Pelîşqe: kevin, peritî  
 Paxil: paşil  
 Pelex: pêçêbûyî, jiheqderketî  
 Pûr: avdestxane, wc, tuwalet, çolik  
 Pir: gelek, zaf, zêde, zor  
 Pend: hîle, dek, fen û fût  
 Pişt: orispî  
 Perçem: porê pêşiya serî, tûncik,  
 tembörî, kakul

Pal: paldan, palgeh  
 Per: ke'xez, ka'xed, perr  
 Pare: pere, pûl  
 Pişik: pişûk, pşile, psik  
 Parzîng: çentika piştê ya ku ji hirfîyê  
 çêdikin  
 Pismam: kurap, amûza  
 Pitat: kartol  
 Pê'xember: pêxember, peyambir  
 Penc: pencirîk  
 Pênc: hejmara pênc  
 Pêncî: hejmara pêncî  
 Pîr: kal, pîremêr  
 Pakî: qencî  
 Pak: paqij  
 Pag: ciyê ku heywan tê da tene par-  
 astin  
 Paşa: serokleşkerê bilind  
 Perûk: parşe  
 Perik: ka'xedên cigarê  
 Payiz: palava payizê (demsalek e)  
 Pêşkê,: diyarî  
 Parzîn: parzûn, sefînk, safok  
 Par: sala çoyî, sala borî  
 Parî: pariyek  
 Parxêl: darên lêkdayî ji bo ki, andina  
 dar û giyayê.  
 Pêrpîne: giyayekî hulî yê ku dikin  
 nav mastî û avika  
 Perda'x: perdax, piyaleya avê  
 Poxîn: şikleki xwarinê ye (şekir ligel  
 ar dixwarin).  
 Plox: xwarinek e, sist, gehîştî, taze  
 Piş: mêlaka sor, pişik  
 Berr: berrik  
 Pêl: (pêlên avê)  
 Pelatînk: pelpelatînk  
 Perwane: pîrpirok, pinpinîk  
 Pel: (pelê agir)  
 Pez: mî û bizin  
 Pelepel: gav bi gav ji astengîyekê xi-  
 las bûn  
 Pelav: birincê kelandî  
 Perginde: parçekirî, belavbûyî  
 Pêxwas: bêpêlav  
 Pidî: pidiyê diranan  
 Pencerk: pencere, pace  
 Paşil: sist, şil, paxil  
 Parêz: parêzkirin

Piling: piling  
 Pirêmez: tifika agir a ku bi pifikê di-  
 hate geş kirin ; tendûr  
 Pesar: çol û pesar, dever  
 Pîvaz: piyaz  
 Perwaz: firrîn; kenar, kevî  
 Pelas: qesir  
 Perîşk: perî,kên befrê, kulîlkên berfê  
 Pisyar: pirs  
 Poz: difin, bêvil  
 Pêxamî: ji bo  
 Pêxasme: ji bo (ji bo ti,tên taybetî)  
 Perozînk: teşqele  
 Peşkîn: mecbûrbûna bi cîhanîna ka-  
 rekî  
 Parçe: perçe, beş, par  
 Pelayek: parçeyek ji erdê  
 Pela: taviyekî baranê  
 Pale: karker  
 Pa,il: paxil, giranî (pîsikolojîk)  
 Pelijî: bizav û xebat kir  
 Pertal: hûr û mûr (hwîr û mwîr), xerr  
 û perr  
 Pîz: şînkati  
 Pis: nepak  
 Pê girt: endaz kir, ji ber ker kir, lê  
 girt  
 Pa'tik: pat, perestû, pastû (paştû)  
 Perî: (kesê pîr zêde seks divê)  
 Pwîfî: bêqîmet, bêbiha  
 Peqîşk: qeşmûşik, qaçil  
 Peqî: teqî  
 Preq: dengê tivingê, dengê teqînê  
 Perrîfî: hevberdayî, ji êk perçe bû  
 Pifdank: zeqzeqe, balon  
 Pizdan: pizdan  
 Pandan: pênuşa bi 'hubir  
 Piçpiç: hindik hindik  
 Piçpiçok: tiştên piçûk, tiştên hûrik  
 Pêçî: tilî, pêçiyê piyan  
 Pa'ht: pêja (nan pa'ht), pa't  
 Pêje: (bipêje)  
 Pir: pir, pirik  
 Pirt: pirtikek, let  
 Porpor: lome kirin, pûre pûr, pûke  
 pûk, pite pit  
 Peya: mêr, mêrxas, peyade  
 Peyam: mesaj, berivname  
 Pergar: aleteke geometrîyê ku xetên

gilover dikê,e  
Pêti: bêhis  
Peyisk: payisk, pêplûk, nêrdewan  
Pêstirk: nêrdewan  
Pêzpzok: giyayek  
Pîvok: şînkafîyek ku tê xwarin û serê wê wek pîvazek biçûk e; çiçekek  
Parîv: Parêv  
Pirtû: pirt û mirt  
Pirtîk: pirtîk û mirtîk  
Pelk: navê darekê ye li Kurdistanê  
Piyar: tas, zerik, tirarik  
Pelçem: belgên daran  
Pîrek: jin  
Peçrîme: perçîm, pê ve zeliqîn  
Pîlan: plan, (mu'amere)  
Peyivî: axift, qise kir, şorê kir, xerberda, galgal kir  
Pîvan: qiyaskirin  
Pis: kur (pismam, pisxalet, pisaxa)  
Pasevan: paseport  
Peyaban: çol, çolistan  
Pêt: pêtên agir  
Pêtek: pêteke agir, (ew xarîfeya ku şivan ji ber heqê xwe ve) werdigirin, bi devoka xelkê zozanan)  
Perast: 'ebde, carye, qerwa,  
Perî,k : gijlokêd befrê, kulîyên berfê  
Por: teyrek e ji kewê mezintir e, li dorê çeman dijî.  
Poside: damayî, bêkêf, ponijdayî  
Pêjkîr: pêşgîr, pêjgîr, xewlî, qedîfk  
Palaf: demsal  
Pêr: roja berî duhî  
Pîng : giyayek e ku tê xwarin, pûng, hinek wê di kutildewê de bikar tînin  
Pembî: pembû, pembo  
Port: pirç, por, qij  
Peyale: peyale, îstikane  
Pîjan: 'te'an  
Piskewêt: nanik, piskiwît, nanekî naskirî ye  
pirteqal: pûrteqal  
Pilpilik: mê,eke ku ji pêşîyê biçûktir e (pilpilk pê wer bûn)  
Pesin: pesin  
Piv: pif  
Pivdank: neffax, zeqzeqe, pifdank  
Petîlk: fitîl

Perwane: pelpelating, pelating  
Pelîtak: pirpirok, perwane  
Pişî: pişya savarê, toza savarê  
Paytext: serbajar, bajarê navendî yê welatekî  
Pirsik: pizrik, pizirk  
Peng: benda ku rezvan pêşîya avê digrin da ku av kom bibe ji bo avdanê  
Pengiya: pingav girt, pingava avê, avê pingar da  
Pêro: pêro û terazî (navê sitêrên me,hûr in)  
Peyk: qasid, resûl, peyambir  
Peyak: kesê ku ji axa xwe bi dûr dikeve. barkirî, koçkirî  
Padî,ah: melik, sultan, paşa  
Peyman: peyman  
Peyda kir: bi dest xist  
Pirrçik: pirçikê kelandinê, 'xeleyan 100c  
Penîr: penîr  
Parîk: hûrikê nan  
Pepîk: pepûk (reben û pepûk)  
Pirêze: zeviya piştî zadrakirinê  
Persîv: sermagirtin, helamet (influense)  
parseng: parsek  
pind: heywan  
Pehlewan: pêlewan, be'tl  
Perî: perda ser çavên bûkê, (surperî)  
Perde: perde  
Pêt: pêtên agir  
Pwît: jar, bêqewet ; pût, êmê (xwarina) pez û dewaran ji çiloyê daran  
Pelît: necis  
pêvarî/pêvêrî: êşa tîfo  
Pûlek: fils  
Pe,k: çipikên avê  
Peşî: filitî  
Pirrkinde: belavbûn, perakende  
Perîşan: dilbixem, ji halketî  
Pîçolk: qumatik (zarokê nûçêbûyî ku tê pêçandin), pêçok, pêçek  
**DERGEHÊ ÇARÊ (D)**  
**(D û L)**  
Dil: dil, di'l  
Dilovan: dilovan

Delî: qereç  
Delal: spehî, xweşik, ciwan  
Dîlpank: payizk, nêrdewan, pêplûk  
Dîlber: ya ku dil dibe  
DDûlik: dewlik, surehîya avê  
Delîve: rêdîtin  
**(D û M)**  
Dem: zeman, wext  
Diman: dûman, dixan, dîkel, dûkel  
Dimahî: dûmahî, talî, duwayî  
**(D û N)**  
Den: denê ku av tê da sar dibe û paqij dibe, kûpê avê  
Dinke: manderûn  
Deng: deng (deng û dor), (deng û bas)  
Dindik: dindikê genim, liba ceh û birincê  
Dîng: dûvê pez, dîngê pez  
**(D û H)**  
Deh: hejmara dehan, ji bo hespan jî tete bikaranîn  
Dehbe: dehbe, heywanekî wah,î û xerab e  
Dehman û daman: deling, devdeling  
Dihok: bajarekî Kurdistanê ye ku 73 km ji bakurê Mûsilê dûr e  
Duhî: do, diwênê  
Dêha: bigire, wergire (dê hadê!)  
Dihol: def, dehol  
**(D û W)**  
Dewran: çerxa zeman  
Dewar: ajal (ji bo heywanên mezin)  
Dew: avemast  
Dewîn: xarinek e ji genimî tete durist kirin  
Dîwan: dîwanxane  
Dêwane: mirîd, dîn, şet  
Dêw: şeytan, efrît, ecnî  
Dewêt: dixwaze, ewêt  
**(D û B)**  
Diyarbekir: bajarekî me,hûr e li Kurdistanê  
Diyar bû: eşkere bû aşkera bû  
Dî: dayik dê  
Diyarî: xelat  
**(D û x)**  
De'xel: amîr, hûr û mûr  
Da'x: key, sotin, şewitandin  
**(D û F)**

Dev: dev, dem  
Def: def, erbane  
Defzen: pîstê (cildê) defê, postê defê  
Difin: bêvil, poz, lût  
Deve: hêştir  
Dîv: dûvê pez, kûrî  
**(D û Q)**  
Doq: nûnerê siyasî û dînî  
Diqor: duqat dualî, (dîkilê duqor/du esil)  
DDiqdank: aletê deqandinê  
**(D û K)**  
Dikak: zexîre û qût û alif û êm  
Dîkil: keleşêr  
Dêkwane: dermanek e çîçik (çûk) û teyrar pê digirin  
Dekenek: micidî, ciddî ('henek dibin dekenek)  
**DERGEHÊ PÊNCÊ (T)**  
**(T û A)**  
Ta: taya germ û sar  
Tarî: tarîk (ne ronahî)  
Tamîzk: pizrik, pizrik, pirsik (pirzikên piştî tayê li dora dev tînin)  
Talan: talankirin  
Taze ye: xweşik e  
Tasb: destgerandin, destpalîn, li ser xeberdana bê zanîn  
Tana: hewar li tana min werin!  
Tazî: bêcil, rût,t aziy  
Tax: rex, mil, alî, kêlek ,eqam  
Tal: tama tal  
T'el:t' elî'  
Taf: problem, îdare, bela  
Tah: ji bo heyfê tê bikaranîn (tah û mixabin!)  
Tafil: paqijkirin ji pîsatiyê  
Tankî: 'embara avê  
Tirar: tirark  
Tû: tu, etu  
Te: te, tu (sorani)  
Taq: dîwar  
Twî: tû  
Tê: wa ye tê, (tîrojê) û (tê brî, cenb)  
Tîvil: tîvilk qaçil  
**(T û B)**  
Tûbig: destek (tûbekî kaxedêd zer)  
Tîp: pît, be,ek leşkeran  
Tebik: tepikê herîyê, kelpîç

Tebaî: yekbûn, teveyî, tebayî  
 Top: topeke quma,  
 Têbahî: fireh eş rengê e ji navan  
 wexta kêmbûna heyvê  
 Teber: amîrek e ji bo şerî bikartînin,  
 (tebel) girovir e zarok pê di-  
 leyizin.  
 Tibil: tibilk, tilî, til  
 Tibar: demsal  
 Tibir: aktîv, çalak  
 Te'pisî:  
**(T û T)**  
 Tûtik: rengêkî nanî ye  
 Tûtî ke: rûne!, rîne, danî,e!  
 Tîtelo: girovir, girover  
 Tîtilk: zîlik  
 Tîtin: tûtin, titûn  
 Tet: kombûna yekî digel yek din ji  
 bo seksê (hey tet.....!)  
 Tet: kombûna yekî  
 Tûtî: rûne!, rîne ,  
 Tîtek: teyrek e  
 Twîtik: xiyar û tirûzîyên (bejikên)  
 biçûk  
 Tîtrî: rûni,tina se  
 Tûtik: zeratiya tiroziya  
 Te'htî: berikek stûr e (stûr) bi destî  
 tête çolang kirin  
**(T û X)**  
 Tûxîb: tixûb, sinûr  
 Tox: alaya leşkerî  
 Texe: demek ji deman, komek ji ko-  
 man  
 Tuxm: toxim, tuxm  
 Text: (textê razanê) text  
**(T û R)**  
 Tir: ji bo zêdekirinê tête bikaranîn  
 Ter: ter ,şil  
 Tirpan: tirpana zadçinînê (ge-  
 nimbirînê), şaloka genimî, das  
 Têr: têr  
 Tîr: tîrkovan  
 Têrr: têrr (xurca mezin)  
 Tîr: tûr, gînik  
 Tîr e: ne ron e, tîr e  
 Torr: tora masîgirtinê  
 Turr: şifik, şiv, darên xwar  
 Tîrr: tîrr (bayê ku derdikeve)  
 Terezin: çîmen

Tîrxan: qelew  
 Tore: tore, urf û adet, wîşe  
 Tîrok: darê nanê tenik, tîrik  
 Tîrşî: tîrşatî  
 Tîraşî: tîraşkirin, tîraşîn  
 Tîrî: tîrî, tirê  
 Treqî: şiklekî xoxê ye û tîvil (qaçil)  
 hilû ye  
 Tuwîrî: heywanek ji malbata  
 rûvîyan, çeçel  
 Tirik: darê tenik  
 Tirar: tas  
 Tîrozî: tirozî  
 Teriqî: bereder bû, revî  
 Tîrikî: zayina seyan  
 Tor: sancî (janên pê, biçîkbûnê)  
 Tira,: tîraşa daran  
 Tîrsî: ziwa, zuha, nanê tîrsî  
 TTurturî: kesê ku zîmanê, wî wê di-  
 tirtire  
 Tirazî: terrazî, terezî, (be,ek ji stêra  
 ye)  
 Terq: tûje  
 Turyan: selika nanê tenik  
 Tîre: benda reza  
 Tûr: tûr (tûrê mû)  
 Tirane: tinazkirin, henekkirin  
 Tursikî: reşe, batîrsok, helamet (ji bo  
 tîrsandina heywanan li nav  
 bîstanan datînin)  
**(T û Z)**  
 Tîjik: erdekî çal e li naverastê, ku  
 herdu alîyên wî berpala in ; newal  
 Tîj: tîjatî, tûjatî  
 Têjik: têjikê heywanan  
 Têjik: têjikê  
 Tîjî: dagirtî  
 Toz: toz, 'ecac  
 Twîj:  
 Tîzbî: tîzbe'h  
**(T û S)**  
 Tesk: teng  
 Twîs: bereke zaro yaruyan pê diken,  
 şînkatiyek bi stîrî ye  
**(T û Ş)**  
 Tîj: tîj  
 Tîj: tama tîj  
 Teşî: teşî (teşîrê)  
 Toş: êşek e, 'eyb

Teşk: pê, ling  
 Tîşt: tîşte; hamîle (jina bi tîşt)  
 Teşt: teşt, deşon  
 Têst: taştê, nanê spêdê  
 Teşîk: amîreke ji bo teşîristinê  
**(T û F)**  
 T'el: tal  
 T'elîşk: ,înkatiyek tal e kivrîşk dix-  
 win  
 T'alik: tîriyê re, e talî tê da heye  
**(T û X)**  
 Ti'xar: ji bo kêşanê tê bikaranîn (gi-  
 ranîya ti'xarê bîst ti xar e.)  
 Ti'xare: denek e mewîjan dixine nav  
 ji bo çêkirina do,avê (xoşavê)  
**(T û V)**  
 Tvî: pêwîst  
 Tif: tif  
 Tiveng: tiving  
 TivîrTefîn: tevin  
 Tevşik: qeraşa daran  
**(T û Q)**  
 Teqîya: teqîn (tîveng teqîya)  
 Teqalk: parçek girover  
 Teqîn: herî, teqan, qur  
 Tivîrk: teyrek e  
**DERGEHÊ ŞEŞÊ ('T)**  
 'Tezî: sar  
 'Tulk: ,înkatiyeke bi kelandinê tê  
 xwarin, tolik  
 'Teng: teng  
 'Teneke: teneke  
 'Tajî: seyê ku ji bo nêçîrê tê bi-  
 karanîn  
 'Temrî: ronahî temirî  
 'Tenî: reşatiya ji dûkêla 'hişk  
 'Tenc: tenc  
 'Tenik: tenik  
 'Tenîşt: tenîşt, kêlek  
 'Teyisî: şewq da  
 'Tifne: kevirê ku dikevin  
 'Tîrz: nemaqûl  
 'Taristan: tarîtî  
 'Terrik: kîr (organê cînsî yê mêran),  
 darê ter  
 'Tal: t'el  
 'Tîlîz: bû av (terr û tîlîz bû!)  
 'Til: zik

'Tam: t'ema (t'ema xawarinê)  
 'Term: kelax, kelex, laşê mirî  
 'Tomik: xwarina davjane ber mirîşka  
 'Test: teşt  
 'Têr: hewaye ku bi deng deng der-  
 dikeve  
 'Tarî: ne ronahî  
 'Tamar: şiklekî xewê (temareke  
 xewê girtiye ser çavê min)  
 'Tîfing: mewqî'e  
 'Temirî: hate temirandin  
 'Tawîz: teyrekî meşhûr e  
 'Tîrs: saw  
 'Tevîr: tevîrk  
 'Tivîr: tivîrk  
 'Teng: ez destteng im  
 'Tav: ronaya tavê  
 'Tavek: parçek ji baranê, tavîya bar-  
 anê  
 'Terk: serma; gijlok; kulî  
 'Tov: tov, toxim  
 'Tevîk: ,înkatiyek girovir e rengê wî  
 zer e  
 'Tazî: bêcil  
**DERGEHÊ HEFTÊ (R)**  
**(R û A)**  
 Rê: rêk  
 Rûy: serûçav, rû  
 Rûy: çû  
**(R û B)**  
 Reben: belengaz ; rahîbe  
 Ripin: şînkatiyek e, rehên giyayê yên  
 belavbûyî  
 Rabin: rabin, hestin  
 Rabîn: hilon  
**(R û T)**  
 Rît: rût, bêpere  
 Rêt: rijand  
 Rît: gû kir, rît, rî  
**(R û C)**  
 Rêçal: penîr û bîze  
**(R û X)**  
 Rex: alî. teref  
 Rûx: rex, berekî setrencê (şetrenc)  
 Rîx: rêx, pîsiya heywanan  
 Rûx: kevirê e  
 Rext: Rextê fişekan (guleyan)  
 Raxî: Adî, (raxî û maxîb)  
**(R û D)**

Ridîn: rî, riş, rîh  
**DERGEHÊ HESTÊ (Ç)**  
**(Ç û M)**  
Çem: erdê avî  
Çîmen û çom: baxçe  
Çim: dê çim  
Çom: ez çom  
Cemyan: kombûn  
Çemyan: xwar bûn  
Çima: bo çi, bo  
Çimaye: dema kombûnê, lêkdan  
Cemisî: nerm bû  
Çimaq: çileqek ji qutanê  
Cemik û cem: ferd, tûr, gînik  
Cembaz: cambaz  
Çimbil: destik, çembil  
**(Ç û N)**  
Çûn: ew çûn  
Çen: erçen, çene, argûşk  
Cinîk: bîstanê darêd şînbûyî  
Çinîk: hurikê nanî  
Çinar: navê darekê ye, navê bajarekî ye li Kurdistan  
Çînk: navend  
Çînganê: yariyek e zarok navendekê ji xwe re çêdikin, hinek xwe vedî,êrin û yên din li wan digerin.  
Çinî: fêkî çinî; hûrikê nanî  
Canûwer: cenawir, efrî  
Cine: ecinî, cin  
Çine: ne tu tişt  
Çinçilik: bazineke ku dixine piyên zarokan  
Cûnî: conî (coniyê dankutanê)  
Çonî: tu çawan î, çawa yî  
Çilonî: ji bo weznêkêşanê tê bikaranîn  
Çand: filan tişt çand  
Ceng : şer  
Cengene: qereçî  
Çeng: perr, naqoz, pask  
**(C û H)**  
Cih: cîCihan: dunya  
Cihal: cewal  
Çekî: çekdar  
Çi heye: çî heye  
Cehwer: naverok  
Cuhî: cihê; yahûdî, cihû

Cihbicih: cîh bi cîh  
Ceh: ceh  
**(C û O)**  
Cewî: şîrêz, stirk  
Çewa: çilo, çon  
Çewdik: kîsikê avê  
Cû: amîreke 'sofî pê dibirin  
Cewher: xasîyet, xusûsiyet ; zîrekî, ,arezayî  
Çi ye: te çi divê  
Çiya: şax  
**DERGEYÊ NEHÊ ('H)**  
'Hilîk: alûçe  
'Hilî: şayik, 'hilû  
'Henek: tirane, galte, yarî, tinaz ,  
'Hisîk: xirnîfk  
**DERGEHÊ DEHÊ (X)**  
Xanî: mal  
Xanim: xatûn, xatûn  
Xazûk: gerok, xazxazûk  
Xanik: xanikê ku hevîrî li ser pan di-kin  
Xan: cihê bêhnvedan û nivistina rê-wiyan, hotel  
Xar: xwar, ne rast  
Xazir: çemek e diçe ser Dicle  
Xabîr: Xabûr  
Xamûr: çiyayeke li Sindî li Kurdistana Basûr  
Xazgîn: xwazgînî  
Xarîfk: xirnîfk  
Xandin: xwendin  
Xawen: paqij, xawên  
Xarin: xwardin, xwarin  
Xapand: xapand  
Xav: xav, nepahtî, nekelandî  
Xanik: textikê nanrastkirinê  
Xarîfk: keis  
Xal: nîşan  
Xalet: xuşka dê  
Xalxalk: xalxalok  
Xanedan: dewlemend, zengîn  
Xifitan: mişterî  
Xatûn: xatûn  
**(X û B)**  
Xepare:  
Xeber: nûçe  
Xobxo: bi serê xwe  
Xet: nî,an ; xîç, xetên erdê ; qetek

Xîç: xêzik, xîçik  
**(X û X)**  
Xox: xox, şeftalû  
**(X û D)**  
Xudan: xwedan, xwedî,  
Xwedê: Allah, Yezdan, xwuda,  
Xwuwa  
**(X û R)**  
Xirar: telîsê mezin, çewalê mezin yê zadî (dexlî)  
Xurt: qewî, bihêz, bibirî  
Xurtî: bi qewet, bi zorê  
Xerz: bizrê neslê, cînêd mêr û jin  
Xirek: mals, laşka  
Xirr: girover, devjeng (mucadeleya devikî)  
Xorûkman :Girîya hundurê mirovî  
Horkiman : Gava ku kesek ji ser riya rsat derkevît  
Xwîrk: bizûzê hiriyê (kurmeke ku di nav malê de hirî û ta dixwe); navê ê,ekê ye jî  
Xerpi, and: naprû, ik lê da, pence lê dan, xirmû, k û termûşk  
Xirxire: terpase, gir  
Xurdewat: hûr û mûrên malê  
Xirî: safî; bi maneya tawanbarkirinê jî tê bi kar anîn  
Xurî: hirî  
Xirîbik: Odeya navîn  
Xirîk : rengê giryanê ye  
xerîk : mijûl  
Xirpek: erdê terklêdayî  
Xirşe: bi ber, bi mêwe  
Xorayî: herwe, bela,  
Xurme: xurme  
Xuriya: xuriya, dixwure, exurê  
Xuristî: saxlem, ragirtî, li ser xwe, xwegirtî  
Xirîya: ji rê derket  
Xiriyayî: jirêderketin  
Xirep, an: xolêkdan  
Xûrîk: ciderî, nexweşîneke zarokan e  
**(X û Z)**  
Xuzî: xwezîka, xweziya, xweziga, tif  
Xêzan: Îflas, bi soranî jin e  
Xizim: xizim û mirov  
Xizmet: xilmet  
Xizêm: qelefin, qerefil, xizêm

Xîz: sîlekan, remil  
xezîr: xezûr  
Xizîne: defîne, gencîne  
Xezam: payiz  
Xuzeyran: navê mehekê ye di navbera mayis û temûzê  
Xirr: hemî, tev, giş, hemû  
**(X û S)**  
Xesandin: ji mêranî xistin  
Xesî: xesû  
Xes: xes, xas, marol  
**(X û Ş)**  
Xuşînk: xwe, ik, delal, spehî, cuwan, bedew, rind  
xuşîmank: zarokên zîrek  
Xwîşk: xweh, xwişk, xwang  
Xoş: xweş, bi tam  
Xişîm: xeşîm, bêtecrûbe  
Xişand: xuşîkand, xirand, kişand, kêşa  
Xoşav: dûşav  
Xişîlî: Xwelîşîrik, giyaşîrik, şînkahiyeke bi şîr e ku Kurd jê re dibêjin şîrê marî  
**(X û F)**  
Xift: ”  
Xiftan: xiftan (jin û mêr tev xiftan di ser kiras de li xwe dikin), xeftanê koçeran  
Xefik: faq, fex  
**(X û L)**  
Xêlî: xêliya bûkê, temeziya ser serê bûkê  
Xilîfan: navê gundekî ye li dora hewlêrê  
Xelat: perû, diyar, î hediye  
Xilya: xeliya, firikî, ji cî derket, ji cihê xwe çû  
Xilxile: vale, xalî  
Xilûle: kûr  
Xilinkî: xelya, jicîhderketina hestî  
Xolî: xwelî, xweliya daran  
Xelîtik: xelît (parçeyên tifengê yên ku li nava wê tê şidandin) wekî û fî,ek berikan  
Xilt: derd, (ê, û belayek e li laşê mirovan dikeve)  
Xalxalk: faterêşk, sipî